de jî dîsa bi arezûyî û obsiyonel e.<sup>11</sup> Li hin herêman her çend dîsa obsiyonel be jî bi awayekî xurt tê bikaranîn. Di du metnên (4902 bêje) devoka Mêrdînê de ji 79 cihêن ku divê ev bingihanekbihata bikaranîn 19 heb jê bi awayekî obsiyonel nehatine bikaranîn. Dîsa di van metnan de ji 79 bikaranînan 33 heb risteyên peywendiyê ne û navdêrekî diwesfinin:<sup>12</sup>

**Tablo.1**

Di çar çirokan de hejmara giştî ya “g/gi/ go/ku...”	“gi/go/ku...”yên ku nehatine bikaranîn	Risteyên peywendiyê	Risyeyên peywendiyê ku demê nîşan didin
79	19	33	17

Di kurmancî de wekî rêzik risteyên peywendiyê her dem piştî sereya modîfiyekirî tênu tu carî berî sereyan nayêñ. Eger em ji metnên sehayî mînakân bidin:

- (4) a. “... *ew masiyê gi ew dibê ...*”<sup>13</sup>
- b. “... *cê gi yendo l”serê Melê d”lê xistiysi ...*”<sup>14</sup>
- c. “*Hevalê wî go pevre diçûne hêzinga ...*”<sup>15</sup>
- d. “... *zilamê ku werê li vî sûretê meyzênenê û keserek bidê...*”<sup>16</sup>

Çawa ku ji mînakân jor xuya dibe, riste bixwe wekî modîfîkerên navdêran hatine bikaranîn. Bingihanek dema neyêñ bikaranîn jî tiştek naguhere û dîsa karê modîfiyekirinê dîkin:

- 11 Omer Ehmed, Baîz. “Girê Di Dayalekta Serî Ya Zimanê Kurdî Da, Govera Badînî”, Kovara Za - koya Duhok, Perbenda 11, Jimare 1, 77-92, 2008. r. 82.
- 12 Du metnên sehayî ku çar çirok di wan de hene ev in. 1. Koşar, Fikret. *Bikaranîna Rengdêran di Çiroken Devoka Qoserê (Mêrdînê) de*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstituya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2014. 2. Demirkaya, İslameddin, *Di Nava Eşîra Morikan De Rêjeya Zayenda Bêjeyan* Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstituya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2014.
- 13 Akbaş, Mehmet Şerif. *Di Devoka Qoserê De Rêjeya Bikaranîna Dengan Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstituya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî*, Mêrdîn, 2013. r. 11.
- 14 Baş, Abdulhekim. *Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Devoka Qoserê De Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstituya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî*, Mêrdîn, 2013. r. 7.
- 15 Bulgan, Bilal. *Bikaranîna Hevalnavan (Rengdêran)*, *Di Devoka Herêma Kercewsê De Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstituya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî*, Mêrdîn, 2013. r. 19.
- 16 Derin, İpek. *Frekansa Tipê Kurdî Devoka Nisêbinê da (Mêrdîn)*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstituya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn 2014. r. 7.

- (5) **a.** "... *Hesîbê carê nanê wî divi* ..."<sup>17</sup> (Hesîbê ku carê nanê wî dibe ...)  
**b.** "*Tiştê mi gotiyi* ..."<sup>18</sup> (Tiştê ku min gotiye ...)  
**c.** "*Ew şikefta tê de ye* ..."<sup>19</sup> (Ew şikefta ku tê de ye ...)  
**d.** "... *ew xeyala tu tê da* ..."<sup>20</sup> (... ew xeyala ku tu tê de ...)

Dema mirov li xebatên sehayî yên herêma Mêrdinê dinêre, mirov dibîne ku gelek caran risteyên pêwendiyê bêjeyên demê modîfiye dike. Jixwe ji *Tablo 1*. jî xuya dibe ku ji 33 risteyên modîfiyeker 17 heb jê wekî rola semantîk, demê nîşan didin. Bi taybetî bêjeyên *wext, gav, zeman* pir tên bikaranîn:

- (6) **a.** "*Wexta'g mektûb dighêji xalî wî* ..."<sup>21</sup>  
**b.** "... *wexta gi jê re taştiya wî anîn* ..."<sup>22</sup>  
**c.** "*Gava ku pîrê di xew re diçû* ..."<sup>23</sup>  
**d.** "... *wexta ku Şewlê Biçûk ji bo dîtina bavê xwe diçi stenbolê*"<sup>24</sup>

Dema ku risteyên peywendiyê sereyeke demê modîfiye dikin sere bi awayekî anaforîk (anaphoric) di risteyê de cih nagirin. Lê dema ku sere, *ne navdêreke demê* be dikarin cih bigirin. Di metnên sehayî de ji cihnâvên bêjeyî (lexical) bêtir, cihnava enklitîk (enclitic pronoun) -ê bi awayekî anaforîk tê bikaranîn ku bi piranî diçe dawîya daçekan û bi wan ve dizeliqin. Eger em li metnên sehayî binîrin em dikarin gelek nimûneyan bibînin:

- (7) **a.** "... *ew şikefta gi tê de ye* ..."<sup>25</sup>  
**b.** "... *kêra gi pê cebeş dişkenîni* ..."<sup>26</sup>  
**c.** "... *şexsê gi jê diqeheri*."<sup>27</sup>

17 Baş, h.b., r.13.

18 Baş, h.b., r.11.

19 Koşar, h.b., r.18.

20 İbrahimoglu, Şoreş, *Bikaranîna Lékeran Ji Aliyê Binyadî Ve Li Herêma Qoser Û Tûr Abîdîn* (Li ser Çar Çirokén Herêma Qoser û Tûr Abîdîn), Teza Xelaskirinê ya Lîsansê, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Fakulteya Edebiyatê - Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, 2015. r. 20.

21 Akbaş, h.b., r. 22.

22 Koşar, h.b., r. 17.

23 Şimşek, Ahmet. *Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Devoka Kercosê De*(Wek mînak Şeş Çirokên Herêma Kercosé, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstituya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013. r. 15.

24 Atış, Ali. *Di Devoka Çiyayê Mazî de Bikaranîna Hevalnavan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstituya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2016. r. 8.

25 Koşar, h.b., r. 18.

26 Akbaş, h.b., r. 16.

27 Ayta, Ramazan. *Çirok û Çîrcirokên Kaniya Xezalan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstituya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013. r. 20.

**d. "Beroşek ji va yê mezin ê ku savarê tê de dikelandin..."<sup>28</sup>**

Her çend li gor Ergin Opengin şaşî ye ku *sere* bi awayî cihnavkî û hevreferansî di risteya peywendiyê de bê bikaranîn jî,<sup>29</sup> bikaranînên jor vê yekê piştrast na-kin. Mirov dikare bibêje ku tendansek heye ku cihnavêna anaforîk ên ku sereyan temsîl dîkin zêde di risteyen peywendiyê de cih nagirin, lê ne ku şaş in. Sebeba ku zêde nayê bikaranîn jî bêtir bi mijara topîkalîteyê ve têkildar xuya ye. Lewra tesîreke xurt a topîkalîteyê li ser peyvrêziya kurmancî heye. Mirov dikare bibêje ku pêkhênen topîk (ji ber ku ji konteksta berî xwe tên zanîn) bi çend awayan rengvedana xwe didin riste an hevokan:

- 1.** Pêkhênen topîk gelek caran bi cihnavêna anaforîk tên temsîlkirin.
  - 2.** Pêkhênen topîk gelek caran dikarin neyên bikaranîn û ladan (deletion) pêk bê. (ladana bikerê, bireserê, biresera îndîrekht hwd.)
  - 3.** Dema ku cextkirineke xurt ji bo pêkhêneke topîk ne lazim be ji dêvla cihnavêna bêjeyî cihnavâna enklîtîk (-ê) dikare bê bikaranîn. Lewra cihnavâna enklîtîk bê guvaş e.
  - 4.** Tiştê ku diyar dike ka gelo dê stratejiya *cihnavêna anaforîk ên bêjeyî* an *enklîtîk* an jî ya *ladanê* bê bikaranîn, girîngbûn û li pêsbûna wê pêkhêne ye. Yanî eger cextkirin qet ne lazim be, em stratejiya *ladanê*; eger hindik lazim be em stratejiya cihnavêna anaforîk û bêjeyî; eger qet ne lazim be em cihnavêna anaforîk ên enklîtîk bikartînin.
- Eger em vegeerin ser mînakênu ku me ji metnênu sehayî girtibûn û dîsa li wan binêrin, em dikarin bibînin ku ji dêvla cihnavâna enklîtîk bi hêsanî em dikarin cihnavênu din jî bikarbînin:
- a.** "... *ew şikefta gi di wê de ye ...*" (wê ji bo şikeftê hatiye bikaranîn)
  - b.** "... *kêra gi bi wê cebeş dişkenîni ...*" (wê ji bo kêrê hatiye bikaranîn)
  - c.** "... *şexsê gi ji wî diqehiri.*" (wî ji bo şexs hatiye bikaranîn)
  - d. "Beroşek ji va yê mezin ê ku savarê di wê de dikelandin..."** (wê ji bo beroşê hatiye bikaranîn)

Wekî me got bikaranîna cihnavêna anaforîk (êن bêjeyî) ne tendanseke xurt e û ev yek di xebatênu sehayî de jî pir eşkere ye. Lê ne ku bikaranîna wan şaş e; ji ber ku jixwe bikaranîna *sereyê* ya cara pêşî *sereyê* dike topîk û êdî pêwîstî dîsa bi bikaranîna wê ya anaforîk namîne û loma jî stratejiya herî xurt a di risteyen peywendiyê de dibe *ladan*. Dema ku em stratejiya *ladanê* bikardeynin û ji bo cextkirinê eger besdarbûna *sereyê* ya nav risteya peywendiyê, bi strate-

28 Çoban, h.b., r. 19.

29 Opengin, Ergin. "Repertuara Zimanî û Afrandina Edebî: Nirxandineke Zimannasî Li Ser Edebiyata Kurmancî ya Hevçerx", Tîr û Armanç, Gotaren Rexneyî Li ser Edebiyata Kurdi ya Modern, Amadekar. Remezan Alan & Ergin Opengin, Weşanên Peywend, Stenbol, 2014. r. 181.

jîya cihnavêن anaforîk nîşan didin jî em dibînin ku bi gelek rolên rêzimanî û semantîk di wan de dikarin peyda bibin:

- (8) **a.** *Zilamê gi min ew dîtibû ...* (min zilam dîtibû)  
     - sere, biresera dîrekta risteya peywendiyê ye. (direct object)
- b.** *Zilamê gi min li wî dinêrî ...* (min li zilam dinêrî)  
     - sere, biresera îndîrekta dîreksiyonel e (indirect directional object)
- c.** *Zilamê gi min pênûs da wî ...* (min pênûs da zilam)  
     - sere, biresera îndîrekta datîf e (indirect dative object)
- d.** *zilamê gi min ji bo wî av anîbû ...* (min ji bo zilam av anîbû)  
     - sere, biresera îndîrekta armancî ye (indirect benefactive object)
- e.** *zilamê gi ez bi wî re çûbûm ...* (ez bi zilam re çûbûm)  
     - sere, hokera bihevrebûnê ye (associative, manner)
- f.** *mala gi em li wê rûniştin ...* (em li malê rûniştin)  
     - sere, hokera cihî ye (locative, manner)
- g.** *kêra gi ez bi wê goşt jê dikim...* (ez bi kêrê goşt jê dikim)  
     - sere, biresera îndîrekta navgînî ye (indirect instrumental object)

Risteyên peywendiyê ji bilî ku demê û navdêrên din modîfiye bikin, gelek caran di metnên sehayî de, cihnavêن *a/ê* jî modîfiye dikin ku *a* ji bo mî û *ê* jî ji bo hem nîr hem jî pirjimar têr bikaranîn. Ev cihnav wekî sere têr bikaranîn û bikaranîna van cihnavan gelek caran li gor kontekstê, anaforîk (anaphoric) in:

- (9) **a.** “*ê gi şertê mi jê neki, şertê mi dernexîni ...*”<sup>30</sup>
- b.** “*yê ku gog diêxist refikê de...*”<sup>31</sup>
- c.** “*ê gi hat kuştin ...*”<sup>32</sup>
- d.** “*ê gi vedigerin zinarê ...*”<sup>33</sup> (ji bo pirjimar)

Dema ku mirov li jor dinêre mirov dikare bibêje ku li şûna wan cihnavên jorîn *ev* û *ew* jî karîbûn di konteksteke anaforîk de bihatina bikaranîn. Yanî mirov karîbû wisa jî bigota:

30 Akbaş, h.b., r. 10.

31 Akinci, Enes. *Bikaranîna Rengêran Di devoka Kerboranê De (Weke Mînak Du çîrokên Herêma Kerboranê)*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstituya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê Şaxa Mâkezanista Ziman û Çanda Kurdi, Mêrdin, 2004. r. 10

32 Baş, h.b., r. 21.

33 Saruhan, Murat. *Bikaranîna Daçekan Li Herêma Mêrdinê (Wek Mînak Şeş Çiroka Hecî Ahmed Axa Ú Reşa Kûrî)*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstituya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê Şaxa Mâkezanista Ziman û Çanda Kurdi, Mêrdin, 2013. r. 16.



- (9)’ a. “*ewê gi şertê mijê neki, şertê mi dernexîni ...*”  
 b. “*evê ku gog diêxist refikê de...*”  
 c. “*êwêñ gi vedigerin zinarê ...*” (ji bo pirjimar)

Lê her çend ew bikaranîn nêzî hev xuya bin jî hindik cudabûn di navbera şîroveya wan a semantîk de heye. Di vê xalê de em dikarin behsa du cudabûnên bingehîn bîkin:

1. Cihnavêñ “a/ê li gor “ev/ew”ê bêtir ji bo rewşen cenerîk (generic) têñ bikaranîn. Yanî hem a/ê hem jî ev/ew dikarin wekî cenerîk bêñ bikaranîn lê di rewşen cenerîk de bêtir a/ê têñ bikaranîn.

2. Cihnavêñ a/ê li gor “ev/ew”ê bêtir ne-sînordar (non-restrictive) in. Lewra, her çend ji aliyê zayendî ve cudahî di navbera wan de tunebe jî, di cihnavêñ ev û ewê de maneya nêzîk û dûr jî heye û ev yek ev û ewê bêtir sînordar (restrictive)dike.

Risteyêñ peywendiyê dibe ku ji yekê zêdetir bêñ bikaranîn lê yek sereyê modîfiye bîkin. Yanî du an zêdetir risteyêñ peywendiyê dikarin ji bo modîfiyekirina yek sereyê bêñ bikaranîn:

- (10) Bavê gi ji bo zarokê xwe diçûn şer dikirin **gi** zarokê wan hîn gelkî  
 1                               3  
ciwan bûn...

Di vê fraza (9)ê de sere *bav* e û ji aliyê du risteyêñ peywendiyê ve hatiye modîfiyekirin:

- (10)’ a. *bavên ku ji bo zarokê diçûn şer dikirin*  
 b. *bavên ku zarokê wan hîn gelkî ciwan bûn*

Di xebatêñ sehayî de em zêde rastî nimûneyan nehatin ku bi du an zêdetir risteyêñ peywendiyê navderek hatibe modîfiyekirin. Dema ku têñ bikaranîn jî, ji dêvla *kuyê* yan *gihaneka* ûyê têñ bikaranîn an jî tiştek nayê bikaranîn. Navbera du risteyêñ ku tiştek tê de nayê bikaranîn, di axaftinê de bi *navbera kurt* (minor break) û di nivîsê de bi bêhnokê tê cuda kirin:

- (11) a. “...du eskerê *ku tivingê wan li milê wan* û *şûrê wan* di *destê wan* de *ne, zilam tînine hizûra mîr.*”<sup>34</sup>

34 Çoban, Mehmet. *Bikaranîna Rengdêran Li Herêma Midyadê*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstituya Zimanê Zindî yên Li Tırkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2014. r. 13.

**b.** “*Ewê go ketiyê xiznê û te girtî bavê min e.*”<sup>35</sup>

Di hevoka (11.a.)yê û (11.b.)yê de sereyên fraza navdêrî ji aliyê du risteyên peywendiyê ve hatine modîfiyekirin. Di (11.a.)yê de du risteyên ku bi gihaneka ûyê ve hatine girêdan ev in:

- a.** du eskerê *ku tivingê wan li milê wan in*
- b.** du eskerê *ku şûrê wan di destê wan de ne*

Di (11.b.)yê de jî dîsa sereya hevbeş ji aliyê du risteyên peywendiyê ve hatine modîfiyekirin:

- a.** *Ewê go ketiyê xiznê (ewê ku ketiye xezîneyê)*
- b.** *Ewê go te girtî (ewê ku tu girtî)*

Risteyên peywendiyê ji ber ku kompleks in dema ji yekê zêdetir bin ifadeyê girantir dîkin. Loma jî ji zimanê rojane bêtir di zimanê edebî de tên tercîhkîrin. Wekî mînak ji roman û çirokeke nivîskarên Mêrdînî eger em du mînakan bidin:

- (12) **a.** “*Ew qesr û malên ku di wexta xwe de şevan bi dehan mirov tê de radibûn û bi dehan tê de rudiniştin û temamê wan bi ikram, tê de bi xwarin û vexwarin dibûn...*”<sup>36</sup>
- b.** “... qehwexaneya me ya ku li ber bahrê ya ku em û hevalan lê diciviyan û civanêن me hema hema giş her dem li wir bûn ....”<sup>37</sup>

Di hevoka (12.a.)yê de sereya fraza, *Ew qesr û malên ku di wexta xwe de şevan bi dehan mirov tê de radibûn û bi dehan tê de rudiniştin û temamê wan bi ikram, tê de bi xwarin û vexwarin dibûn* ji aliyê du risteyên peywendiyê ve hatiye modîfiyekirin:

- a.** *Ew qesr û malên ku di wexta xwe de şevan bi dehan mirov tê de radibûn û bi dehan tê de rudiniştin*
- b.** *Ew qesr û malên ku temamê wan bi ikram, tê de bi xwarin û vexwarin dibûn*

Di hevoka (12.b.)yê de jî seraya fraza *qehwa li ber bahrê ku em heval lê dicivin û civanêن me hema hema her dem li wir e dîsa ji aliyê du risteyên peywendiyê ve hatiye modîfiyekirin:*

35 Güneş, Mehmet Bakır. *Rêjeya Bikartanîna Dengan Di Di Devoka Tor Abîdin De Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013. r. 22.*

36 Ayebe, Lokman. *Gava Heyatê, Weşanxaneya Belkî, Diyarbakir, 2007. r. 72*

37 Bîlge, Fewzî. *Dîn in, Weşanxaneya Belkî, Diyarbakir, 2006, r. 19.*

- a. qehwexaneya me ya ku li ber bahrê ya *ku em û hevalan lê diciviyan*
- b. qehwexaneya me ya ku li ber bahrê ya *ku civanêن me hemâ hemâ giş her dem li wir bûn*

### Dercihî (Extraposition) Di Risteyên Peywendiyê De

Di hin rewşan de dema ku lêkera risteya bingehîn dikeve navbera sere û modîfiyekera wê û risteya peywendiyê piştî lêkera bingehîn tê, risteya modîfiyeker jî diçe dawiya hevokê. Yanî risteya peywendiyê ji cihê xwe yê eslî der dibe ango dûr dikeve. Lê dîsa jî fonksiyona wê ya modîfiyekirinê dewam dike. Di rewşen wisa de *izafe* ku girêdana sereyê û risteya peywendiyê çêdike jî êdî nayê bikaranîn:

- (13) a. *Mi do xwarinik gi mirov jê têr nedibû xwar.*  
 b. *Mi do xwarinik xwar ku mirov jê têr nedibû. (dercihî çêbûye)*  
 c. *Lawê wî yê ku ji welêt vegeryabû ket erdê.*  
 d. *Lawê wî ket erdê yê ku ji welêt vegeryabû, (dercihî çêbûye)*

Dibe ku bi lêkera bingehîn re hinek pêkhênen din jî têkevin navbera sereya frazê û risteya ku wê modîfiye dike:

- (14) a. *Mi kincê ku nuh û rengorengo bûn* ji mirovê koçber re şandin.  
 b. *Mi kinc ji mirovê koçber re şandin **ku nuh û rengorengo bûn.***  
*(dercihî çêbûye)*  
 c. Qemyona, *rêya ku me bi kevira çêkiribû* bi şiklekî pir xerab texrîb kiribû.  
 d. Qemyona, *rê* bi şiklekî pir xerab texrîb kiribû ***ku me bi kevira çêkiribû.***  
*(dercihî çêbûye)*

Baş e gelo ji ber ci egerên semantîk di risteyên peywendiyê de sere û modîfiyekera wê ji hev dûr dikevin û lêker dikevin navbera sere û modîfiyekera wê. Li gor David Banks têkiliya vê yekê bi kêmkirina asta kompleksbûna rêzmanî ve heye û li gor wî dema ku risteya peywendiyê biçe dawiya hevokê, bi vî awayî ji aliyê rêzmanê ve hêasantir dibe.<sup>38</sup> Hem jî barê risteya peywendiyê ku bi agahîyen nû barkirî ye, bi çûna dawiya hevokê siviktir dibe. Li gor ku Andreea S. Calud<sup>39</sup> (ji Rowley-Jolivet&Carter-Thoma<sup>40</sup>) vediguhêze du sebebên pragmatîk hene ku

38 Banks, David. *There Is A Cleft In Your Sentence: Less Common Clause Structures In Scientific Writing*, asp 7/10, 3-11, 1995. r. 4.

39 S. Calude, Andreea. *Clefting And Extraposition In English*, ICAME Journal No. 32 (p. 7-33.), 2008. r. 12-13.

40 Elizabeth Rowley-Jolivet, Shirley Carter-Thomas. *Genre Awareness and Rhetorical appropriacy : Manipulation Of Information Structure*, by NS and NNS Scientists Sn The International Conference Sett. English for Specific Purposes, Elsevier Vol 24 (1), 2005. pp. 41-64.

dercihî çêdibe; yek dema ku dercihî çêdibe dînamîzma ragihandinê (communicative dynamism) xurttir dibe lewre agahiya nû ku bi risteya peywendiyê tê dayîn, diçe dawiya hevokê û bi vî awayî dînamîzmeç çêdibe. Ya duduyan ji, dema risteya peywendiyê diçe dawiya hevokê tesîra vegotinê/belaxatê (rhetorically effective) xurttir dibe. Yanî em van fikran bi sê xalên girîng bibêjin:

Bi dercihiyê:

1. Hevok ji aliyê rêzimanî ve hêsanter dibe
2. Dînamîzma ragihandinê zêde dibe
3. Hêza vegotinê xurttir dibe.

Piştî van mînak û agahiyan eger em li mînakên ku di xebatên sehayî de derdikevin pêş binêrin, du bikaranîn bala mirov dikişîne:

1. Dema ku pêvebera risteya bingehîn lêkerî (verbal) be û ketibe navbera sereya modîfiyekirî û risteya modîfiyeker:

- (15) a. “Rojekê li ser rê çend mirovan dibînê ku digirîn”<sup>41</sup>  
 b. “... eyn tiştê gi digot, kitêb d’bêji.”<sup>42</sup>  
 c. “... hestîkê mara bikevî destê te da ku ne bi van destan be dernekeve ...”<sup>43</sup>

Ev risteyêni li jor dema em bala xwe bidinê xuya dibe ku pêvebera bingehîn a ifadeya bingehîn ku lêkerên hem ji aliyê demê ve hem ji kesî ve kişandî ne, ketinne navbera sere û risteyêni modîfiyeker. Eger me risteyêni jor bi awayekî normal û bê dercihî bigotina dê wisa bûna:

- (16) a. ...çend mirovan dibînê ku digirîn (dercihî çêbûye)  
 b. ...çend mirovên ku digirîn dibînê (dercihî çê nebûye)  
 c. ... eyn tiştê gi digot, kitêb dibêji(dercihî çêbûye)  
 d. ... eyn tiştê gi kitêb dibêji digot(dercihî çê nebûye)  
 e. ... hestîkê mara bikevî destê te da ku ne bi van destan be dernekeve ...  
 (dercihî çêbûye)  
 f. ... **hestîkê mara ku ne bi van destan be dernekeve** bikevî destê  
 te da ... (dercihî çê nebûye)
2. a. Dema ku pêvebera risteya bingehîn navdêrî be û bi alîkariya kopûla bûbe pêveber û ketibe navbera sereya modîfiyekirî û risteya modîfiyeker:
- (17) a. “Ev ci iş e ku hûn dîkin.”<sup>44</sup>

41 Güler, Şehmus. *Efsaneyêن Li Ser Mêrdinê*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstituya Zimanêni Zindî yên Li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdin, r.14.

42 Akbaş, h.b., r. 13.

43 İbrahimoglu, h.b., r. 21.

44 Koşar, h.b., r.16.

**b.** “... *ew, xwirîniya wî ye gi pê taştê dixwe.*”<sup>45</sup>

Wekî di risteyên jor de jî xuya dibe, taybetiya ûfadeya bingehîn ew e ku divê pêveber ne lêkerî be, lê navdêr be û bi alîkariya kopulayê bûbe pêveber. Eger em van risteyên jor bêyî ku dercihî çêbibe binivîsin, dê wisa bibin:

- (18) **a.** Ev ci iş e ku hûn dikin.
- b.** \*Ev ci işe ku hûn dikin e.
- c.** ... *ew, xwirîniya wî ye gi pê taştê dixwe.*
- d.** \*... *ew, xwirîniya gi pê taştê dixwe ye.*

Dema em li (18.b.) û (18.d.)yê dinêrin em dibînin ku dema em kopûlayê pişti lêkera kişandî ya risteya peywendiyê tînin, rewşeke şaş û nerêzimanî derdi keve holê.<sup>46</sup> Di (16.b/d/f)yê de dema du lêkerên kişandî bi ser hev de hatin, rewşeke nerêzimanî û şaş çê nebû. Lê tê famkirin ku çê nabe ku kopûla pişti lêkere ke kişandî bê.<sup>47</sup> İbrahîm Seydo Aydogan<sup>48</sup> û Ergin Opengin<sup>49</sup> jî behsa vê meseleyê dike û ew vê yekê bi tesîra tirkî ve girê didin.

- 2. b.** Dema ku pêvebera risteya bingehîn lêkera hebûnê be û ketibe navbera sereya modifiyekirî û risteya modifiyeker:

- (19) **a.** ... *kurkî me heye go dibê ez nadim.*<sup>50</sup>
- b.** “*mîr hene karin serê te bipelçîqînîn*”<sup>51</sup>
- c.** “... *şikeftek hebû jê re digotin Şikefta Erebo.*”<sup>52</sup>
- d.** “... *hin eşqiya hene, bîst zencir kirina behrê ...*”<sup>53</sup>

Di metnên sehayî de dercihî herî zêde bi vî awayî çêbûne. Di van xebatên sehayî de tiştekî din jî bala mirov dikişîne ku dema lêkera hebûnê hebe û dercihî çêdibe, bingihaneka *kuyê* zêde nayê bikaranîn û dikeve. Eger me ew mînakên di (19)an de bê dercihî bigotina dê wisa bûna:

- (20) **a.** ... *kurkî me go dibê ez nadim heye.*”
- b.** “*mîrên ku karin serê te bipelçîqînîn hene*”
- c.** “... *şikeftek ku jê re digotin Şikefta Erebo hebû.*”

45 Koşar, h.b., r.15.

46 \* di zimannasiyê de sembola ne-rêzimaniyê ye.

47 Hêjayî gotinî ye ku di kurmanciya nûjen de em dikarin li van şâsiyan pir rast bê. Wekî mînak ji romana Nesîb Tarım: “*Dengê heywanên ku wê şevê neçûbûn ser tewlên xwe bû*”. (Tarım, Nesîp. Xezal, Weşanên Belkî, Stenbol, 2007, r. 24).

48 Aydogan, h.b. r. 147-148.

49 Opengin, h.b., r. 202.

50 Bulgan, h.b., r. 13.

51 Koşar, h.b., r. 15.

52 Saruhan. r. 19.

53 Derin, h.b., r. 6.

**d. “... hin eşqiya ku bîst zencir kirina behrê hene...”**

Stratejiyeke din a dercihiyê jî heye ku her çend di metnên sehayî de ji bilî yek-du mînakan me peyda nekir, lê em dizanin ku di axaftina nav xelkê de heye. Ew jî dercihkirina beşek ji sereyê ye (em dikarin bibêjin, stratejiya kurtkirina sereyê). Em pêşî li mînakeke sehayî binêrin:

(21) “Pîreka gi bi bavê min ri çûbû, navê wê Zero bû.<sup>54</sup>

Di risteya (20)ê de bêjeya navê ku di eslê xwe de beşeke sereyê ye, ji cihê xwe dûr ketiye û dercihî derbas kiriye. Ev yek ji bo ku hindiktir komplîke be tê kîrin. Loma me karîbû wisa jî bigota, lê fraz bêtir dirêj û komplîke dibe:

(22) “navê pîreka gi bi bavê min ri çûbû, Zero bû.”

Eger em bi hinek mînakêñ din vê yekê rave bikin:

(23) a. *Jina gi alîkariya me kir, destê wê şkestibû.*

b. *Texsiya gi min jê hez kir, xwediyê nedixebeitî.*

c. *Telefona ku ez lê digeryam, rengê wê spî bû.*

Di van mînakêñ (23)an de beşek ji sereyê ji cihê xwe der bûne û fraza navdêrî kurt û hêsanter kirine. Eger me bi awayê dirêj bigota dê wisa bûna:

(24) a. *Destê jina gi alîkariya me kir skestibû.*

b. *Xwediyê texsiya gi min jê hez kir nedixebeitî.*

c. *Rengê telefona gi ez lê digeryam spî bû.*

Dema ku mirov li rewşen̄ dercihiyê dinêre, mirov dikare bibêje ku di hemû cureyên wê de tiştê hevbeş ew e ku ji bo kêmter komplîke be, guhertin têr kîrin ku du pêveber bi ser hev de neyên. Dema mirov risteyê (23.a.b.c.) û (24.a.b.c.) yê dide ber hev jî ev yek eşkere xuya dibe. Di (24.a.b.c.)yê de du heb pêveber ku yek ya ifadeya bingehîn e yek jî ya risteya peywendiyyê bi ser hev de hatine û ev yek wan bêtir komplîke dike. Mirov dikare bibêje ku fikra Banks ku dercihiyê bi kêmkirina asta komplîkebûnê ve têkildar dike, di cih de ye.

Dema mirov li sereyên frazan dinêre ku di xebatên sehayî de hatine bikaranîn, tiştêkî din jî bala mirov dikişîne ku risteyê peywendiyyê bi modîfiyekerên din ên paşnavdêrî yêne wekî rengdêr û frazên daçekî re zêde nayêne bikaranîn. Her çend modîfiyekerên pêşnavdêrî yêne wekî *nîşander* (ev/ew) *çendîker* (quantier) û *hejmar* pir têr bikaranîn jî modîfiyekerên paşnavdêrî hema hema nayêne bikaranîn û di nav gelek xebatên sehayî de, tenê di yek-du nimûneyan de hebûn. Dema têr bikaranîn jî dikevin navbera sere û risteya peywendiyyê:

54 Saruhan, h.b., r. 19.

- (25) a. "... zilamekî ***feqîr***, ***belengaz***, ***jiderbketi*** ku tî û birçî maye ..."<sup>55</sup>  
 b. "Eskerên ***li ber derî*** ku wekî Ristemê Zal bûn ..."<sup>56</sup>

### Navdêrandina (nominalization) Risteyêney Peywendiyê:

Dema ku lêker fonksiyona navdêran bibîne û bibe argumenta lêkereke din, navdêrandin pêk tê.<sup>57</sup> Risteyêney peywendiye di kurmancî de risteyê temam (full-fledged clause) in û lêker hem li gor kesan hem jî li gor dem, aspekt û modaliteyê wekî risteyeke normal û resen çêdibe. Dema ku lêkera risteya peywendiye tê navdêrandin aango tê nominalizekirin peyvrêziya risteya peywendiye ji binî ve diguhere û êdî ji holê radibe. Eger em bi mînakan vebêjin dê guhertinê morfo-sentaktik ku tesîrê li peyvrêziyê dikin, çêtir bêñ famkirin:

- (26) a. kêra ku mi zebeş pêjê dikir  
 b. kêra jêkirina zebeşan ...

Di risteya (26.a.)yê de *jê kirin* wekî lêkereke risteya peywendiye hatiye bikaranîn. Lê di (26.b.)yê de navdêrandin pêk hatiye û lêker bûye sereya fraza daçekî. Yanî dema ku lêkera risteya peywendiye tê navdêrandin êdî risteya peywendiye ji holê radibe û peyvrêzi jî diguhere. Dema ku lêkera fraza peywendiye wekî navdêr tê bikaranîn, rolêñ sentaktik ên biker, bireser û pêkhênen din jî diguherin û êdî wekî modifiyekerêñ wê lêkera navdêrandî tên bikaranîn.<sup>58</sup> Mirov ji bo rewşa pêveberê ya morfo-sentaktik jî dikare vana bibêje:

- a. Lêker êdî dikeve rewşa raderî (mesder) û dibe xwedî morfolojiya navdêran
- b. Lêker êdî wekî sere tê bikaranîn.
- c. Lêkera dema ku dibe navdêr morfolojiya *taf-aspect-modaliteyê* wenda dike.
- d. Lêker morfolojiya rêkeftina cihnavkî wenda dike.
- e. Sere wekî biker an bireser dikevin rewşa diyarkirî (genitive).
- f. Modifiyeker dikarin lê zêde dibin.

Eger rewşa navdêrandina risteyêney peywendiye em bi mînakan îzah bikin, dê çêtir bêñ famkirin:

55 Çoban, h.b., r. 13.

56 Çoban, h.b., r. 13.

57 Hopper, P. and S. Thompson. *The Discourse Basis For Lexical Categories In Universal Grammar, Language*, 60, p. 703-750 , 1984. r. 737.

58 Givon, h.b., Volume II, r. 24.

- (27) a. sebeba *ku xwendekar nehatibûn...*  
 b. sebeba *nehatina xwendekara...*

Wekî berê jî hat gotin risteyê peywendiyê hemû taybetiyêne risteyeke normal di xwe de dihewînin ku bi hemû cureyên lêkeran dikarin bêñ bikaranîn û biker, bireserên dírekt û îndírekt û hemû cureyên hokeran dikarin di wan de cih bigirin. *Di hevoka (27.a.)ê de di risteya peywendiyê de bêjeya xwendekar wekî biker û nehatibûn jî wekî pêveber hatiye bikaranîn.* Lê dema navdêrandin pêk tê, rolên rêzimanî jî diguherin û bêjeya *xwendekar* ku biker bû êdî ne biker e û wekî di (27.b.)ê jî xuya dibe wekî temamkera bêjeya ku berê navdêr bû, karê modîfiyekirinê pêk tîne. Dema em hokerekê li bikaranîneke wisa zêde bikin jî ferq nake û ew jî wekî modîfiyekera wê bêjeya navdêrandî, tê bikaranîn:

- (28) a. sebeba *ku xwendekar du roja nehatibûn...*  
 b. sebeba *nehatina xwendekara ya du roja*

Di (28.a.)ê de *du roja* wekî hokera demê lê hatiye zêdekirin, di (28.b.)ê de bi fraza navdêrî ve hatiye girêdan û wekî modîfiyekera wê hatiye bikaranîn. Dema ku di risteyeke peywendiyê de lêker têper be û bireser jî bêñ bikaranîn dîsa ferq nake û ew jî wekî yên din dibe modîfiyekera bêjeya navdêrandî:

- (29) a. sebeba *ku xwendekara nan nexwaribûn ...*  
 b. sebeba *nexwarina nan ya xwendekara ...*

Di fraza (29.a.)yê de *xwendekar* biker *nan* jî biresera risteya peywendiyê ye. Lê di (29.b.)ê de dema navdêrandina lêkerê pêk tê, êdî *nan* û *xwendekar* wekî modîfiyekera bêjeya navdêrandî têñ bikaranîn. Dema modîfiyeker zêde dibin di nav wan modîfiyekera de rewş û rolên semantîk yên têkildarî rêzbûna wan jî peyda dibin. Wekî mînak di guherîna fraza (29.a.)yê ya (29.b.)ê de du rewşen semantîk hene ku tesîrdar in li ser peyvrêzî ango sentaksê:

**1. Fokûs:** Dema ku zêdetirî yek modîfiyekerê hebe û *izafeya fokûskirinê* bêñ bikaranîn hêmana dawî bi *izafeya fokûskirinê* têñ bikaranîn. Mesela di fraza (29.b.)ê de fokûs li ser bêjeya *xwendekara* ye. Di wê frazê de *nan* û *xwendekar* herdu jî eger fokûs li ser *nan* bûya divê wisa bûya:

- (30) a. sebeba *ku xwendekara nan nexwaribûn...*  
 b. sebeba *nexwarina xwendekara ya nan...*

Di (30.b.)yê de fokûs li ser bêjeya *nan* e û ew fokûs jî fokûsa dijber (contrastive focus) e. Fokûsa dijber jî li gor Givón axêver dema ji guhdar re tiştekî

dibêje, li ser zanîna guhdar (hearer's knowledge) di nav hinek hêviyan (expectation) de ye ku ev hêviyên wî yên li ser zanîna guhdar dibe ku bi du xalêñ girîng ve girêdayî bin:<sup>59</sup>

- a. Nezanîn (ignorance):** Guhdar wê agahiyê nizane.
- b. Zanîna berovajî (contrary belief):** Guhdar wê agahiyê berovajî dizane.

Yanî di fraza (30.b.)yê de, axêver fokûsê datîne ser *nan* ji ber ku axêver difikire ku:

- a. Guhdar nizane sebeba nexwarina xwendekaran** çi ye.
- b. Guhdar difikire ku sebeba nexwarina xwendekaran X, Y, Z** an tiştekî din e.

Ji bo fraza (29.b.)ê ku ïzafeya fokûskirinê berî bêjeya *xwendekar* hatiye û modîfiyekera *nan* berî xwendekar hatiye jî heman tişti em dikarin bibêjin.

**2. Promosyon û Demosyon:** Promosyon ango terfikirin, bilindbûna asta semantik a pêkhêneke risteyê îfade dike. Bi taybetî di rewşa pasif de dema em biresera risteyeke aktif wekî bikera sentaktik bikartînin, promosyon çêdibe. Yanî asta bireserê bilind dibe asta bikerê û ev yek jî promosyon e. Demosyon jî berovajî promosyonê diqewime, dema ku di asta hiyerarşıya topikaliteya pêkhênekê de nizimbûn çêbibe. Mesela asta bikerê dakeve asta bireserê ew jî dibe demosyon. Di navbera pêkhênen risteyê de ji aliyê topikaliteyê ve hiyerarşıyek pêkhênen risteyê heye ku wekî pêşqebûl, ev hiyerarşî wisa ye:<sup>60</sup>

Biker > biresera datîf/armancî > Objekta direkt > objecta locative > ên din  
(Agt > Dat/Ben > Pat > Loc > others)

Heger em dîsa li frazêñ xwe vegezin:

- (31) **a. sebeba ku xwendekara nan nexwaribûn...**  
**b. sebeba nexwarina xwendekara ya nan ...**

Di fraza (31.a.)ê de bikera risteya peywendiyê *xwendekara* di (31.b.)yê de êdî ne biker e û demosyon derbas kiriye. Jixwe demosyon û ladana (deletion) bikerê asta pêkhênen din bilindtir û girîngtir dike.<sup>61</sup> Lê rewşa pêvebera (31.a.)yê *nexwaribûn* berovajî ya demosyona bikerê ye. Ji ber ku pêvebera *nexwaribûn* di (31.b.)yê de bûye navdîr, bêtir derketiye pêş û di hiyerarşıya semantik de girîngtir bûye. Jixwe pozîsyona wê jî guheriye û hatiye pozîsyoneke pêşdetir

59 Givón, h.b., Volume II, r. 125.

60 Givón, h.b., Volume I, r. 200.

61 Geniušiene, Emma. "Passives in Lithuanian (in comparison with Russian," in *Passivization and Typology Form and Function*, Editor: Werner Abraham & Larisa Leisiö, John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia, (p. 29-61). 2006. r. 41.

ku wekî Geniušiene dibêje pozîsyona pêşî pozîsyona herî tematîk (thematic) e û ya dawî jî ya herî rematîk (rhematic) e.<sup>62</sup> Ji ber van hemû egeran em dikarin têkiliya peyvrêzî ya bi demosyon û promosyonê bi kurtahî bi van xalan bibêjin:

**1.** Dema ku pêveber tê navdêrandin (nominalization) û wekî biker an bireser tê bikaranîn promosyon çêdibe û ji aliyê pozîsyona peyvrêziyê ve ber bi pozîsyoneke pêşdetir ve tê.

**2.** Dema ku bikera risteya peywendiyê ji bikerbûnê dikeve û demosyonê pêk tê û wekî modîfiyekera pêvebera navdêrandî tê bikaranîn, ji aliyê pozîsyona peyvrêziyê ve ber bi pozîsyoneke paşdetir ve diçe.

**3.** Dema ku biker û biresera risteya peywendiyê wekî modîfiyekeren pêvebera navdêrandî tê bikaranîn, fokûs li ser kîjanê ji wan be, ew ji aliyê pozîsyona peyvrêziyê ve ber bi pozîsyoneke paşdetir ve diçe. Lewre wekî Geniušiene jî li jor gotiye, pozîsyona pêş a herî tematîk û ya paş jî ya rematîk e.

Rewşên semantîk ên wekî promosyon, demosyonê, ne tenê dema ku navdêrandin pêk tê çêdibin, dema ku dixin pasîf jî ev rewşen semantîk risteyen peywendiyê peyda dixin. Wekî me di serî de jî got, risteyen peywendiyê xwedî taybetiyen risteyeke normal in û çawa ku di risteyeke normal de biker, bireser, biresera îndîrek, hoker tê bikaranîn, di wan de jî dikarin bêñ bikaranîn. Lî ferqa wan ew e ku navdêrekê modîfiye dikan. Dema em risteyeke aktîf dikan pasîf, em ji aliyê sentaktîk ve bireserê dikan biker sentaktîk û wekî biker bikartînin. Ji aliyê semantîk ve jî em asta semantîk a bireserê bilind dikan ango promosyonê çedîkin. Dema ku bireser êdî şûna bikerê digire jî biker an tê avêtin an jî bi ifadeyên wekî “ji aliyê ..., bi destê ...” bi awayekî obsiyonel tê bikaranîn. Yanî biker demosyonê derbas dike û bireser jî promosyonê derbas dike. Ev tiş çawa ku di risteyeke normal de çêdibe, di risteyen peywendiyê de jî çêdibe:

(32) **a.** *Zilamê ku eskera ew kuştibû ...*

**b.** *Zilamê ku hatibû kuştin ...*

**c.** *Zilamê ku ji aliyê eskeran ve hatibû kuştin ...*

Di (32.a.)yê de risteya peywendiyê aktîf e û di (32.b./c.) de pasîf e. Dema ku di (32.b.)yê de risteya peywendiyê hatiye pasîfkirin, biker jê hatiye avêtin û biresera wê wekî biker sentaktîk hatiye bikaranîn. Di (32.c.)yê de jî bireser dîsa wekî biker sentaktîk e (ji ber ku lêker li gor wê tê kêşan) lî biker mantixî (logical subject) jî bi awayekî obsiyonel hatiye bikaranîn. Eger navdêra modîfiyekeri û biker risteyê heman be, çê nabe bibe pasîf. Ji ber ku di pasîfan de bireser dikeve şûna bikerê û bikerê bi awayekî sentaktîk (ne semantîk) ji risteyê davêje:

(33) **a.** *Zilamê ku nan xwaribû ...*

**b.** *\*Zilamê ku nan hatibû xwarin ...*

62 Geniušiene, h.b., r. 41.

Di pasîfkirina risteyên peywendiyê de xaleke din a girîng jî heye ku ew jî jêavêtina biresera îndirekt a datîf e. Wekî tê zanîn di kurmancî de piştî lêkerên datîf biresera îndirekt a datîf tê. Çawa ku di pasîfkirina risteyeke aktîf û normal de datîf jê tê avêtin, ji risteyên peywendiyê jî bi awayekî îcbarî tê avêtin:

(34) **a.** *qelema ku Ehmed dabû min ...*

**b.** *qelema ku hat dayîn ...*

**c.** *\*qelema ku hat dayîn min ...*

**d.** *\*qelema ku hat dayînî min ...*

Di (34.a.) yê de biresera îndirekt a datîf *min* e. Dema ku bibe pasîf bi awayekî îcbarî *min* jê tê avêtin û forma (34.b.) derdikeve holê. Di (34.c/d.) yê de *min* nehatiye avêtin û rewşike ne-rêzimanî (non-grammatical) çêbûye. Dema ku risteyên peywendiyê dibin pasîf, di nav hemû pêkhênen çi îcbarî çi jî obsiyonel de tenê bireserên datîf mecbûr e ku jê bê derxistin.

## ENCAM

Risteyên peywendiyê ku navdêran modîfiye dikin, gelek taybetiyê risteyeke normal di xwe de dihewînin û li gor modîfiyekerên din komplîke ne. Encamên sereke yên li ser risteyên peywendiyê û peyvrêziya wan ev in.

**1.** Tesîra mijara topîkalîteyê li ser besdarbûn an besdarnebûna serêyê ya nav risteya peywendiyê (bi rîya cihnavan), gelekî girîng e û ev yek bixwe jî tesîre li peyvrêziya wan dike. Tişte ku diyar dike ka gelo dê stratejiya *cîhnavêna anaforîk yêbêjeyî* an *enklîtîk* an jî ya *ladanê* bê bikaranîn, girîngbûn û li pêsbûna wê pêkhênen ye. Yanî eger cextkirin qet ne lazim be em stratejiya ladanê; eger hindik lazim be em stratejiya cihnavêna anaforîk û *bêjeyî*; eger qet ne lazim be em cihnavêna anaforîk ên enklîtîk bikartînin. Lê wekî tendans stratejiya herî xurt *ladan* e.

**2.** Her çend ji aliyê peyvrêziyê ve pozîsyona wan a paşnavdêrî naguhere û rijîd be jî hin rewşen din hene ku guhertin di wan de çêdibe. Bi taybetî dema ku dercihî çêdibe peyvrêziya wan diguhere. Dema ku lêkera risteya bingehîn dikeve navbera sere û modîfiyekera wê û risteya peywendiyê piştî lêkera bingehîn tê, risteya modîfiyeker diçe dawiya hevokê. Dercihî ji ber ku du heb pêveber, yek a risteya bingehîn yek jî ya risteya peywendiyê bi ser hev de neyên, tê kirin. Ji ber ku bikaranîna du pêveberan a bi ser hev de, bêtir komplîke ye. Di vir de taybetiya pêvebera bingehîn jî girîng e. Ji ber ku li gor rewşa pêveberê sê rewşen cuda derdi Kevin holê:

**a.** Eger ku pêvebera risteya bingehîn navdêrî be û bi alîkariya kopûla bûbe

pêveber û ketibe navbera sereya modîfiyekirî û risteya modîfiyeker, ev cure dercihî ïcbarî ye. (*ev ci iş e ku tu dikî- \*ev ci işê ku tu dikî ye*)

**b.** Eger ku pêvebera risteya bingehîn lêkerî (verbal) be û ketibe navbera sereya modîfiyekirî û risteya modîfiyeker, ev cure dercihî obsiyonel e. (*ez mirovan dibînim ku digirîn- ez mirovîn ku digirîn dibînim*)

**c.** Eger ku pêvebera risteya bingehîn lêkera hebûnê be û ketibe navbera sereya modîfiyekirî û risteya modîfiyeker, ne ïcbarî be jî tendanseke xurt e. (*mêr hene ku karin serê te bipelçîqînin- mîrêr ku karin serê te bipelçîqînin hene*)

**3.** Cureyekî din û spesifik ê dercihiyê heye ku bi stratejiya kurtkirina sereyê çêdibe. Bi vî awayî beşek ji sereyê sînorê frazê derbas dike û barê ku fraza navdêrî hildigire siviktir dibe. (*pîreka gi bi bavê min ri çûbû, Zero bû - navê pîreka gi bi bavê min ri çûbû, Zero bû*)

**4.** Dema ku risteyên peywendiyê tênavdêrandin peyvrêziya wan ji binî ve diguherin ku pêvebera wan wekî modîfiyekera sereya nû tê bikaranîn. (sebeba *ku xwendekar nehatibûn-* sebeba *nehatina xwendekara*). Di paşxaneya semantîk a navdêrandinê de promosyon û demosyon û fokûs diyardeyên girîng in ku tesîrê li peyvrêziya wan dikan. Promosyon ango terfikirin bilindbûna asta semantîk ya pêkhênekê demosyon jî nizimbûna asta semantîk a pêkhênekê û fokûs jî pêkhêna girîng ifade dike ku merkeza maneyê ye. Loma:

**a.** Dema ku navdêrandin pêk tê pêvebera risteya peywendiyê promosyonê derbas dike û dibe modîfiyekera sereyê û asta wê bilind dibe (sebeba *ku xwendekara nan nexwaribûn -* sebeba ***nexwarina xwendekara ya nan***)

**b.** Dema ku navdêrandin pêk tê bi risteya peywendiyê demosyonê derbas dike û dibe modîfiyekera sereyê û asta wê dikeve (sebeba *ku xwendekara nan nexwaribûn -* sebeba ***nexwarina xwendekara ya nan***)

**c.** Dema ku navdêrandin pêk tê eger hem biker hem jî bireser di risteya peywendiyê de hebe fokûs bêtir li ser kîjanê be bi ïzafeya fokûskirinê tênavdêrandin û diçe ber bi dawiya frazê (ji (sebeba *ku xwendekara nan nexwaribûn e a. sebeba nexwarina xwendekara ya nan*, fokûs li ser *nan* e. **b.** sebeba *nexwarina nan ya xwendekara*, fokûs li ser *xwendekara ye*)

**5.** Dema ku risteyên peywendiyê tênavdêra modîfiyekeri û bikera risteyê ne heman kes/tişt be. Ji ber ku di pasîfan de bireser dikeve şûna bikerê û bikerê bi awayekî sentaktîk ji risteyê davêje. (*zilamê ku nan xwaribû - \*zilamê ku nan hatibû xwarin*). Risteyên peywendiyê û yên normal herdu jî dema tênavdêrandin, eger di risteyê de, biresera îndîrekta datif hebe bi awayekî ïcbarî jê davêjin. (*qelema ku Ehmed dabû **min-** \*qelema ku hat dayîn **min**, min divê bê avêtin*)

### Ferhengok

anaforîk	: anaphoric
bingihanek	: subordinator
cîhnava enklîtîk	: enclitic pronoun
çendîker	: quantifier
datîf	: dative
demosyon	: demotion
dercihî	: extraposition
fokûs	: focus
fokûsa dijber	: contrastive focus
fraz	: phrase
hevok	: sentence
ladan	: deletion
modîfiyeker	: modifier
modîfiyekirî	: modified
navdêrandî	: nominalized
navdêrandin	: nominalization
ne-sînordar	: non-restrictive
paşnavdêrî	: postnominal
pêkhêñ	: constituent
pêşnavdêrî	: prenominal
pêveber	: predicate
peyvrêzî	: word order
promosyon	: promotion
rêkeftin	: agreement
rematîk	: rhematic
riste	: clause
risteyêñ peywendiyê	: relative clause
sere	: head noun
sînordar	: restrictive
temamker	: complement
topîkalîte	: topicality

---

### ÇAVKANÎ

Akbaş, Mehmet Şerif. *Di Devoka Qoserê De Rêjeya Bikaranîna Dengan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013.

- Akinci, Enes. *Bikaranîna Rengêran Di devoka Kerboranê De (Weke Mînak Du çîrokên Herêma Kerboranê)*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2004.
- Atış, Ali. *Di Devoka Çiyayê Mazî de Bikaranîna Hevalnavan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2016.
- Aydogan, İbrahim Seydo. *Guman-1, Demnasî, Hevoksazî, Watesazî û Gotar*, Weşanên Lîs, Ankara, 2013.
- Ayebe, Lokman. *Gava Heyatê*, Weşanxaneya Belkî, Diyarbakir, 2007.
- Ayta, Ramazan. *Çîrok û Çîrcîrokên Kaniya Xezalan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013.
- Banks, David. *There Is A Cleft In Your Sentence: Less Common Clause Structures In Scientific Writing*. asp 7/10, 3-11, 1995.
- Baş, Abdulhekim. *Rêjaya Bikaranîna Dengan Di Devoka Qoserê De Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî*, Mêrdîn, 2013.
- Bîlge, Fewzî. *Dîn in*, Weşanxaneya Belkî, Diyarbakir, 2006.
- Bulgan, Bilal. *Bikaranîna Hevalnavan (Rengdêran) Di Devoka Herêma Kercewsê De Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî*, Mêrdîn, 2013.
- Carnige, Andrew. *Syntax: A Generative Introduction*. The Third Edition. A John Wiley & Sons. Ltd. Publication. Chichester /West Sussex- UK, 2013.
- Çoban, Mehmet. *Bikaranîna Rengdêran Li Herêma Midyadê*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2014.
- Demirkaya, İslameddin. *Di Nava Eşîra Morikan De Rêjeya Zayenda Bêjeyan Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî*, Mêrdîn, 2014.
- Derin, İpek. *Frekansa Tipê Kurdi Devoka Nisêbinê da (Mêrdîn)-Rêjeya Bikaranîna Dengan Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî*, Mêrdîn, 2014.
- Elizabeth Rowley-Jolivet, Shirley Carter-Thomas. *Genre Awareness and Rhetorical appropriacy : Manipulation Of Information Structure*, by NS and NNS Scientists Sn The International Conference Sett. English for Specific Purposes, Elsevier Vol 24 (1), pp. 41-64, 2005.
- Geniušiene, Emma. "Passives in Lithuanian (in comparison with Russian)" in *Passivization and Typology Form and Function*, Editor: Werner Abraham & Larisa

- Leisiö, John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia, (p. 29-61), 2006.
- Givón, Talmý. *Syntax, An Introduction, Volume I*, John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia, 2001.
- Givón, Talmý. *Syntax, An Introduction, Volume II*, John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia, 2001.
- Güler, Şehmus. *Efsaneyê Li Ser Mêrdînê*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013.
- Güneş, Mehmet Bakır. *Rêjeya Bikartanîna Dengan Di Di Devoka Tor Abdîn De Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî*, Mêrdîn, 2013.
- Hengeveld, Kees. “*Prototypical And Non-Prototypical Noun Phrases In Functional Discourse Grammar*” in “*The Noun Phrase in Functional Discourse Grammar*”. editör: Daniel Garcí'a Velasco & Jan Rijkhoff, Mouton de Gruyter, Berlin, 2008.
- Hopper, P. and S. Thompson. *The Discourse Basis For Lexical Categories In Universal Grammar*; Language, 60, p. 703-750, 1984.
- İbrahimoglu, Şoreş. *Bikaranîna Lêkeran Ji Aliyê Binyadî Ve Li Herêma Qoser Û Tûr Abdîn (Li ser Çar Çîrokên Herêma Qoser û Tûr Abdîn)*, Teza Xelaskirinê ya Lîsansê, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Fakulteya Edebiyatê- Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, Mêrdîn, 2015.
- Koşar, Fikret. *Bikaranîna Rengdêran di Çîrokên Devoka Qoserê (Mêrdînê) de*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2014.
- Makas, Hugo. *Kurdische Texte im Kurmânji – Dialekte Aus Der Gegend Von Märdîn & Eine Probe Des Dialektes Von Diarbekir; Ein Gedicht Aus Gäwar; Jezidengebete* APA - PHILO PRESS /AMSTERDAM- 1979.
- Omer Ehmed, Baîz. “*Girê Di Dayalekta Serî Ya Zimanê Kurdî Da, Govera Badînî*”, Kovara Zankoya Duhok, Perbenda 11, Jimare 1, 77-92, 2008.
- Opengin, Ergin. “*Repertûara Zimanî û Afirandina Edebî: Nirxandineke Zimannasî Li Ser Edebiyata Kurmancî ya Hevçerx*”, *Tîr û Armanc, Gotarêñ Rexneyî Li ser Edebiyata Kurdî ya Modern*, Amadekar. Remezan Alan & Ergin Opengin, Weşanêñ Peywend, Stenbol, 2014.
- Ritter, Helmut. *Kurmânci-texte aus dem Tûr'abdîn*, 2. Yeziden, Oriens, Vol. 25/26, pp. 1-37, 1976.
- Ritter, Helmut. *Kurmânci-Texte aus dem Tûr'abdîn*, I. Kärboran Oriens, Vol. 21/22, pp. 1-135 2, 1968/1969.
- S. Calude, Andreea. *Clefting And Extraposition In English*, ICAME Journal No. 32 (p. 7-33), 2008.
- Saruhan, Murat. *Bikaranîna Daçekan Li Herêma Mêrdînê (Wek Mînak Şeş Çîroka*

*Hecî Ahmed Axa Ú Reşo Kûrî*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013.

Şimşek, Ahmet. *Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Devoka Kercosê De (Wek mînak Şeş*

*Çirokên Herêma Kercosê*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013.

Tarim, Nesîp. *Xezal*, Weşanên Belkî, Stenbol. 2007.

# **SEARCH OF ZAZAKI SPEAKING INDIVIDUALS FOR IDENTITY**

## **Zazaca Konuşan Bireylerin Kimlik Arayışı**

**Süreyya ÇETKİN<sup>1</sup>**

### **Abstract**

This study is on the identity construction process of young generations who speak Zazaki. Firstly, it is elaborated why this search for identity is more common amongst the young generations. Later, some primary information regarding the reasons for the fact that the identity and sense of belonging of young people who speak Zaza language divided is presented. Function of the language on the identity construction process is discussed. The focus of this study is: politicization of the adopted identity in this identity construction process, sense of discomfort that young people have when identified with identities other than the adopted one, the effects of young generation on previous generations in this process of identity seeking, the attitude of the government towards young people in this issue, determination of the tendencies of young individuals based on this seeking within this process.

**Key Words:** Zazas, sense of belonging, youth, identity seek, Zaza youth

### **Özet**

Bu makale, anadili Zazaca olan genç kuşağın kimlik inşa süreci üzerinedir. Öncelikli olarak bu arayışın neden genç nesiller arasında daha yaygın olduğu üzerinde durulmuştur. Sonrasında Zazaca konuşan gençlerin kimlik aidiyeti üzerine olan bölünmüşlüğün nedenlerine dair bilgiler verilmiştir. Kimlik inşa sürecinde dilin fonksiyonu incelenmiştir. Bu kimlik oluşum sürecinde,

---

<sup>1</sup> Boğaziçi Üniversitesi, Tarih Bölümü Mezunu. sureyya.cetkin@gmail.com

üzerinde durulan kimliğin politik bir şey haline getirilmesi, atfedilen kimlik haricinde tanımlanmanın, gençlerde oluşturduğu rahatsızlık durumu, bu arayış sürecinde, genç neslin bir önceki kuşağı etkileme durumu, iktidarın bu konuda gençlere karşı tutumu, gençlerin bu süreç içerisinde bu arayışa bağlı olarak eğilimlerini belirlemeleri durumu çalışmanın ana başlıklarını oluşturmaktadır.

**Anahtar Sözcükler:** Zazalar, kimlik, aidiyet, kimlik inşası, Zaza gençliği

## Subject

نیره‌ج میرزا ژماره‌یکی زور کیشی ععروزی له شیعره داشورینه‌کانیدا به‌کار هیناوه، به‌لام هەندىك کیش که له دارشتی مذهبستی شیعریدا ئاسانترن و مکو کیشی (همز مجي) شەشی مەحزووف - مفاعیل مفاعیل فعلون) پتر به‌کار هیناوه، بەتایتی له مەسنهوییه دوور دریز مکانیدا بۇ نمونه له مەسنهوی (عارفنامه)دا که له (۵۱۰) دىرە شیعر پېنگەتاتووه. نئم شاعیره زوربه‌ی هەجوبيه‌کانی له چوارچىوهی نئم عارفنامدا دەختەررو. جگە لەم مەسنهوییه (۳) مەسنهوی ترى داشورینی لەسەر نئم کیشە داناوه.

کیشی رەممەل و بازنه جیاواز مکانی نئم کیشە له شیعره داشورینه‌کانی نیره‌ج میرزا پېشكى شیریان بەر دەکمۆئ، به‌لام بەشیووییکی گشتى نئم شاعیره نئرانیيە و مکو شیخ رهزا زور خۆی به کیشەوه پابند نەکردووه و له هەر جىگىكى به بىنۋىسى زانىيى لە یاساکانى کیشی ععروزى لايداوه. بەواتايىكى تر له هەندى شوين کیشە ععرووزیبەکانی نیره‌ج میرزا لەنگىان تىدەکمۆئ و له بېنناو ناورۆكدا کیشی شیعرىي پاش گۈئ دەخا. ھۆكارى نئم بابەته بۇ نئوە دەگەرینەمەو کە كۆملەكى نئرانى لە رەووی سیاسى، كۆمەلایتى، ئابۇرلى و كولتۇرېبىيەو رەووبەررووی گۇرانى مەزن بېۋە و لەلایك (شۇرۇشى مەشرۇوتىيەت)ى مەلا و رۇشنىبرانى نئرانى و لەلایكى تر (شیوازى مەددەنیيەت)ى رۇشنىبرانى لە رۇزئلاؤ گەراوه، گوشارىكى رادەبەدرى لەسەر دل و دەرروونى خەلکى، بەتایتى شاعیرانى نئو سەردىمە دەخستەمە. بۇيە نئو ھەمە نەمۇزم و گوشار و ورۇۋانە، نەيدەنۋانى خۇى لە قالب و کیش و سەرۋاى ياسا بۆدارپېزىر اودا بەند بکا؛ نیره‌ج میرزا کە نئم قۇناغە بە ھۆكارىكى بۇ تاز ھەگىرى لە ئەددەبى نئرانى دادەنرى.

يەكىكى تر لەو تايىەتەندىيەنەئى کە ئوازه‌ى دەرەوە دەقى شیعرىي پى دەسىنىشان دەكىرى، بابەتى سەرۋاىه. شیخ رهزا و نیره‌ج میرزا له شیعرەکانیاندا پابندى یاساکانى سەرۋاابندى شیعرى كلاسيك بۇونە و له چەند دىرە شیعرىك ناصىي، دەنە كەمتر سەرۋاى شیعره داشورینه‌کانیان لەنگى تىكەمتوووه. هەركام لەم شیعره داشورینانە شیخ رهزا و نیره‌ج میرزا كە پېشىر كیشەکانیان ئاماڭ میان پېنرا بەپىش

قالبی شیری سهرابهندیان بُ کراوه. بُ نمونه له قالبی قهسیدهدا، یاسای سهرابهندی قهسیده پیره و کراوه. له قالبی مهنهویدا یاسای سهرابهندی مهنهوی و له قالبکانی تریش هم به همان شیوه.

### ۲.۳.۲. نوازه‌ی ناووهه:

((نوازه‌ی ناووهه شیعر، که ریتمی شیعر پیک دههینت، لایتیکی گرنگی نوازه‌ی شیعری به له گمل نوازه‌ی دمهوه شیعردا نوازه‌ی گشتی هلهست پیک دههینن.)) [سعد فاروق: ۱۳۴، ۲۰۱۱] له شیعری دشوریندا نوازه‌ی ناووهه بهه و کومله هونهربیکی رهونهانه و هکو رهگهزدوزی، دزیهک، جوانی بایس، تیلشنان و پاتکردنوه جیمهجی دمکری. هرکام لمم هونهرانه به پله‌ی جیاواز کاریگمری خوبان لمسه دامهزراندنی نوازه‌ی ناووهه همه، رهگهزدوزی و پاتکردنوه به پله‌ی یهکم دین. له خواروه بُ هرکام لمم هونهرانه لای شیخ رهزا و نیرهچ میرزا نموونه‌یک دهخربیهرو.

### رهگهزدوزی:

ئهو روزه که تورام و له (کهرکووک) سەفەرم کرد  
مانهندی عەقارىب لە ئەقارىب حەزەرم کرد  
گەردون سنگى كىردىم و ھىنامىھ كۆيىنى  
مۇوانى لەكىن مامە غەفورى لەجەرم کرد  
جوسا لەھەرم جوبىه و فيسا لەسەرم فيس  
نه فيسى لەسەر نام و نه جوبىه لەھەرم کرد (شیخ رهزا: ۱۴۴-۱۴۳)

اگر کارش وفاقي يىافقى است	تمام کار عالم اتفاقى است
نە مەر ھىچ كىس در سىنە دارد	نە با كىنە دېرىنە دارد
نە مەرش را نە كىنىش را قرار است	نە آنش را نە اينىش را مداراست (ايرج ميرزا: ۸۹)

### پاتکردنوه:

رەشە رەشاشى رەش بە رەشت	تا رەشت ماوه رەش و سوور بەرەشت
چىل و چىوي چەممى رەشنەش بەرەشت	بە بەشت ھەم بە لەشت ھەم بەرەشت
(شیخ رهزا: ۱۴۵)	

کوسى بر عكس كوسىهای دگر تىگ کوسى بر عكس كوسىهای دگر تىگ (ايرج ميرزا: ۸۲)



### نهنجام:

لهم توییزینه‌وهیدا به گویره‌ی بنده‌مای زانستی به‌راوردکاری کومله‌یک نهنجام دهستعبیر کراون که له خواره‌ودا به چهند خالیک پیشکه‌مش دهکرین:

۱. له ریگه‌ی به‌راوردکردن شیعره‌کانی شیخ رهزا و نیره‌ج میرزا له بواری داشوریندا به‌دیار دهکه‌می که شیخ رهزا له دارشتنی شیعره‌کانیدا دریزدادری نهکدووه و کورتیزی به خالیکی نهربینی بتوئم شاعیره داده‌نری، به‌لام نیره‌ج میرزا بپیچه‌وانه‌وه دریزدادر بوروه و قله‌لم دریزی به خالیکی نهربینی نهتم شاعیره داده‌نری.

۲. له بکاره‌ینانی وشهی تابز و قده‌غه‌کراودا هم دوو شاعیره ملکه‌جی هیچ کوت و بهندیکی کومه‌لایه‌تی نهبوونه.

۳. شیعره داشورینه‌کانی نهتم دوو شاعیره له رهوی قلب و فورم و روحساری شیعره‌بیوه له یهکتری نزیکن، به‌لام ژماره‌یان جیاوازه و همه‌روهه شیخ رهزا تاک(فرد)یشی همه‌یه کمه‌چی نیره‌ج میرزا نیبیتی. قالبه‌کانیش به‌می‌ی ژماره‌یان بریتین له: لای شیخ رهزا (تاک ۸۸، چوارین ۳۵، قه‌سیده ۲۹، دووبه‌یتی ۲، پارچه ۱) و لای نیره‌ج میرزا (پارچه ۱۲، دووبه‌یتی ۱۱، قه‌سیده ۶، چوارین ۱). که‌وانه شیخ رهزا قالبی شیعری زیاتری به‌کار بردوه و ژماره‌ی شیعره داشورینه‌کانیشی زور زیاترن. له‌لایه‌کی تر نیره‌ج میرزا له شیعره داشورینه‌کانی که له‌سهر قالبی مه‌سنه‌وین، کومله‌له همه‌کایه‌تیکی له‌سهر زمانی گیانداران به مه‌بستی داشورین و گازه‌نده‌کردن هونیوه‌تنهوه که لای شیخ رهزا به‌دی ناکرین.

۴. له به‌دستکردن هونه‌هکانی رهونبیزی و شیعره‌بیتی دهق و نهفراندنی وینه‌ی هونه‌ریدا، تای تهرازوو به‌لای شیخ رهزا دا لاسنه‌نگی دهکا. تهناهنت له کاتی به‌راوردکردندا به‌دیارکه‌موت که هونه‌ری پوشین له هیچ یهک له شیعره داشورینه‌کانی دیوانی نیره‌ج میرزادا به‌کارنه‌هاتووه، که به یهکیک له هونه‌ر سهر مکیه‌هکانی له بواری داشورین داده‌نری.

۵. نیره‌ج میرزا له بدهیه‌ینانی مانای جوان له بواری داشوریندا، پابهندی گورانکاریبه نویکانی زمانی فارسی بوروه که له سمرده‌مهدما له ژیز کاریگه‌ری شیوازی گهرانه‌وه و شیوازی ناخاوتني خملکی (تاران) له چوارچیوه‌ی نهム زمانه‌ها به‌دیهاتبوون؛ له ههمان کاتدا زمانی شیخ رهزا زمانی توییزی بژارده‌ی کومله‌لگه‌ی کوردی نهム سمردهم بورو که زمانی حوجره و تهکیبه بوروه و بؤیه له جیگیری و پتھویدا زمانی شیخ رهزا زمانیکی بناغه‌داره.

۶. نهتم دوو شاعیره له شیعره داشورینه‌کانیاندا به زوری پابهندی کیشی عهرووزی عهربی بوروونه و زورجاریش پنیمه‌وه پابهند نهبوونه. بوق نمونه شیخ رهزا ژماره‌یهک شیعری لی له سهر کیشی پهنجه‌یه داناهو به تاییه‌تی نه مو چهند پارچه شیعره‌ی که به شیوه‌زاری ههورامی دایناون و نیره‌ج میرزاش له ههندی شوین له کیشی عهرووزی و کورتی و دریزی برگه‌کان لایداوه و ههولیداوه به‌رمه کیشی پهنجه‌یه ههندگاو ههله‌بری.



سهرچاوهکان:

۱. احمد پارسا (۱۳۷۸). «مقایسه سبکی هجوبیات در دیوان خاقانی و متلبی» پژوهشنامهی علوم انسانی، شماره ۵۸.
۲. خاقان عملی (۲۰۱۲). چنینی دوق له شیعره کانی نالیدا، وزارتی روشنبیری، چاپی یهکم، هموانیر.
۳. نیراهیم ئ محمد شوان (۲۰۰۸). «رمز له شیعره کوردیه کانی شیخ رهزا تالباني»، گواری زانکو، ژماره ۳۴.
۴. نیریس عهدوللا (۲۰۱۲). جوانکاری شیعری کلاسیکی کوردی، موکریانی، چاپی یهکم، هموانیر.
۵. \_\_\_\_\_ (۲۰۱۳). شیوازگمری لادان، چاپخانهی وزارتی روشنبیری، چاپی یهکم، هموانیر.
۶. سعد فاروق یوسف (۲۰۱۱). بنياتی هونری له شیعری ئ محمد موختار بهگی جافدا، چاپخانهی وزارتی روشنبیری، چاپی یهکم، هموانیر.
۷. سیروس شمیسا (۱۳۷۹). انواع ادبی، انتشارات فردوس، چاپ هفتم، تهران.
۸. \_\_\_\_\_ (۱۳۷۹). شاهدباری در ادبیات فارسی، انتشارات فردوس، چاپ اول، تهران.
۹. \_\_\_\_\_ (۱۳۸۲). سبک شناسی شعر، انتشارات فردوس، چاپ نهم، تهران.
۱۰. سیما داد (۱۳۷۸) فرنگ اصطلاحات ادبی، انتشارات مروارید، چاپ سوم، تهران.
۱۱. شفیعی کدکنی (۱۳۷۲). مفلس کیمیا فروش، انتشارات سخن، چاپ اول، تهران.
۱۲. صدیق بورمکیی (۱۳۸۰). فرنگ کردی – فارسی، جلد اول، انتشارات پلیکان، چاپ اول، تهران.
۱۳. عزیز گمردی (۱۹۷۲). رهانیتی له ئهدبی کوردیدا، بهرگی یهکم (روونیتی)، چاپخانهی دارالجاحظ، بهگا.
۱۴. \_\_\_\_\_ (۱۹۷۵). رهانیتی له ئهدبی کوردیدا، بهرگی دووم (جوانکاری)، چاپخانهی شامر موانی، چاپی یهکم، هموانیر.
۱۵. \_\_\_\_\_ (۲۰۱۳). کیشناسی کوردی، دهزگای نارین، چاپی یهکم، هموانیر.
۱۶. ماجد مردوخ روحانی (۱۳۸۸). فرنگ فارسی – کردی دانشگاه کردستان، چاپ دانشگاه کردستان، چاپ اول، سندج.
۱۷. مارف خمز نهدار (۲۰۱۰). میزووی ئهدبی کوردی بهرگی چوارم، دهزگای ناراس، چاپی دووم، هموانیر.
۱۸. موحسین ئ محمد گمردی (۲۰۱۳). بهاری رهانیتی، دهزگای نارین، چاپی یهکم، هموانیر.

دیوانهکان:

۱۸. دیوان ایرج میرزا قاجار (۲۵۳۶). باهتمام دکتر محمد جعفر محجوب، نشر اندیشه، چاپ چهارم، تهران.
۱۹. دیوانی شیخ رهزا تالباني (۲۰۰۱). کۆکردنەوە و لىكدانەوە د. موکرەم تالباني، دهزگای ناراس، چاپی یهکم، هموانیر.
۲۰. دیوانی شیخ رهزا تالباني (۲۰۱۰). ئ محمد تاقانه، دهزگای ناراس، چاپی دووم، هموانیر.
۲۱. دیوانی شیخ رهزا تالباني (۲۰۰۰). ساغکردنەوە و شەرھى شوکور مستەفا، دهزگای ناراس، چاپی یهکم، هموانیر.

# TÊVERANAYİŞÊ TIKÊ VATEYÊ VERÊNAN Ê ZAZAKÎ U KURMANCKÎ

## Zazaca ve Kurmancca Bazı Atasözlerinin Karşılaştırılması

## The Comparison of Some Zazaki and Kurmanji Proverbs

Danyal APUHAN<sup>1</sup>

### Kîlmvate

Zîwanê Zazaki u Kurmancki mensubê yew familya yê. Ini zîwani hetê Zazayan u Kurmancan yeni qisekerdiş. Zemanê veri ra hetanê inka Zazayi u Kurmanci hê min yewbinan di cuyeni u qederê yin zaf mewzuyan di wer-tax u. Labelê edebiyato nuşteki di binêk kewti erey. Aye ra, goreyê edebiyat, têveranayışê yin ehend nibiyu. Kar u xebatê Zazayan u Kurmancan heywanan ser biya, ini semed ra hissiyatê xu zafê hew tor motifanê heywanan di dawu. Vateyê Vêrênan ki Zazayan u Kurmancan serê motifanê heywanan di vati-ina meqale di xaseten ma des heb heywanan sera vinderti-ini Vateyi Vêrinan di qayili çi mesaj bîdi, ma iney nayı têvera u badê zi ini zêciyayış u ferqanê yin bin yew sernûste di gureti dest.

**Kelimeyê Mîfteyi:** Zazaki, Kurmancki, Vateyê Verênan, Metaforê Heywanan, Edebiyato Muqayeseyin.

### Özet

Zazaca ve Kurmancca aynı dil ailesine mensuptur. Bu diller Zazalar ve Kurmanclar tarafından konuşulmaktadır. Zaza ve Kurmanclar asırlardır bir arada yaşamışlardır ve kaderleri de birçok noktada ortaktır. Ancak yazılı edebiyata geç başlamışlardır. Bu yüzden edebiyatta karşılaştırmalı çalışma-

<sup>1</sup> Üniversiteyê Bingol, Enstituya Zîwananê Ganiyan, Talebeyê Doktora. (danyal\_12@hotmail.com)

lar pek yapılmamıştır. Bu iki halk hayvancılıkla uğraşmışlar, bu yüzden de hissiyatlarını çok defa hayvan motifleriyle vermişlerdir. Zaza ve Kurmançların hayvan motifleri üzerine söyledikleri atasözleri-bu makalede bilhassa on hayvan üzerinde söyledikleri benzer atasözleri değerlendirilmiştir-bakış açısı ve verdikleri mesaj üzerinden karşılaştırılmıştır. Ardından, benzerlikler ve farklılıklar başlıklar altında değerlendirilmiştir.

**Anahtar Kelimeler:** Zazaca, Kurmancca, Atasözi, Hayvan Metaforu, Karşılaştırmalı Edebiyat

### Abstract

Zazaki and Kurmanji belong to the same language family. These languages are spoken by Zaza and Kurmanj communities. Speakers of these languages lived together for centuries and their fates are common in many ways. The two languages could reach a writing form lately so they have not been compared enough in terms of literature. There are hundreds of proverbs in both languages which try to give a message by using the metaphors of animals. In this article, I will compare the proverbs which give utterance the social dispatches by using animals as metaphors. Then I will compare them with their similarities and differences.

**Key Words:** Zazaki, Kurmanji, Proverbs, Animal Metaphor, Comparative Literature

### 1. Destpêk

Vateyê Verênan ra aye ki derheqê heywanan di ameyi vatis, ma goreyê mewzu u mesaj dayış-wazeni çendêk bîmani yewbinan, çendêk yewbinan ra ciya bi-vateyê vêrinan ê Zazaki u Kurmanci ra misalan dani u serê inan di vindeni. Ma zani ki xelqi ki kultur, edet u cuyayışê inan maneno yewbinan, zaf mewzuyan di wertax ê. Ma bion vateyê verênan ê Zazayan u Kurmancan ma vineni ki zafê yin wertax ê. Ma tor misalun verê çiman ra keni ra.

Burçın Asna, Zazayan u Kurmancan di heywanan sera çi semed ehend zaf vateyê verênan esti ini qedî bestenu pa: Zazayan u Kurmancan cuyayışê xu di tebiet di heşir-neşir biyi; o semed komelkiyê xu u halê hissiyatê xu misalanê heywanan sera dawu.<sup>2</sup>

Vateyê Verênan qey vaciyayış, nuşte, ziwan usi. zaf muhim i. Roşan Lezgin vano ki; qiseykerdiş, yan zi nuştişê ke idiom û vateyê verênan tede çin bê, yan zi tay bê, hetê ziwanxebitnayış ra zêde tahm tede çin o.<sup>3</sup> Çiko bê tahm, çendêk weşê merdiman şino? Ziwan vano ki tedi vateyê verênan esti qey yini Roşan Lezgin vano:

2 Burçın Asna, "Bingöl'de Zazaca Atasözlerinin Tahlili", *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü*, Bingöl 2014 (Tezî Lisansa Berzi), r. 96.

3 Roşan Lezgin, *Ferhenge İdyomanê Kurdkî (Kirmancı/Zazakî)*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2005, r. 5.

Ziwano ke bî idyoman û vateyê verênan reyde biyo xebitnayış, boyâ şîri tira yena û pirestijê xo hina berztir beno.<sup>4</sup> Aye ra benateyê misrayan di, benateyê galan di vateyê verênan yeni şuxulnayış ki wa tesiri yin binena zaf bo.

Vateyê verinan çi qedî biyi, kumyo merhaleyen ra viyerti, derheqê iney di Roşan Lezgin vano: Vateyê verênan; efsaneyen, fiqrayan, hikayeyan, meseleyan û sanikan ra, yan zi qewimiyayısanê tarixi, siyasi, dini û cematkîyan ê miletêk ra, yani bikilmiye heme heten ra ciwiyayış, ceribnayış û serguzeşte şexsan û milleti ra; tecrubeyanê inan ra; têkiliya miyanê merdîman û tebieti ra viraziyayê.<sup>5</sup> Seid Veroj ina vano: Vateyê verênan, tarixi miyan di, yew wexto derg di tecrube, şiretê bapiran, hiş û qabilyetê wertaxiyê yew millet ra peyda benê, neslyenê, parzûn benê û yenê hetani rojo ewroyê. Vateyê verenandê ma, şêlikî miyan di û yew zemano derg di, hiş û tecrubeyê pir û pîrbavandê ma ra zayî û ay rojgar ra heta ewro ameyê resayı ma. Wexto ke bahsê vateyê verênan beno, verê heme çi persê tarixê peydabiyayışê ênan yeno kê viri.<sup>6</sup>

Hasan Çiftçi vano ki, zemanê veri ra hetani inka, nuştoxan qey vatisi meqse-di xwu motifi heywanan ra istifade kerdu.<sup>7</sup> Aye xelqi ki cawo serd di cuyeni, tor zaf ziret u heywantiyi keni. Zazayan u Kurmancan idareyê xwu pê inan kerdu. Aye ra edebiyato fekki di derheqê heywanan di zaf vateyi vîrinan şuxuliyayı.

## 2. Kurmancki di Vateyê Verênan

Vateyê verinan, Edebiyatê Kurmancki ya nuşteki di cayê xu pê nameyê “*gotinêñ peşîyan*” geno. Labele benateyê xelq di yew çend tewiri vatisê vateyê verênan esti. Çıqas pê ini vatisan vateyê verênan qest bibi zi wext ra wext çekuya ki herindê vateyê verinan di şuxuliyawa heme merdîmi menayê yê nêzani. Aye ra Edebiyato nuşteki di semedê vateyê verênan çekuyê “*gotinêñ peşîyan*” şuxuliyenu, gerek hemeyê merdîman menayê yi bizani. Ini, çi qedî Tîrki di çekuyê “özdeyiş, darb-1 mesel u durub-1 emsal” herindê vateyê verênan di şuxuliyeni, Kurmancki di zi ‘eyni wo. Tîrki di wextuna ki ti vajî “atasözü” piyorê merdîman zani ti hê vani se; labelê ti çekuyê “özdeyiş u darb-1 mesel u durub-1 emsal” bışuxulni heme merdîmi nêzani ti hê vani se. ‘Eyni sey ini, Kurmancki di çekuyê “*gotinêñ mezinan, peyvîñ peşîyan, gotinêñ bav û kalan, metelokêñ kurdi, pendêñ kurdi*”<sup>8</sup> ti bışuxulni heme merdîmi nêzani ti hê çinê quesid keni. Ini çekuyi kumaya bolgeyan di bışuxulyi merdîmi aye bolge zani. Heme merdîmi ini piyorê çekuyan bizani zaf benu hol u ki ma yew dewlemendi qebul bena.

4 È. e., r. 5.

5 È. e., r. 6.

6 <http://www.kovarabir.com/2012/10/seid-veroj-vateye-verenan-ye-dimilizazaki/> Resayı: 26 Mart 2016.

7 Hasan Çiftçi, *Klasik Fars Edebiyatında Hiciv ve Sosyal Eleştiri*, Kültür Bakanlığı Yayınları/2842, Ankara 2002, r. 50

8 Amed Tigris, *6762 Gotinêñ Peşîyan*, Weşanêñ Rewşen, Stockholm 2001 r. 4.

### 3. Zazaki dî Vateyê Verênan

Vateyê verênan, Edebiyatê Zazaki yo nuşteki di cayê xu pê nameyê “vateyê verênan” geno. Labelê benateyê xelq di yew çend tewirê vatisê vateyi verinan esto. Pê ini çekuyan piyorê vateyi verinan qest beni u heqiqeten ina yew dewlemendi yena qebulkerdiş. Tikê cayan di herindê vateyê verênan di çekuyi “qiseyi pilun, qali pilun, vatisi verinun, qiseyi qedim, qali pirikun ma” şuxulişen. Heme Zazayı bızani ini çekuyi piyor qê “vateyê verênan” şuxulişen zaf benu hol u ina zi yew dewlemendi qebul bena.

Sey ziwanan binan, pê tay çekuyan zaf ci yenu vatis. Hususiyeti vateyê verinan ini yi ki, xelq oniyena hediseyanê tebieti ra u tira yew netice vecena, oniyena cuyaşışı ra yew neticeya umumi tira vecena. Şar, Edebiyato fekki di semedê zêdinayışê tesirê qalan vateyê verinan ra haviley vinenu u vateyi vêrinan Edebiyato nuşteki di zi tewiran ciyayan di şuxulişen u tesiri yin beno zêd. Wext ra wext şiiaran di miyan misrayan di şuxulişen, şiiri binêna keni tesirin, rey rey zi ay merdimi ki, cimani xelq di qisevano hol yeni zanayış ini merdimi goreyê ca u wext benateyê qalanê xu di vateyi verênan şuxulneni u tesirê qalun xu binêna zêdineni.

### 4. Derheqê Heywanan dî Vateyê Verênan u Menayê Yîn o Tîrki

	<b>Vateyê Verênanê Kurmancki/ Menayê yî wo Tîrki</b>	<b>Vateyê Verênanê Zazaki/ Menayê yî wo Tîrki</b>
4.1. Kutik	<p>4.1.1. Behr bi devê kuçikan ve heram nabe. (Bolelli, r. 43) / İt ağızyla deniz haram (murdar) olmaz. (Albayrak, r. 567)</p> <p>4.1.2. Se, goştê se naxwe. (Bolelli, r. 123) / İt itin etini yemez. (Albayrak, r. 569)</p> <p>4.1.3. Kûçik xwediyyê xwe nas dike. (Bolelli, r. 92) / İt sahibini tanır. (Albayrak, r. 571)</p> <p>4.1.4. Behsa kûçik bike lê dar bigire destê xwe. (Tigris, r. 22/296) / İti an, çomağı hazırla. (Albayrak, r. 572)</p>	<p>4.1.1. Derya fekdê kûtikî reyde heram nêbena. (Veroj, kovarabir. com) / İt ağızyla deniz haram (murdar) olmaz. (Albayrak, r. 567)</p> <p>4.1.2. Kutik çirrê gueşt kutik niwen. (Asna, r. 96) / İt itin etini yemez. (Albayrak, r. 569)</p> <p>4.1.3. Kutik wehar xwu şinasnên. (Bukan, r. 45) / İt sahibini tanır. (Albayrak, r. 571)</p> <p>4.1.4. Qalê kutiki bık u çuwe xwu bigger xwu dest. / İti an, çomağı hazırla. (Albayrak, r. 572)</p>

4.2. Cina- wir	<p>4.2.1. Qala gur ke, dar hezir ke. (Bolelli, r. 115) / İti an, çomağı hazırla. (Albayrak, r. 572)</p> <p>4.2.2. Roja duman be kêfa guran e. (Bolelli, r. 120) / Kurt, dumanlı havayı sever. (Albayrak, r. 680)</p>	<p>4.2.1. Qalê kutiki bık u çuve xwu biger xwu dest./ İti an, çomağı hazırla. (Albayrak, r. 572)</p> <p>4.2.2. Cınawir, roj mijin pawen. (Asna, r. 110)/ Kurt, dumanlı havayı sever. (Albayrak, r. 680)</p>
4.3. Ga	<p>4.3.1. Ga dimire kêr lê pir dibin. (Bolelli, r. 71) / Öküz yere düşünce kasaplar çoğalır. (Albayrak, r. 744)</p> <p>4.3.2. Ga dimire çerm dimîne, mîr dimire nav dimîne. (Bolelli, r. 71) / Öküz ölüür, günü kalır; yiğit ölüür, ünû (şanı) kalır. (Albayrak, r. 744)</p> <p>4.3.3. Yê te ne zik e, afira ga ye. (Tigrîs, r. 260/6464) / Seninki mide değil, öküz yemliğidir.</p> <p>4.3.4. Cot bi gaye pîr nabe. (Tigrîs, r. 44/891) / Çift, yaşlı öküzle sürülmmez.</p>	<p>4.3.1. Ga ke kewt, kardi zaf benê. (Veroj, kovarabir.com) / Öküz yere düşünce kasaplar çoğalır. (Albayrak, r. 744)</p> <p>4.3.2. Ga miren ped cerme yi munen, merdim miren ped nume yi munen. (Bukan, r. 31) / Öküz ölüür, günü kalır; yiğit ölüür, ünû (şanı) kalır. (Albayrak, r. 744)</p> <p>4.3.3. Me'dî niyu ce'dî wo./İştah değil, yoldur.</p> <p>4.3.4. Pê yo gay cit nêbena. (Asna, r. 112) / Yalnız el şaklamaz. (Albayrak, r. 870)</p>
4.4. Mase	4.4.1. Masî di deryayê de bazar nabe. (Tigrîs, r. 170/4168) / Denizde balığın pazarlığı olmaz. (Albayrak, r. 339)	4.4.1. Mase, gole de bazar nêbeno. (Veroj, kovarabir.com) / Denizde balığın pazarlığı olmaz. (Albayrak, r. 339)
4.5. Dik	4.5.1. Her dîk li ser sergoyê xwe bang dide. (Bolelli, r. 77) / Her horoz kendi çöplüğünde (külliğinde) eşinir (öter). (Albayrak, r. 517)	4.5.1. Her dîk sillodê xo sero waneno. (Veroj, kovarabir.com) / Her horoz kendi çöplüğünde (külliğinde) eşinir (öter). (Albayrak, r. 517)

4.6. Mirçik	<p>4.6.1. Hêlîna tayrê kor jî Xwedê çê dike. (Bolelli, r. 77) / Kör kuşun yuvasını Allah yapar. (Albayrak, r. 667)</p> <p>4.6.2. Her teyr bi refê xwe re difire. (Bolelli, r. 77) / Her kuş kendi sürüsünde uçar. (Albayrak, r. 519)</p> <p>4.6.3. Qirika reş nabe bilbil. (Bolelli, r. 115) / Karga bağda gezmekle bülbül olmaz. (Albayrak, r. 599)</p>	<p>4.6.1. Xelim kerga kuar Huma virazen. (Bukan, r. 86) / Kör kuşun yuvasını Allah yapar. (Albayrak, r. 667)</p> <p>4.6.2. Her teyr refdê xo reyde fireno. (Veroj, kovarabir.com) / Her kuş kendi sürüsünde uçar. (Albayrak, r. 519)</p> <p>4.6.3. Qela bilbil nibena. (Bukan, r. 64) / Karga bağda gezmekle bülbül olmaz. (Albayrak, r. 599)</p>
4.7. Mar	4.7.1. Çêlikê maran bê jar nabin. (Bolelli, r. 51) / Yılan yavrusu zehirsiz olmaz. (Albayrak, s. 892)	4.7.1. Lirê marrî bê jahr nêbeno. (Veroj, kovarabir.com) / Yılan yavrusu zehirsiz olmaz. (Albayrak, r. 892)
4.8. Bız	<p>4.8.1. Ecelê bizinê tê, (diçe) nanê şivan dixwe. (Bolelli, r. 59) / Eceli gelen keçi, çobanın degneğini yalar.(ekmeğini yer) (Albayrak, r. 385)</p> <p>4.8.2. Heqê bizina qol ji bizina qiloç re namîne. (Tigrîs, r. 105/2466) /Topal keçinin hakkı sağlam keçide kalmaz.</p>	<p>4.8.1. Ecelê biz yeno nanê şiwani wena. (Veroj, kovarabir. com) / Eceli gelen keçi, çobanın degneğini yalar.(ekmeğini yer) (Albayrak, r. 385)</p> <p>4.8.2. Heq biza quel biza estirinid geren. (Bukan, r. 35) / Topal keçinin hakkı sağlam keçiden istenir.</p>
4.9. Heş	4.9.1. Sêva çê para hirçê. (Bolelli, r. 123) / Armudun iyisini dağda ayılar yer. (Albayrak, r. 170) Güzel elma ayının payıdır.	4.9.1. Saya weş barê hxeş. (Bukan, r. 69) /Armudun iyisini dağda ayılar yer. (Albayrak, s. 170) Güzel elma ayının payıdır.
4.10. Her	4.10.1. Cehşik mezin be jî, disa ker e. (Bolelli, s. 47)/Sipa büyüse de yine eşektir.	4.10.1. Her tim hero./ Eşege altın semer vurulsa, yine eşektir. (A.g.e. r. 431)

Tablo-1: Serê des hebi heywanan di Zazaki u Kurmancki vateyê verênan

## **Menayê Vateyê Verênan**

### **4.1. Kutık**

4.1.1. Merdimo xirab ğar biker merdiman pilan, şerefê merdimani pilan ra tayê kêm nêbenu, yi hunci zi merdimi pil i. Yani merdîm, pê vatışê feki xirab nibenu.

4.1.2. Merdimo xirab zirar merdimi xirab nêdanu.

4.1.3. Merdîm çiqas xirab benu wa bîbo, eg holiyê yewi diya, yi şinasnenu u zirar ci nedanu.

4.1.4. Merdimo ki xirab o u xirabiyê yi rasena merdiman, gerekma ma xirabiyê yi vera xu mehfezi biker.

### **4.2. Cinawîr**

4.2.1. Merdimo ki xirab o u xirabiyê yi rasena merdiman, gerekma ma xirabiyê yi vera xu muhafaza biker.

4.2.2. Merdimo ki firset pawenu, rocan têmundayon ra hes kenu.

### **4.3. Ga**

4.3.1. Ba'di firset, herkes yew fikir erzenu wertî; labele hini çi biyu biyu şiyu.

4.3.2. Merdîm çi qedî bicuyo, ba'di mergê xu ina dinya di o qêdi çek verde-nu.

4.3.3. Merdîmi ki me'dê yin hera wo semedê yin şuxuliyena.

4.3.4. Kam ki munasibê kumayo gureyi wo, o gure ançax pê yi beno.

### **4.4. Masê**

4.4.1. Tikê merdîmi xebat nêkeni, pê xeyalan hereket keni. Çîko ki dest nikewt qiyemet yi belu nêbenu.

### **4.5. Dik**

4.5.1. Herkes cayê xu di weharê soz o, uca di qali yi pere keni.

### **4.6. Mirçik**

4.6.1. Ina dinya di çoy bêwehar niyu.

4.6.2. Merdîm kami ra hes bikero tor yi wa hereket keno.

4.6.3. Çîko ki ırsi wo ti nêşkeni bîbedîlni.

### **4.7. Mar**

4.7.1. Lajê merdmê xirabi bê xirabi nêbeno.

### **4.8. Bîz**

4.8.1. Merdimo ki çîko xirab yenu yi sare, biyayıço tor çîyo xirab wu xu ver kenu hezir.

4.8.2. Heqi çoyi, çoy di nêmaneno.

### **4.9. Hes**

4.9.1. O ki çîko hol heq nêkenu barê yi kuwena.

#### 4.10. Her

4.10.1. Eg cîsnê merdîmi dî herkuni bîbu, wî biyero kumyo meqam wî hunê eyni wo.

#### 5. a. Awani Cumle

Fi‘il	Heram nabe, naxwe, nas dike, bike, bigire, hezir ke, ke (2), pir dibin, dimine (2), bazaar nabe, bang dide, çê dike, difir, nabe (2), dixwe, namine.	Heram nêbena, nêweno, şinasnê, bik, destkî (2), benê zaf, miren (2) bazar nêbeno, waneno, virazen, fireno, nêben (2), wena, yen waştış, pawen, bigger, geriyen, munen (2), yeno.
Zemir	Xwe (4), Yê te.	Xwu (6), yı (2).
Edat	Bi (3).	Pê
Name	Behr, derya, devê, kuçikan (4), se (2), goşt, ga (4) roj, behs, dar (2), dest, qal, gur (2), kêr, çerm, mîr, nav, masî, dik, sergo, helin, tayr (2), Xweda, ref, qirik, bilbil, mar, çelik, nan, şivan, biz (2), ecel, heq, sêv, par, hırç, cot, zık, afir, kêf.	Derya, fek, kutik (6), rey, goşt, qal (2), çuwa (2), ga (3), kard, çerme, merdim, nume, mase, aw, dik, silo, helim, kerg, Allah, teyr, reft, rey, qela, bilbil, lir, mar, ecel, biz (3), nan, şunı, heq, sa, barê, heş, cinawir, me‘de, ce‘de, gole, bar, wehar, ped (2).
Sifet	Xwedi, roja duman, , her teyr, her dik, pir, çê, ser, kor, reş, qol, qiloç.	Wehar, ser, kuar, her, quel, weş, sax, roj mijin, yo, her teyr, her dik, esterin.
Zerf	Dimire (3) bêjar, tê (diçe).	Ke kewt, bêjehr, çirrê.

Tablo-2: Têveranayışê awani cumle

#### 5.b. Tehlili Tablo-2:

##### Kurmancki:

Fi‘il: Cumleyan dî 20 hebi fiili şuxuliyayı, inan ra 6 hebi fi‘il piyabeste yê, 14 hebi ê sade yê.

Zemir: 5 hebi zemiri şuxuliyayı.

Edat: 3 hebi edati şuxuliyayı.

Name: 51 hebi nameyi şuxuliyayı.

Sifet: 10 hebi sifeti şuxuliyayı.

Zerf: 5 hebi zerfi şuxuliyayı.

##### Zazaki:

Fi‘il: Cumleyan dî 23 hebi fi‘ili şuxuliyayı, inan ra 3 hebi fi‘ili piyabeste yê, 20 hebi ê sade yê.

Zemir: 8 hebi zemiri şuxuliyayı.

Edat: 1 Edat şuxuliyawo.  
 Name: 54 hebi nameyi şuxuliyayi.  
 Sifet: 7 hebi sifeti şuxuliyayi.  
 Zerf: 3 hebi zerfi şuxuliyayi.

## 6. Hetê Awani ya Teveri ra Yew Oniyayış

### 6.1. Goreyê Ziwan:

**Kurmancki:** Goreyê familyayê ziwanan, Kurmancki, mensubê familyayê Hint-Awrupa, gileyê Hint-Îran a. Edebiyato nuşteki dî zaf verên niya; labelê Edebiyato fekki dî zaf verên u quwetin a. Kurmancki dî vistuniki, şıiri, qesideyi wextuna ki ameyi nuştiş, dewlemendiyê ziwanê Kurmanci kewtu werti. Kurmanci dî gelêk vateyê verênan esti.

**Zazaki:** Goreyê familyayê ziwanan, Zazaki, mensubê familyayê Hint-Awrupa, gileyê Hint-Îran a. Edebiyato nuşteki dî Zazaki hema newi ya; labelê Edebiyato fekki dî zaf verên u quwetin a. Xasseten Zazaki dî vistuniki, şıiri, qesideyi wextuna ki ameyi nuştiş, dewlemendiyê ziwanê Zazaki kewtu werti. Zazaki dî gelêk vateyê verênan esti; labelê hema piyeri nêarêdiyayi.

**Wertaxiyi:** Goreyê familyayê ziwanan, wîrdi heme ziwanî zi mensubê familyayê Hint-Awrupa, gileyê Hint-Îran ê. Wîrdi heme ziwanî zi binê tesirê Fariski dî mendi.

**Zêciyayış:** Wîrdi heme ziwanî zi Edebiyato nuşteki dî zaf verên niyi, edebiyato fekki dî quwetin ê. Wîrdi heme ziwanan dî zi vistuniki zaf ê, şıiri u qesideyi dî dewlemendiyê yin kewta werti. Vateyê verênan, dî hemi ziwanan di zi zêd ê.

**Ferqini:** Kurmancki, edebiyato nuşteki dî goreyê Zazaki binêna verên a. Vateyê verênani Kurmancki binena zêd ameye pêser.

### 6.2. Xususiyetê Kulturi

Kurmanc: Kurmanci, Toros ra hetani Zagros cuyeni. 22 devletan dî cuyayışê xu dewam keni. Dewlemend yew xelq niyi, yew xelqa feqir a. Miyon tesirê kulturê Rojxelati werti dî mendi. Edebiyato nuşteki dî şıira ewil “*Bî Hevre*” hetê Borazboz ra ameya nuştiş. Ina şıir kerrayê mezelê ciniyê xu dî nuşta. Arkeologani İngilizan serrê 1950 dî şehrê İran Hewreman dî eşta werti.<sup>9</sup> Hikayewa ewil a Kurmancki, Cemil Saib bî nameyê “Le Xewma (Rüyamda) nuşta. Diwanê Kurmancki yo ewil, Diwanê Melayê Cezeri wa.<sup>10</sup> Romanê Kurmancki ya ewil Şivanê Kurmanca (Erebê Şemo) ya.

**Zazayı:** 15-16 hebi dewletan dî cuyeni. Şarê Zazayan feqir u. Miyon tesirê kulturê Rojxelata Miyanin dî mendi. Zazaki sera xebata ewil Textsler a (1857), Peter Lerch ina xebat kerda.

<sup>9</sup> [www.nucehaber.com/haber/wje/ewil-helbesta-kurd-ilk-kürtçe-şıir/](http://www.nucehaber.com/haber/wje/ewil-helbesta-kurd-ilk-kürtçe-şıir/) Resayış: 21/06/2016.

<sup>10</sup> Bolelli.org., “*Bazı Kürtçe Eserlerin Tanıtımı*”, Resayış: 21/06/2016.

Ba'di ina xebat, Ehmedê Xasî "Mewludê Kurdi" (1899) nuşto u ba'di ini Osman Efendiyo Babîj "Mewluda Nebî" (1933) nuşto.<sup>11</sup>

Wertaxiyi: Zafeyê dewletan di biyi vila, uca di cuyenî.

Zeciyayışi: Wîrdi helqi zi feqir ê.

Ferqini: Kurmancki edebiyato nuşteki di goreyê Zazaki zaf verên a. Eseri Kurmancı goreyê Zazaki zaf ê.

### 6.3. Xususiyeti Dini u Fikri

**Kurmancı:** Eğlebê Kurmancan Bîsilman i, Sunni, Alewi u Îzidi yi. Eğlebê yin Tîrkiya di cuyenî. Tîrkiya di 15 milyon merdîmi Kurmancki qise keni. Eger ma piyorê memleketan daxil bîker, 20 milyon ra zêd merdîmi Kurmancki qise keni.<sup>12</sup>

**Zazayi:** Eğlebê Zazayan Bîsilman i, Sunni, Alewi, Qızılbaş ê. Dunya di piyorê piya nîzdiyê 6 milyon merdîmi Zazaki qise keni. (Inî umarname texmini wo).<sup>13</sup>

Wertaxiyi: Hem Zazayi, hem zi Kurmancı, zafê yin Bîsilman ê, Sunni u Alewi yê.

Zeciyayışi: Eğlebê Zazayan u Kurmancan Tîrkiya di cuyenî.

Ferqini: 6 milyon merdîmi Zazaki qise keni, 20 milyon merdîmi Kurmancki qise keni.

### PEYNİ

Zazaki u Kurmancki di vateyê verênan ki wertax i ma aye nayî têver u ma ina di: Şari ki têmiyan di cuyenî vateyê vêrinan yin zaf maneni yewbinan. Zeciyayışê vateyê vêrinan ê Zazaki u Kurmancki zêd ê zê ferqanê yin (bionên, tablo-1). Awanê cumleyanê Zazaki u Kurmancki zaf maneni yewbinan (bionên, tablo-2). Zazaki u Kurmancki di nameyi vateyê verênan zêd ê; la yewbinan ra ferqin ê.

Ma eşkeni eney vaju ki; edebiyato muqayeseyin di derheqê xelqan di zanayışê ma beno zêd. Kumayo xelq miyon tesirê kumayo xelq di menda, kumca di cuyenâ yew fikir dana ma. Yew zi benateyê inî xelqan di yew muhabbetto gird estu.

Aye xelqi ki idareyê xwu pê heywaneti keni, miyon yin derheqê heywanan di vateyê vêrinan zaf şuxuliyayı. Heme vateyê vêrinan zerreyê yew xebat di dest guretiş zaf benu hol; labelê binek zehmet o. Ma ina meqale di ser 10 heb heywanan di vinderti, serê aye heywanan binan di yew xebat biyeru viraştîş benu hol.

11 Derheqê inî mewzuyan di bionên, Varol, Murat, "Zazaca Yazılan Eserlere Dair Bir Bibliyografiya (1899-2014)", *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, Yıl:1, Cilt:1, Sayı:1, Ocak 2015, r. 39-54.

12 Kerimoğlu, Caner, *Genel Dilbilime Giriş*, Pegem Akademi, 3.baskı, Ankara, Ocak 2016, r. 371-372.

13 Kerimoğlu, ê.e., r. 369.

## ÇIMEYİ

- Albayrak, Nurettin, *Türkiye Türkçesinde Atasözleri*, Kapı Yayıncıları, İstanbul 2009.
- Asna, Burçin, “Bingöl’de Zazaca Atasözlerinin Tahlili”, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü*, Bingöl 2014. (Tezé Lisansa Berz).
- Bolelli, Nusrettin, *Kürtçe Alfabe*, Bingöl Üniversitesi Yayıncıları, Bingöl 2015.
- Bukan, İbrahim, *Zazakî- Qalê Vêrinu o Qala Rêber; Zazaca-Atasözleri ve Özlu Sözler*, Fam Yayıncıları, İstanbul 2015.
- Çağlayan, Ercan, *Zazalar Tarih Kültür ve Kimlik*, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayıncıları, İstanbul, 2016.
- Çiftçi, Hasan, *Klasik Fars Edebiyatında Hiciv ve Sosyal Eleştiri*, Kültür Bakanlığı Yayıncıları, Ankara, 2002.
- Çiftçi, Hasan, “*Ortak Atasözlerinin Hikâyeleri: Farisi-Kurmancî-Zazakî I*”. Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, Serr:2, Cilt:2, Umar:3, Mayıs, 2016.
- Karabulut, Serdar, *Zazalar Tarihi Kültürel ve Sosyal Yapı*, Altın Kalem Yayıncıları, İzmir, 2013.
- Kerimoğlu, Caner, *Genel Dilbilime Giriş*, Pegem Akademi, 3.baskı, Ankara, 2016.
- Kırıkkale Üniversitesi Karşılaştırmalı Edebiyat Bilimi Kongresi, “*Kültürler ve Değerler Buluşması*” Bildiriler Kitabı, Kırıkkale, 2013.
- Lezgin, Roşan, *Ferhenge İdyomanê Kurdkî (Kirmanckî/Zazakî) Weşanxaneyê Vateyî*, İstanbul, 2005.
- Selcan, Zilfi, *Qese u Qesê Virênu – Leksikon [Deyim ve Atasözleri Sözlüğü (Zazaca)]*, Dêrsim, 2013.
- Tigrîs, Amed, *6762 Gotinê Peşîyan*, Weşanên Rewşen, Stockholm, 2001.
- Varol, Murat, “*Zazaca Yazılan Eserlere Dair Bir Bibliyografya (1899-2014)*”, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, Yıl:1, Cilt:1, Sayı:1, Ocak, 2015.

## SİTEYİ INTERNET

- [www.kovarabir.com/2012/10/seid-veroj-vateye-verenan-ye-dimilizazaki/26/03/2016](http://www.kovarabir.com/2012/10/seid-veroj-vateye-verenan-ye-dimilizazaki/26/03/2016).
- [www.nucehaber.com/haber/wje/ewil-helbesta-kurd-ilk-kürtçe-şiir-/21/06/2016](http://www.nucehaber.com/haber/wje/ewil-helbesta-kurd-ilk-kürtçe-şiir-/21/06/2016).
- [www.bolelli.org.](http://www.bolelli.org.) “Bazı Kürtçe Eserlerin tanıtımı”, 21/06/2016]

# ALFABEYA KURDÎ YA HERÎ KEVN

**Amadekar: Muaz Yakup/Muhammed Ronî EL-MERANÎ<sup>1</sup>**

**Wergera ji 'Erebî: Haşim ÖZDAŞ<sup>2</sup>**

Beriya bîst salan li bajarê Şamê, li dibistana navîn di pirtûka “Dîroka ‘Ebasîyan” ya ku ji bo pola duyem a navîn hatibû amadekirin de derbasdibû ku “Dewleta ‘Ebasîyan, ji çend miletan pêk tê; mîna Faris, Tirk û Kurdan.” Di meteryalên metodên perwerdehiyê de, ji wê gavê û heta niha gotina ku ji destê kontrolê filitîbe û işaret bi bal Kurdan ve kiribe, hema ci bigire ev gotin tenê ye.

Xwendekarekî, ji mamestekeye me yê kal pirsî: “Kurd kî ne?” Mamoste wiha bersiv da: “Ew ji gelên musulman ên cîranê ‘Ereban e...” û bi vî awayî pirs li pey hev bûn rêz. Pirsa yekî ji xwendekaran wiha bû: “Gelo alfabekeyeke gelê Kurd heye ku bikaribin pê binivîsin?” Mamoste bersiva wî wiha da: “Zimanê Kurdî zimanekî devkî ye û heta niha nehatiye nivîsandin! Lê belê nijadperestên Kurd, dixwazin alfabekeyekê jê re îcad bikin.” Piştre ji bo bersivekê berê xwe da min -lewra min, carinan di derheqê Kurdan de li gorî zanebûna xwe ya mutewazî, pê re nîqaş dikirin- min jê re got ku: “Kurdan berê bi alfabeaya ‘Erebî dinivîsandin, lê niha bi Latînî dinivîsin.”

Dema ez vegeiyam malê û min di derbarê alfabeaya Kurdî de ji bavê xwe ku bavê min alimekî dînî bû û pirtûkxanyeke wî ya berfireh hebû pirsî; got: Berê, alfabekeyeke Kurdan a taybet hebû, lê belê wekî pirê gelên ku musulman bûne wan jî di lehê alfabeaya ‘Erebî de dev ji alfabeaya xwe berdane. Min ev keşfa herî xweş li dibistanê ji mameste xwe re got. Lê belê mamoste, bi tebesumeke tinazî, şeqamek li paşıya stûyê min da û wiha got: “Heta tu çavkanîyê nîşanî min nedî, ev doz û angaşa te, dê wekî iftîra bimîne.”

1 muazyagup@hotmail.com

2 Zanîngeha Yüzüncü Yılê Fakulteya Îlahiyatê Beşa Tefsirê (hasimozdas@gmail.com) Hin tişt ji aliyê wergêr ve hatine zêdekirin û bi “nîşeya wergêr” hatiye destnîşankirin. Wekî din hemî fikir û raman ên nîvîskar bi xwe ne.

Di pirtûkêن derbarê Kurdan de, min dest bi lêkolînê kir û pirtûka “Kurdîstan we'l-Ekrad” (ya nivîskarekî bi navê ملاع. كردي “كurdستان والكراد” Mele 'E. Kurdî, ji weşanên Rabita Kawa derketiye), gihişt hawara min. Lê belê di wê pirtûkê de jî û bêyî ku tu çavkaniyan nîşan bide, ji tiştê ku bavê min gotibû tiştekî zêdetir nedihat gotin: “Beriya İslâmê alfabeyeke wan hebû û di lehê alfabeya ‘Erebî de dev ji alfabeya xwe berdane.” Min gera xwe ya li çavkaniyê berdewam kir da ku ez bikaribim rastiya xwe ji mamesteyê xwe re îsbat bikim. Heta ku min ew çavkanî beriya çend salan bi dest xist û niha jî ez wê diweşînim.

Di dema xwendina xwe ya bilind de, ji çavkaniyê ku min serî li wan di-dan, di pirtûka Îlyan Serkîs “إليان سركيس” ya bi navê “Mu'cemu'l-Metbû'at el-'Erebiyye” (معجم المطبوعات العربية) di danasîn/tercema Îbn Wehşîyye de min dît ku, di dawiya pirtûka wî ya “Şewqu'l-Musteham fi Me'rifeti Rumûzi'l-Eqlam” (شوق المستهام في معرفة رموز الأقلام) de dibêje; ji nav gelek pirtûkênu ku wî wergerandine, du pirtûkêndi Kurdî jî hene.

Min dizanibû ku pirtûka “Şewqu'l-Musteham” berî du sed salan li Ewpûpayê hatiye çapkîrin û temenê destnivîsê zêdetirî hezar salî ye. Gera min a li pirtûkê bê navber dewam kir. Bi piranî ez difikirîm ku di pirtûkê de, dê behsa çend nav û sernavêni ji pirtûkêndi Kurdî ên kevn were kirin û min tu hêvî nedikir ku ez ê alfabeya Kurdî ya orjinal tê de bibînim. Lê belê min dît!

Di sala 2003an de, dema min li navendeke destnivîsan ya taybet midurtî dikir, ji bo ku ez nusxeyek ji pirtûkê çapkîri yan jî nusxeyeke ji destnivîsê bi dest bixim, min ji gelek kesan re nivîsand. Heta peywirdarekî ji min re got ku mameste Îyad Xalid et-Tebba’ (إياد خالد الطباع) li pirtûkxaneya Medreseyâ Sîpehsalar li Îranê di sala 1999an de<sup>3</sup> bi tesadufî nusxeyek ji destnivîsê keşf kiriye -lê rast hatiye- û pirtûk ji aliyê weşanxaneya Daru'l-Fikir ve ji bo çapkîrinê tê amadekirin. Beriya ku ez xwe bigihînim mameste Îyad Xalid et-Tebba’, peywirdar pirtûka çapkîri ji min re anî û ji min re got: Ez dizanim bê ka tu çîma li vê pirtûkê digerî! Lewra tê de behsa herfîn-tîpên nivîsa- Kurdî yên kevn tê kirin! Li vir, mîzgîniya ku ez li hêviya wê bûm gihaşt min û lêkolînê berfireh û dirêj ku ez ê bi wan ji xewê hişyar bibim dest pê kirin. Birastî jî di pirtûkê de behsa alfabeya Kurdî bi awayekî tam û zelal dihat kirin. Ya herî xweşîr jî ku li hemberî pîrî herfîn -tîpên- Kurdî, ‘Erebîya wan jî hebûn!

## ÎBN WEHŞİYYE Û GIRÎNGIYA PIRTÛKA WÎ

### Îbn Wehşîyye

Navê wî, Ebû Bekir Ehmedê kurê ‘Elîyê kurê Qeysê kurê el-Muxtarê kurê ‘Ebdulkerîmê kurê Hersîya<sup>4</sup> ye, bêhtir bi Îbn Wehşîyye (ابن وحشیة) navdar e, bi

3 Îyad Xalid et-Tebba’, di pêşgotina çapa berhema Îbn Wehşîyye de dibêje ku min ew di sala 1998an li Tehranê dîtiye. Muhtemel e ku xwedîyê gotarê bêhemdî, mîjûya “1999” nivîsandibe. Bnr. Îyad Xalid et-Tebba’, *Menhecu tahqîqi'l-maxtütat we meahu kitabu Şewqu'l-Musteham fi Me'rifeti Rumûzi'l-Eqlam*, çapa 1., Daru'l-Fikir, Dimeşq 2003, rp. 126. (Nîseya wergêr)

4 Di hin çapêن “Fîhrîst”ê de “Cersiya” derbas dibe. Bnr. Ebu'l-Ferec Muhemed b. Ebî Yaqub İshak

es-Sofî (الصوفي) jî tê wesifkirin<sup>5</sup> ji gelê Keldan e, ‘alimê kîmyayê û wekî din e, sala ji dayikbûna wî nayê zanîn, tê tercîhkîrin ku ew di dawiya sedsala sêyem a hicrî- dehemâ mîlâtî de, wefat kirîye. Ji telîf û wergerên wî ên din: “Xayetu'l-Emel fi 'Ulûmi'r-Riyade, el-Fewaid el-'Îşrûn fi'l-Kîmyâ, el-Îşarat fi's-Sîhrî, el-Esnam, el-Heyat we'l-Mewtû fi 'Îlacî'l-Emrad, Kîtabu't-Tebî'a, Kîtabû'l-Felahe” -ji Keldanî wergerandiye- û pirtûka “Îflahu'l-Kerem we'n-Nexil”, ji Kurdî wergerandiye.<sup>6</sup>

Di bîbiliyografiya herî kevn -ji sedsala çarema hicrî/yazdehemâ mîlâtî- a ku bi temamî gihaştiye me û bi Fîhrîsta Îbn Nedîm meşhûr e, behsa Îbn Wehşîyye tê kirin. Îbn Nedîm wiha dibêje: “Ew, ji kesen ku ji zimanê Nebatî bi bal ‘Erebî ve wergeran dike.” Di cîhekî din de, behsa koleksiyoneke mezin ji pirtûkên wî dike. Herwiha behsa şagirdekî wî jî dike û dibêje: “Dibe ku heta niha jî sax be yan jî di nêz de wefat kiribe.”<sup>7</sup>

Ji dema Îbn Nedîm ve heta serdema me, Îbn Wehşîyye di gelek çavkaniyê din de jî derbas dibe.<sup>8</sup>

### Girîngiya Berhema wî

Pirtûka “Şewqu'l-Musteham fi Me'rifeti Rumûzi'l-Eqlam” behsa herfîn/al-fabeya gelek zimanê kevn -yên ku di kevnartiyê de noqbûne û yên heta serdema nivîskar-, dike. Girîngiya pirtûkê ji vê tê; Îbn Wehşîyye, bi tenê behsa herfan nekiriye, digel vê nîşan û sembolên wan zimanân jî ji hev vekiriye û li hemberî wan, herfîn ‘Erebî danîne. Heta ji zimanê ku di nivîsandinê de sembolan bi kar tînin û xwe dispêrin wan, gelek mînakan tîne. Yek ji wan, kîtabe/nivîsa

el-Ma'rûf bi'l-Werraq, *Kitabu'l-Fîhrîst li'n-Nedîm*, Tehqîq. Rîda-Teceddûd, rp. 305. Ev jî, ji ber ku “h” û “c” ya ‘Erebî bi xalekê ji hev cuda dibin. Diyar e ku ev karê mustensikan e û her yekî bi awayekî nivîsandiye. (Nîşeya wergêr)

- 5 Hercîqas Îbn Nedîm di berhema xwe de wesfê “es-sofi” di heqê wî de bikar anîbe jî, ev ne bi sedem ku bi ilmê tesewwufê mijûl bûye. Lewra di wê serdemê de kesê bi ilmê sîmya û tilsimê re mijûl bibûna ji wan re “sofi” dihate gotin. (Bnr. Mahmut Kaya, “Îbn Vahşîyye”, *DîA*, Stenbol 1999, c. XX, rp. 437.) Em vî wesfê han, di seydayê wî Ebu ‘Ebdullah Cabir b. Heyyan b. ‘Ebdullah el-Kûfi de jî dibinin. Bnr. Îbn Nedîm, *el-Fîhrîst*, rp. 420. (Nîşeya wergêr)
- 6 Bnr. ‘Umer Rîda Kehhale, *Mu'cemu'l-Muellîfîn*, Weşanxaneya (Îhyau't-Tûras el-'Erebî, Beyrût, c. II, rp. 23; Ziriklî, Xeyruddîn b. Mehîmûd b. 'Elî b. Faris ez-Ziriklî, *el-E'lâm*, çapa 5., Daru'l-Îlm li'l-Melayîn, Beyrût 1980, c. I, pr. 170-171. (Nîşeya wergêr: Li gorî min, Îbn Nedîm di pirtûka xwe ya bi navê el-Fîhrîst de behsa vê berhemê û naveroka wê jî kirîye. Lî ne bi navê “Şewqu'l-Musteham fi Me'rifeti Rumûzi'l-Eqlam”, belbî bi “Nusxetu'l-Eqlam” derbas dibe. Herwiha dibêje ku “Bi van eqlaman berhmê sen'et û yên sihrê tênen nivîsandin.” Bnr. Îbn Nedîm, *el-Fîhrîst*, rp. 423.)
- 7 Îbn Nedîm, *el-Fîhrîst*, rp. 305.
- 8 Bnr. Îbn Hecer, *Fethu'l-Barî*, Daru'l-Me'rîset, c. VIII, rp. 477; Îbn Ebî Useybî'e, ‘Uyûnu'l-Enba fi Tebegati'l-Etibba, Dar Mektebetu'l-Hayat, Beyrût, rp. 659, 684-685; *Tefsîra Alûsî*, c. XX, rp. 118, Bexdadî, *Hedîyyetu'l-'Arîfîn*, Dar Îhya'ut-Turas el-'Erebî, Beyrût Lubnan, c. I, rp. 55 (Ev pirtûk di sala 1951 de ji aliye weşanxana “el-Behîyye” li Stenbolê hatîye çapkirin û Dar Îhyau't-Turas el-'Erebî li ser Ofsetê çapa wê dubare kir); Axa Bizurk et-Tehranî, *ez-Zerî'e*, çapa 2., Daru'l-Edwa, Beyrût 1403, c. X, rp. 171; Îdrîsî, *Nuzhetu'l-Muştaq fi Îxtîraqî'l-Afsaq*, ‘Alemu'l-Kutub, Beyrût 1409/1989, c. II, rp. 721; Sefedî, el-Wafî bi'l-Wefîyyat, Dar îhayu't-Turas Beyrût 1420/2000, c. IX, rp. 27.

hiyoraglîf a ku heta demeke nêz dihate bawerkirin ku Jean-François Champollion ê Frensî, yekem kes e ku ew xwendîye û nîşanên wê ji hev vekiriye.

Lê belê lêkolînerê Misrî Erkdarê Hîndekariyê li beşa Enstîtuya Arkeoljiyê li Zanîngeha Londonê Dr. ‘Ekkaše ed-Dalî (عکاشة الدالی) û ji Sûriyê Yehya Mîr ‘Elem (يحيى مير علم), bi lêkolînên xwe yên ji hev cuda gihaştine encama ku Îbn Wehşîyye, yekem kes e ku nîşan û sembolên zimanê Misrî yê kevn vekiriye û cureyên wê di pirtûka xwe ya bi navê “Şewqu'l-Musteham fi Me'rifeti Rumûzi'l-Eqlam” de, ji hev veqetandiye.<sup>9</sup>

Digel van herduyan, Dr. Musfeta Yaqûb<sup>10</sup> jî di teza xwe ya doktorayê ya an-siklopedik de, ya ku dereca şeref û imtîyazê girtiye behsa vê pêşengiyê kiriye. Lê belê ez nizanim bê ev lêkolîn û xebata wî neqla ji wan e yan lêkolîn û xebatek din a serbixwe û cuda ye.<sup>11</sup>

Yekem kesê ku keşfa vê pirtûkê kiriye, dîrokñas û rojhilatzanê navdar Joseph von Hammer ê Awistiryayî ye. Hammer, di sala 1806an de li Londonê vê pirtûkê çap dike. Ev, bû sebebê ku herdu lêkolînerên ku navên wan derbas bûn tekîd bikin ku Şampolyon beriya ku nîşanên li ser “Kevirê Reşîd” ê ku nêzî bajarê Reşîd li bakurê Misrê dikeve, bixwîne, divê ku ev destnivîs mutale kiribe.

Girîngiya vî kevirî, ji kîtabeyên/neqşen ku bi nivîsa hiyogralîfi û hebûna wateyên wan bi zimanê Yewnanî yê kevn, tê.<sup>12</sup> Şampolyon, di sala 1822an de neqşan/kîtabeyan werdigerîne. Lê pirtûka Îbn Wehşîyye “Şewqu'l-Musteham” beriya vê mîjûyê bi nêzî 15 salan hatiye çapkîrin. Di piştre ew agahî ji aliyê Editorê Zanîstî yê Rojnameya Observer ya İngilîstanê Robin Mackey, tê weşandin. Ha ev weşan, bi stendina şerefa keşifkirina nîşan û sembolên hiyoraglîfi ji Frensîyan pişti du sed salan be jî, dibe ku weke tolhildanekê be. Lewra Frensîyan di dema dagirkirina Misrê de ew -cih- keşif kiribûn û meydan ji zaroyêن apêن xwe (İngilîzan) re dixwendin. Wan pişti serkeftina leşkerî, serkeftinek e din ya zanistî jî li ser serkeftinêن xwe zêde kiribûn.

Di encamê de, Îbn Wehşîyye pirtûka xwe, çawa ku di dawiya wê de hatiye qeydkirin, di sala 241ê koçê/856ê pişti zayinê de nivîsandiye, xelas kiriye.

9 Bnr. Yehya Mir ‘Elem, “Îbn Wehşîyye en-Nebeti we Riyadatîhu fi Keşfi Rumûzi'l-Hiroglifyye fi Kîtabihî Şewqu'l-Musteham”, Mecelletu Mecme ‘u'l-Luxeti'l-'Erebîyye, Dimeşq, (c. 79) jimar. 7, rp. 35-764; “Şewqu'l-Musteham Eqdemû Mextûtin Keşefe Rumûze'l-Hiroglifyye”, en-Nedwe ‘Alamîyye es-Samîne lî Tarîxi'l-Ulûmi înde'l-'Erebî, Mektebetu'l-Îskenderîyye, 2004.

10 Birayê nivîskar ê mezin e. (Nîşeya wergêr)

11 Muellif nusxeyeke ji teza xwe dîyarî min kir û niha ez wê di compitura xwe de muhafaze dikim.


12 Dema Napolyon welatê Misrê dagir dike, di sala 1799an de fermandarekî Frensî yê bi navê Boşar li rojavayê Misrê “Hecer Reşîd” ango kevirekî li nêzî bajarê Reşîd keşif dike. Ev kevir, di sala 1802'an de bo Qralê İngilîstanê Goerge III. tê diyarî kîrin û kevir dibin Londonê. Qral jî kevir diyarî Muzeya İngilîstanê dike. Li ser kevir sê kitabe hebûne. Ew jî: Hiyeroglif (nivîsa Misrê ya fermî), Demotik (nivîsa ku gel di jiyanâ xwe ya rojane de bikar dianîn) û Yewnanî bûn. Bi sedem ku nivîsa Yewnanî dihate zanîn, zanyaran texmîn kîrin ku dê herdu nivîsên din bi heman wateyê bin û li ser vî esasî sembolên wan kîtabeyan xwendin. Bnr: İyad Xalid et-Tebba’, *Menhecu Tahqîqi'l-Maxtûtat ve meahu kitabu Şewqu'l-Musteham fi Me'rifeti Rumûzi'l-Eqlam*, çapa 1., Daru'l-Fikir, Dimeşq, 2003, rp. 129. (Nîşeya wergêr)

### Di derbarê Kurdan û Alfabeya Kurdî de

Di pirtûka Îbn Wehşîyye de behsa Kurdan bi çend munasebetan tê kirin. Herciqas hevok hindik bin jî lê belê delalet û nîşanên wan hin wateyên girîng di xwe de dicivînin. Da ku perde ji ser dîroka Kurdan ya nediyar were rakirin, hewcedarî bi xebatêن pir mezin heye.

Em ê niha li ser munasebata dawî bisekinin. Di pêş de em ê li nîşanên ku ev îbare di xwe de digirin, vegerin. Ji bo kêfxweşiyê, besî me ye ku em li van herfan binihêrin. Heta belbî ji bo pêbilîbûnê be jî divê meriv hewl bide ku van herfan fêr bibe û bi wan bimivîse. Ji ber ku nivîsandina bi herfêن xwe yên kevn îhya kirine -çi di nav gel de ci jî bi şeklê fermî be-, ez gelê Amazîxan pîroz dikim.

Îbn Wehşîyye di dawîya pirtûka xwe ya “Şewqu'l-Musteham” de dibêje ku “Şeklê qelemekî/alfabeyeke din ji qelemên kevn. Tê de hin herf/tîpêن ji qayde û rêzên herfan zêdetir tê de hene. Kurd angaşt dikin ku Bînoşad û Masî es-Soratî hemî zanist, huner û pirtûkên xwe bi wî qelemî/alfabeyê nivîsandine û sûretê wê weke ku tu dibînî ev e...”<sup>13</sup>



### Rewşa Zimanê Kurdî ya Hezar Sal Berê

Weke me berê jî got Îbn Wehşîyye, bi çend munasebetan -di sê cîhan de-behsa Kurdan dike. Me, pêşî dest bi ya dawî ji pirtûkê kir ku tê de behsa herfêن Kurdan dikir. Çawa me berê jî soz dabû, em ê niha işaret bi bal mijarêن din ve bikin, tehlîl û analîzêن xwe yên li ser wan bibêjin.

Di vir de, em dixwazin berê behsa nêrîna Îbn Wehşîyye ya taybet ya di derheqê van herfan de bikin. Piştre em ê dest pê bikin; nîşan û delaletên gotinên wî yên hindik û besît lê belê yên ku hin wateyên mezin û kûr di xwe de dicivînin,

13 Şewqu'l-Musteham, rp. 204.

raxên ber çavan. Herwiha em ê hin pisrgirêkên ku di derbarê wan herfan de derdikevin holê jî nîqaş bikin.

Berî destpêkirinê, em ê bi bal ifadeya yekem ji pirtûkê ya di derbarê van herfan de, vegerin. Û ji bo vî tiştî ez lêborînê ji xwendevanan dixwazim. Lewra pêwîstî bi vê yekê heye û bila ev wekî pêşgotin û girizgeheke bê jimartin. Îbn Wehşîye wiha dibêje:

“Beşa heftem ji Şewqu'l-Mustehamê di derbarê naskirin û zanîna nîşanên eqlaman/alfabeyan ji eqlamên desthilatdarên ku navên wan derbas bûn, ji Suryan, Hermesî, Firewnî, Ken'anî, Keldanî, Nebatî, Kurd, Kesdanî, Faris û Qibtîyan e... ”<sup>14</sup>

Ev ifade, didin zanîn ku ev herfêن han (alfabe) herfêن desthilatdarên Kurdan e. (Ango di wê demê de hin herêm hebûne ku di bin deshilatdariya Kurdan de bûne û Îbn Wehşîye ew der dizanibûn û nas dikirin. Lê belê ev meseleyeke cuda ye û dibe mijar ji bo gotareke din.) Lê belê di vir de tiştê me eleqadar dike ku ev herfêن han, herfêن/alfabeya desthilatdarên Kurdan bûne. Ev jî, pirsa gelo ji van herfan/alfabeyê pê ve tu herfêن din ên Kurdan hebûne, bi xwe re derdixe holê.

Di dîrokê de, ji bo zimanekî di serdemekê de çend awa heta çend tîpêن ji hev cuda, têن dîtin. Çavkaniya me di vir de dîsa pirtûka Îbn Wehşîye ye; lewra ew, ji bo nivîsa hiyorglafî behsa sê şekil û tîpan dike. Du şeklan ji bo zimanê Keldanîyan dide û gava ew behsa qelemê desthilatdarekî Suryanîyan dike<sup>15</sup> di-gel ku ji nivîsa Suryanîyan ya ku iro pê dinivîsin bi temamî cuda ye jî lê di heman demê de pir dişibe ya ku di pirtûkê de derbas dibe.

Wê demê guncav e ku ji van tîpan/herfan pê ve hin şeklên din jî yên herfêن Kurdan hebin. Lewra çawa ku di metnê Îbn Wehşîye de jî derbas dibe, ev “Herfêن desthilatdarên Kurdan”e, ne herfêن Kurdan e.

Lê belê ew herf kîjan in û li ku ne? Gelo ew herfêن Avestayî ne ku metnên kitêba Zerdeşt pê hatiye nivîsandin û yên ku hin kes bawer dikin ku ew Farisiya kevn e. An jî Pehlewî ye ku pir kes bawer dikin ku Farisiya navîn e. Li hember vê, hin lêkolînerên din jî hene bawer dikin ku ev ziman hemî, zimanên Kurdî yên kevn in û nêzîkatiya wan bi bal hemî zaravayêن Kurdî ve ji Farisiya iro, zêdetir e. Bi vî awayî ew dibe herfêن/tîpêن giştî bo hemî Kurdan.<sup>16</sup>

Dibe ku ev herfêن/tîpêن ku di pirtûka Îbn Wehşîye de derbas dibil, xeleka madî û nivîskî be di navbera wan zimanên windabûyî û zimanên iroyî de. Ev jî, dibe bar û berpirsyarî li ser pişta dîroknaş û zimanzanên Kurdan, da ku li serê muqayese û lêkolînan bikin.

14 Şewqu'l-Musteham, rp. 165.

15 Şewqu'l-Musteham, rp. 165-166.

16 Bnr: ‘Ebduşselam Fehmî, Tarîxu'l-Luxat el-Îrânîye, sala çapê, 1972, rp. 30 û piştî wê, 50 û piştî wê; Giw Mukriyanî, Ferheng Mehabad, rp. 770; û piştî wê, Abdullâh Varlı, Dîroka Du Gelên Kurdan, Weşanxana Sipan, Stenbol 1997, (pêşgotin).

## Analîza Zanistî û Îfadeyên Îbn Wehşîye yêñ di derbarê van Herfan de

Îbn Wehşîye wiha dibêje: “Ji qelemên/alfabeyêñ kevn, şeklê qelemekî/alfabeyeke din. Hin herfên ji qayde û rêsêñ herfan zêdetir tê de hene. Kurd angaşt dîkin ku Bînoşad û Masî es-Soratî<sup>17</sup> hemî zanist, huner û berhemên xwe bi wî qelemî nivîsandine.”<sup>18</sup>

Piştî ku li hember her herfekê muqabilê vê ji herfên ‘Erebî dide, heft herfên ku muqabilê wan di ‘Erebî de tunene, dimînin. Dûvre wiha berdewam dike:

“Me, di tu ziman û qeleman de ji bo herfên mayî, ne xwendin û ne jî mînak dîtin. Ew ji eqlamên ecêb û rusûmên/sûretên, xerîb in.”<sup>19</sup>

Di serî de tiştê ku bala mirov dikişîne gotina wî ya: “Ji eqlamên kevn” e. Digel ku di navbera wî û herfên Yewnani û herfên hîyaroglîf zêdetirê 1500 salan heye jî, ew bi kevnîtyê nav nekirine. Lewra peyva “kevn” di hizir û mefhûmê wî de, vedigere bi bal gelek sedsalên berê.

Lê belê dema behsa hin herfên ku beriya Firewnanîyan in û ji aliyê wan ve jî hatine bikaranîn dike, bi kevnîti işaretî bi bal wan ve dike. Lê herfên ku Firewnîyan bi xwe danîne, wan bi kevnîti nav nake. Bi kurtasî, di bikaranîna vê peyvî de di pirtûka xwe de pir bidîqat û hesas e. Ji bilî ku işaretî bal nivîsên/kîtabetên gelên Mabeyne'n-Nehreyn (Mezopotamyayê) mîna Hermesiyân, Nebatî, Keldan û Kurdan bike, di her halî ew peyva “kevn”, zêde bikar nayne. Çimkî peyva “kevn” di nêrîna wî de, vedigere bi bal hezar salan. Sedemê ku me ew îbare anî pêşberî we, ne bi tenê ji bo nîşandayina ku gelê Kurd gelekî kevn e; belbî ji bo delalet û nîşandayina kevnîtiya nivîsa Kurdi ye –ku mijara nivîsa me ye-. Di navbera herdyan de cudahiyeke diyar û zelal heye. Lewra wekî ku aşkere ye, gel ji nivîsa xwe pir kevtir e. Çawa ku işaret dike bi bal pêşketina nivîsa Kurdi ji aliyê zeman li ser kîtabetên Firewnî û Yewnaniyan. Di heman wextê de işaret dike ku Kurd bi deh hezar salan e ew der ji xwe re kirine war û bûne niştîmanê wê.

17 Mamoste Kadri Yıldırım, di gotara xwe ya “Kürtlerin İslam Öncesi Alfabe Serüveni” dibêje ku “Binû Şad û Masî Sûratî” navê du eşîrên Kurdan ên destihilar in. Lê tu agahiya me di heqê wan tuneye. Vê jî, ji ifadeya Îbn Wehşîye ya di beşa heftem “desthilatdarên kevn”, derdice. Bnr. Kadri Yıldırım, “Kürtlerin İslâm Öncesi Alfabe Serüveni”, *Kürt Tarihi Dergisi*, jîmar. 5, Şubat-Mart, 2013, rp. 27-28.) Lê belê bi min, evê tesbîta mamoste Kadri şaş e. Lewra di ifadeyên Îbn Wehşîye de herçiqas “desthilatdarên kevn” derbas bibe jî, lê dema ew behsa “Bînoşad” û “Masî es-Soratî” dike, vê yekê mîna angaşta Kurdan bilîv dike. Wekî din “Bînoşad û Masî es-Soratî” hemî ilm, huner û pirtükên xwe bi wî qelemî/alfabeyê nivîsandine”, di “Erebî de ”، “فُنونهمَا”， “عِلْمُهُمَا”， “كتابهمَا”， “كتابهمَا” derbas dîbin. Ev hemî jî didin nişandan ku ew, ne eşîr in, belbî du kes in. Bnr. *Şewqu'l-Musteham*, rp. 204. Li aliyê din “Ew angaşt dîkin ku ew zarokêñ Bînoşad in” behsa “Masî es-Soratî” nayê kirin. *Şewqu'l-Musteham*, rp. 203. Ji vê jî dîsa tê fêhmê ku ew ne du eşîr in. (Nişeya wergêr)

18 *Şewqu'l-Musteham*, rp. 204.

19 *Şewqu'l-Musteham*, rp. 204.

Herçiqas delalet û nîşanên gotinêن Îbn Wehşîye yên din mezin û girîng bin jî, da ku em ji mijara xwe dûr nekevin, em xwe di ser wan re diavêjin. Niha em werin ser pirsgirêk û pirsên ku di derbarê van herfan têن kirin.

### **Pirsgirêkên derbarê van Herfan de Pirsgirêka Herfêن ku Niha di Kurdî de tunene**

Dema ku em li herfêن/tîpêن Kurdî yên di berhemê de derbas dibin dinihêrin, 28 herfêن/tîpêن ‘Erebî ku li hember wan hatine danîn û paşde du herfêن şîrovekirî û heft herfêن ne şîrovekirî ku tê de derbas dibin, bala me dikişîne. Herçiqas di ferhengêن Kurdî yên kevn ên ku bi herfêن ‘Erebî hatine nivîsandin de pirê wan tîpan hebin jî, em hemî dizanin ku îro di ferhengêن me yên nû yên bi tîpêن Latînî hatine nivîsandin de tunene. Gelo dibe ku ew tîp, di wê demê de hebûn û piştre ji holê rabûn û wendabûn?!

Li gorî nêrîna min, hemî tîpêن ‘Erebî; ji sê “ـ” û zalê “ـ” pê ve heta belbî herfa (ض) “dad” ê jî (divê were zanîn ku gotina; “Zimanê ‘Erebî zimanê dadê ye” ne ji ber ku “dad” bi tenê di zimanê ‘Erebî de heye) di Kurdî ya ku îro em pê diaxivin de heye. Bi taybetî jî di devoka Botîyan an jî Cizîriyan de. Çawa ku devoka Qureyşîyan di nav ‘Ereban de cihekî wê yê taybet heye, bi tifaqa hemî zimannasên Kurd, devoka wan jî ji ber revantî, fesahet, ziravî, û safitîya wê ewqas taybet e.

Li gorî min, herfa “zal” (ـ) û “sê” (ـ) û li gorî pirê yên ku bi zimanê Kurdî xwedî ihtimam in, herfêن “ـ، ـ، ـ، ـ، ـ، ـ” (hê, xê, sad, dat, tê, zê, ‘eyn,) û li gorî piran tîpa “xeynê” (خ) wekî pirsgirêk dimînin. Zimannasên Kurd li ser herfa “xeyn” ê axivîne û hinekan dîtine ku vê pirsgirikê bi danîna du nuqteyan li ser “xê” ya Latînî, çareser bikin û -digel ku di pirê lehceyan û bi taybetî di lehceyên başûr de hebûna xwe parastibin jî- di derbarê herfêن din de neaxivîne. Rast e hinekan hewldane ku hin herfêن din ên ku bawer kirine di Kurdî hene, mîna “k” û “b” ya ker/tî û “r” û “l” ya stûr ên ku wekî herfêن serbixe di alfabeşa Soranî de ne, çareser bikin. Lê belê hewldanêن wan ji bo vê û yên din, bêyi ku tu qayde û rêzan ji wan re diyar bikin an jî danîna nîşaneke ku bi bal ve işaret bike bi tenê rîya bilêvkirina wan xuya kirine. Li berevajî ‘Erebî, ew tîp, ne sirf sîfet in ji tîpan re. Lewra eger sîfet bûna ji bo herfan, divê ku bi şeklekî daîmî û li gorî herfa dengdar a berê yan jî pişti wê, -mîna sîfetê tîpêن ‘Erebî ku qayde ji wan re hatiye danîn, lewra di ‘Erebî de ew li gorî herekeyan -dengdaran- têن guhertin-bihata guhertin. Wekî ziravî û stûriya herfa “lam” û “rê”, bilindkirin û daxistina “xê” û qelqelevkirina herfêن qelqeleyê û hwd. ji qaydeyên ku di Tecwîda Qur’ana Pîroz de hene. Zimanzzanan, di xebatêن xwe de di bin beşa hermonî û rewantiya tîpan de, hîn nû berê xwe dane vê mijarê.

Ji bo ku mijar, ji aliyê xwendevanêن di zimanân de ne pispor in bi awayekî zelaltir bê zanîn em dibêjin: Dibe ku ev tîp berê hebûn, lê belê bi derbasbûna sed salan di jiyana zimanân de hatine veşartin û windabûne. Niha em ê hin mînakêن ku ji me hemîyan re nêz in û têن zanîn bidin. Mînaka yekem tîpa



“cîmê” (ج) ku li ba Misrîyan hatiye guhertin û dema bi fusha jî dixwînin “cîmê” wekî “g” bilêv dikin û “Cemal” nola “Gamal” dibêjin. Li welatê Şamê jî tîpêن “sê” (ش) û “zal” (ز)’ê, êdî bi tîpêن “tê” (ت) û “dal” (د)ê hatine guhertin. Ehlên Şamê “selase” (ثلاثة) bi zimanê ‘Erebî wekî “telate” (ثلاثة) û “zeheb” (ذهب) jî wekî “deheb” (ذهب) bilêv dikin. Çawa ku li Fas/Mexribê tîpa “zê” (ظ) bûye “dad” û di dema xwendinê de ji gotina “zulm”’ê re dibêjin “dulm”, li Kuweytê, “cîm”’ê hin caran dikin “y”e û “decace” (موجة) dikin “deyaye”. Herfa “qaf”ê (ق) ya ku pîvan e ji bo naskirina pirê lehceyên herêmên ‘Ereban, li ba pirê Xeliciyân wekî “g” tê bilêvkirin, li Şamê û Misrê wekî “hemzeyê”, li cem Filistinîyan wekî “kafê” (ك) û li herêma kersaxa Sûriyê wekî “qaf” a ker tê bilêvkirin.

Dema em li qîraetên<sup>20</sup> Qur’ana Pîroz diponijin ku ew jî pîvaneke pir xweş e ji bo naskirina zaravayên ‘Ereban ên wê deme, em dibînin ku di wê demê de hin tîp hebûne ku iro di nivîsandina ‘Erebî de nayêن naskirin. Wekî mînak herfa îmaleyê “ê” ya Frensî yan jî Kurdî di pirê qîraetên Qur’ana Pîroz de û bi taybetî jî di riwayeta ku iro li Fasê tê xwendin (hinek riwayatên ji Werş û Qalûn). Tê bîra me hemîyan ku Şêx ‘Ebdulbasit Ebdussemed, elîfa “we’ddûha” (والضحى) û “qela” (قليل) ji sûretê Dûha, çawa îmale dikir û wekî “ê” dixwend.<sup>21</sup>

Mînakêن bi vî awayî di hemî zimanen de pir in. Ji herfîn ku di zimanê Îngilizî de bi hev re têن nivîsandin û ji herfîn têن nivîsandin lê belê nayêن bilêvkirin an jî di Îngilizî de bi awayekî û di Frensî de bi awayekî din têن bilêvkirin, bi hêsanî em dikarin nas bikin. Û ger ne ji tirsa dirêjkirinê bûna, me dikaribû hin mînakêن din jî bidana.

### **Pirsgirêka Herfîn ku Niha hene lê Behsa wan an jî Şîroveya wan Nehatine Kirin**

Herfîn dengdar ên sivik (an jî di zimanê ‘Erebî de herekatêن herfan; ziber, zêr û pêş) di temamê zimanêن ku wî cih daye wan û jimara wan jî 69 ziman in de, tunene. Ji ber vê yekê me behsa wan nekir. Lîbelê tîpêن din, Îbn Wehşîyye bi tenê behsa xerabeta zimanê Hermesîyan dike û dibêje ku, tê de hin tîp hene ku ne di zimanê ‘Erebî de û ne jî di zimanê eceman de, tu mînak ji wan re tunene û jimara wan tîpan digihîne 38 herfan. Digel wî hawî jî, çawa ku ji hemî zimanêن ku tîpêن wan ji tîpêن ‘Erebî cuda ne şîrove anîne, wan tîpan jî hemîyan şîrove û tefsîr dike. Lê belê dema behsa qelem/herfîn Kurdî dike, ji neh tîpêن ku ji alfabeşa ‘Erebî cuda ne, du herfan bi tenê şîrove dike. Û ji 37 tîpêن Kurdî her heft tîpêن din şîrove nake.

Diyar e ku Îbn Wehşîyye nikaribûye wan herfan şîrove bike, an jî dibe ku ji ber pirbûna pirtûkêن zanistî yên ku bi zimanê Kurdî hatibûne nivîsandin -jixwe Îbn Wehşîyye du heb ji wan bi bal ‘Erebî ve wergerandine-, nexwestiye ku ji wî

20 Qiraet, ji cure û awayêن xwendina Qur’ânê re, tê gotin. (Nîşeya wergêr)

21 Ango wî “الضحى” û “قليل” bi awayê “we’d-duhâ” û “qelê” dixwendin. (Nîşeya wergêr)

pêve kesekî din bi wan tîpan bizanibe û bi wî awayî tu kes nebe hevparê wî di vê şerefê de.

Bi vî awayî, piştî ku Îbn Wehşîyye nêzî 70 zimanan şirove û tefsîr dike, zimanê Kurdî di pirtûka wî de dibe zimanê yekem ku nikaribûye hin tîpan jê şirove bike.

Lê belê çareserkirina pirsgirêka tîpênu ku iro hene û tîpênu ku tunene dikeve ser milê zimannasên Kurd û Entîtûyên wan ên ziman. Ji bo tehqîq û analîzkirina tiştên bi van tîpan ve girêdayî ne, hewcedarî bi tezên bilind hene. Her tîpek jê dibe ku bibe mijar ji bo tezeke zanistî ku meriv pê diploma doktorayê di dîroka ziman de bistîne. Tê bîra min ku min carekê xwendibû ku yekî rojhilatzan di tezekê de li ser mijara ku herfa yekem di zimanê ‘Erebî de “hemze” ye; ne “elîf” e xebitiye! Lewra elîf ji du hemzeyan pêk tê.

Mîna ku ez li bajarê Şamê pêrgî xwendekarekî rojhilatzan ji Ewrûpa ku di derheqê rîbaz û şeklê nivîsandina daxuyaniyên şînê/teziyan<sup>22</sup> bi zimanê ‘Erebî li ser tezekê dixebeitî hatim.

### **Bilêvkirina hin Herfênu bi tenê di Zimanê Kurdî de hene û Îbn Wehşîyye Nikaribûye wan Şirove Bike**

Şêwaz û rîya bilêvkirina zimanê Kurdî û tîpênu dengdar, ji bo kesên bîyanî yên dixwazin ku Kurdî hîn bibin, di xwe de pir zehmetiyan dicivîne. Di destpêka serdema 19. dema ku Walîyê Amedê yê wê demê Dîyauddîn Xalid Paşa el-Meqdisî, ferhenga xwe ya bi navê “el-Hedîyyetu'l-Hemîdiyye fî'l-Lûxetî'l-Kurdîyye” telîf dike an ji -wek ku ji min ve xuya dibe- bi yekî dide amadekirin, di mada “ker” de wiha dibêje: Tê wateya “الْحَمَارُ، وَالْأَصْنَمُ، وَالْفَرْضُ، وَالْقَطْعَةُ مِنَ الشَّيْءِ” “ker (heywan), kesê ker, deyn, par û parçeyê tişteki” û piştre wiha berdewam dike “li ba Kurdan di bilêvkirina vê peyvê de li gorî wateyên ku derbas bûn hin cudahiyên ne aşkere hene ji wan pêve tu kes pê nizane û di vir de ifade kirina wan ne pêkan e.”<sup>23</sup>

Weke ku aşkere ye ev ferqên han bi zêdekirina dengdarekî bi tenê dertê holê û hesabê zêdekirina dengdarên din li ba te ye. Tu dikarî xeyal bikî bê ka çawa bi zêdekirina “zêr”ekê yan ji “pêş”ekî wetayên cuda derdikevin holê.

Nivîsakara Ewrûpî Margrit Can di pirtûka xwe ya bi navê “Ebnaul-Cin” (Zarokên Cinan) de, îşaret bi bal van ferqan û rîya bilêvkirina tîpênu Kurdî ve kiriye. Û xerîbdîtina xwe ya ku bi pesendkirinê re tevlihev, aşkere dike. Di vir de ez ‘uzrê xwe ji xwendevanan dixwazim, lewra pirtûk niha ne di destê min de ye da ku ez jimara rûpelê wê bidim wan.

22 Çawa ku li hin deveran ji bo mirina yekî sela tê xwendin, li welatê ‘Ereban jî mirina kesê mirî li kaxizan dinivîsin, li ber mizgeft û bi dîwaran ve dizeliqênen da ku mirina wî diyar bikin. (Nîşeya wergêr)

23 *el-Hedîyyetu'l-Hemîdiyye fî'l-Lûxetî'l-Kurdîyye*, çapa 2., tehqîq Muhammed Mukrî, Mektebetu Lubnan 1987, rp. 182.

Çawa ku zanyarê zimanan Michael L. Chyet ê Emerîkî yê ku bi 30 zimanan zêdetir dizane, aşiqê zimanê Kurdî û zaravayên wê ye û Kurdî, ji nava zimanên ku niha hene zimanê herî dewlemend dihesibîne, di bernama heftane ya “zimanê me” a ku pir salan ji 1990an û piştî wê di Radyoya Dengê Emerîka di beşa Kurdî de weşana xwe dikir, wî bi şeklekî zêde serkeftî behsa van ferqên dengî û rêya bilêvkirina wan li herêmên cuda yên Kurdan, dikir.

Wê demê ne xerîb e ku Îbn Wehşîyye li hember bilêvkirina rêya van herfan ecêbmayî bimîne û di serî de wiha bibêje: “Ji qelemên/alfabeyên kevn, şeklê qelemekî/alfabeyeke din. Hin herfîn ji qayde û rêzên herfan zêdetir tê de hene.” û wiha bi dawî bike: “Me, di tu ziman û qeleman de ji bo herfîn mayî ne xwendin û ne jî mînak dîtin. Ew ji eqlamên ‘ecêb û rusûmên/sûretên, xerîb in.’”<sup>24</sup> Bi taybetî jî dema em bidin ber çavêن xwe ku ev pirtûk zêdetirî hezar sal berê hatiye nivîsandin û zimanê Kurdî wê demê bêhtir xwerû bûye. Ev, di bilêvkirin û beyankirina tîpan de mezîyeteke zimanê Kurdî bi tenê ye. Ev yek belbî ji bo xwendekar û lêkolînerên “İlmê Dengan” pir mînakan bide û bibe wesîle ji bo keşfkirina asoyêن nû û yekta di vî warî de.

Hin pirsgirêkên din jî hene. Wekî mînak gelo rêya nivîsandina Kurdî ji destê rastê bi bal çepê yan ji çepê bi bal rastê ve bû. Di vî warî û di warê rêya nivîsandinê de bê ka bi hev re yan jî cuda dihat nivîsandin?

Wekî rewşa pirê zimanên Îranî û zimanên Mabeyn Nehreyn (Mezopotamya) yên kevn de jî heye, qenaeta min ku zimanê Kurdî ji rastê bi bal çepê ve dihat nivîsandin. Lê belê ji ber ku ev tîp sembolên ji hev cuda ne, pêkan e ku bi herdu awayan jî bêน nivîsandin. Encax eger ku bi hev re bêن nivîsandin, divê ku bêن destnîşankirin. Hevalekî min bo sazkirina hin fontan li ser compûtirê ji bo van herfan bi min re ket têkiliyê û ez bawer im ku ev mizgîniyeye xêrê ye.

Di dawîyê de, ev tîpêن nivîsa Kurdî li benda xebatêن zanyarêن Dîroka Cîhanê û Kurda ye, da ku neqş û destnivîsêن di herêmên cuda yên Kurdîstanê û yên li hemî cîhîn cîhanê hatine keşfkirin, ji nû ve bixwînin. Kî dizane, lewra bi xêra vê pirtûkê û bi cehd û xebata lêkolînerekî bi tenê ku piştire gelek kes bûn peyrevê wî, gelek sirrêن çanda Firewnîyan keşif bûn û gelek raman û nêrînêن di derbarê çanda Firewnîyan ên ku heta wê demê ji aliyê pir kesan ve wekî rastiye dihatin zanîn, berevajî bûn. Em li hêviya Şampolyonekî nû ne, da ku nişan û sembolên van herfan veke û wan bi eser û neqşen ku li Kurdîstan û Cîhanê keşif bûnê, wan bide ber hev û bi hev re muqayese bike.

### Tehlîla Herdu Berhemêن Kurdî yên herî kevn

Îbn Wehşîyye bi van gotinêن xwe yên zanistî yên delal ên li jêr, pirtûka xwe “Şewqu'l-Musteham fi Me'rifeti Rumûzi'l-Eqlam” bi dawî dike. Ew wiha dibêje:

24 Bnr. *Şewqu'l-Musteham*, rp. 204.

“Ew, ji eqlamên/herfên xerîb û resmên/şeklên nedîtî ne. Min li Bexdayê di sendoqekê de nêzî 30 pirtûkên ku bi vê xetê hatibûn nivîsandin, dîtin. Li Şamê jî jê du pirtûk li ba min bûn. Yek jê di derbarê “çandina rezan û darên xurmeyan” ya din jî di heqê “tesbîta avan û awayê derxistina avê li cihêن nedîyar.” Da ku mirovahî ji wan sûdê wergire, min ew ji zimanê Kurdan bi bal ‘Erebî ve, wergerandin.”<sup>25</sup>

Dema em werin ser tehlîl û analîzkirina van gotinêñ wî, em dikarin bi hêsanî xwe bigihînin van encaman:

**Encama Yekem:** Zimanê Kurdî di wan deman –dawiya serdema sêyem ya koçê/dehê piştî zayinê- de, ji zimanêñ zanistî yêñ cîhanê bûye. Îbn Wehşîyye bi xwe li Bexdayê bi vî zimanî 30 pirtûk dîtine. 30 pirtûk ji bo wê demê -destpêka telîf û wergerên bi bal ‘Erebî ve-, tiştekî ne hindik e. Heta dibe ku li cem pir kesan bi tu zimanî nîvê van jî tune bin. Piştre tîne ziman ku li cem wî bi vî zimanî, li Şamê du berhem hebûne. Herdu berhem jî di mijarêñ zanistî de bûne.

Berhema yekem, di barê çandina rez û darên xurmeyan de bûye. Ya duyem jî li ser tesbîta avan û awayê derxistina avê li cihêن nedîyar. Lê mixabin, wî behsa nav û mijarê pirtûkên din nekiriye. Birastî jî ez li ser mijara herdu berhemên navborî pir ponijîm. Herdu jî ji aliyeke ve bi çolê re têkildar in. Kesê Kurdîstanê û pirbûna av, kanî, çem û heta bîrên wê nas bike, dê derxistina avan jê re xerîb were. Ev tişt jî dibe sedemê hin pirsêñ din; ji belavbûna Kurdan li erdnigariya wê demê û her wiha têkilî û danûstendina Kurdan û çanda wan bi çandêñ derderê re.

Berhema duyem, di bara xurme û rezan de ye. Tê zanîn ku tirî, ji sedî sed mîweyekî Kurdîstanê ye. Ji lewra çawa ku di zimanê ‘Erebî de pir nav bo xurmeyê -ku mîweyekî ‘Erebî û çolê ye-, hene, di zimanê Kurdî de jî pir nav bo celebêñ tirî hene. Ez bêhtir li ser têkiliya ka gelo fêdeya ku xurme û tirî di berhemekê bi hev re cih girtine ci ye, sekinîm. Di dawiyê de ez gihaştim encama ku ev herdu ji pir aliyan ve dişibin hevdu. Herdu jî demeke dirêj dimînin û di pêvajoyêñ manendê hev -ku di her merheleyê de ji wan îstifade tê kirin- re, derbas dîbin. Bi hersim û bilhê<sup>26</sup> dest pê dikin da ku bibin tirî û xurme û bi mewîj û temrê<sup>27</sup> bi dawî dîbin. Di vê merheleyê de herdu jî dîbin qût û qatix.

Piştre jî bo dara herdulan jî, navêñ cuda hene. Mesela nayê gotin, dara xurmeyê yan jî dara tirî, li berevajî vê bo dara xurmê “Nexl” û bo dara tirî jî “Kerm”, tê gotin.<sup>28</sup> Her wiha herdu jî di merhela pêşî de dibe ku bêñ ‘esiranîn an jî di merhela xwe ya duyem de bêñ meyandin. Her wiha pêkan e ku

25 *Şewqu'l-Musteham*, rp. 204-205.

26 Di ‘Erebî de bo merheleya berî ku bibe xurme re tê gotin. Ji ber ku di Kurdî de me tu nav jê re nedît. Me navê wê yî original hilbijart. (Nîşeya wergêr)

27 Me tu nav ji vê re jî nedît. Bo vê yekê, me got “temr” ango xurmeya hişkirî. (Nîşeya wergêr)

28 Ev, di mantiqa zimanê ‘Erebî de wiha ye. Di Kurdî de dara xurmeyê tê gotin. Lê dara tirî nayê gotin. Jê re “mêw” tê gotin. (Nîşeya wergêr)

vexwarinên curbicur ji wan bêñ bidestxistin. Ha ev e têkiliya ku tirî û xurme di berhemekê de bi hev re cih girtine.

**Ya duyem:** Zimanê Kurdî bi tenê, ne zimanekî zanistî bû, li berevajî vê li warêñ cuda belevbûyî jî bû. Lewra li gorî ku Îbn Wehşîyye li Bexdayê 30 û li Şamê jî 2 berhem dîtine, dide nîşandan ku ev ne bi Îbn Wehşîyye yan jî li erdnigariya ku nêzî Kurdan e, mîna Bexdayê ve re, girêdayî ye. Belbî derbasî mentiqeyên hîn dûrtir jî bûye. Herî kêm zimanê Kurdî heta sedsala sêyem a koçê/dehê piştî zayinê, ji zimanêñ zanistî yên belavbûyî bû. Piştî ku pêngava telîfî bi zimanê ‘Erebî dest pê kir, pêşde çû û bi ser hemî zimanê din ket. Çawa ku zimanê Îngilizî ji sedsala 18min heta roja me bi ser hemî zimanê din ket. Heta nêzî du sed salan berê gelek zimanêñ zanistî yên belavbûyî hebûn, lê belê zimanê Îngilizî, bi ser tevan ket û bû zimanêñ zanistî yên yekem. Ev tişt hat serê zimanê Kurdî, Keldanî, Suryanî û Farisî jî; piştî ku ‘Erebî di dema xwe de li pêşber wan bi ser ket. Eger mesela ku zimanê Kurdî ji sedsalan ve ye zimanekî zanistî yên belavbûyî bû, xerîb bê dîtin û iro jî hewl dide ku xwe bigihîne zimanêñ zanistî yên hemdem, di bersiva vê xerîbdîtinê de em dibêjin: Zimanê ‘Erebî çend sedsalên berê, hema ci bigire zimanêñ zanistî yên bi tenê bû, lê belê iro ji bilî Zanîngehêñ Sûriyê –bo vê tê spaskirin- li temamê zanîngehêñ welatêñ ‘Ereban pirê zanistan, ne bi zimanê ‘Erebî didin xwendin.

**Ya sêyem:** Zimanê Kurdî, ji pêşengêñ zimanêñ zanistî bûye. Çawa ku iro di navbera Îngilizî û Frensi de reqabet û hemberî heye, wê gavê jî pêşbazî û hemberî di navbera Kurdî û Keldanî de bûye.

Li gorî tehlîl û analîza zanyarekî mîna Îbn Wehşîyye, di cihê duyem ê ku tê de behsa Kurdan dike ew wiha dibêje: “Lê belê Keldan, di dema xwe de di warê zanist, mearif, hikmet û huneran de mirovên herî zana bûn. Pêşiyêñ Kurdan dixwestin ku bi wan re gengeşiyê bikin û dirûvê wan bidin xwe. Lê ev, biqasî durahiya erd û asîmanan ji hev dûr e. Pêşiyêñ Kurdan, bi tenê di warê hunera çandinî û taybetmendiyêñ gihayan de, li pêş bûn. Ew dîsa angaşt dikin ku ew zaroyêñ Bînoşad in, Berhema Adem aleyhiselam ya li ser çandiniyê û herwiha berhema Sexrîs û Qusamî jî gihaştiye wan. Di her rewşê de ew angaşt dikin ku bi Esfarê Seb’ê (Heft Berheman) û berhema birêz Dewanay, dizanin.<sup>29</sup> Dîsa angaşt dikin ku di bara efsûn û tilsimê de jî xwedî zanîn in. Lê belê rastî ne wiha ye. Belbî temamê van zanyarî û huneran bi rêya Keldanan gihaştiye wan. Û ew,

29 Îbn Wehşîyye, di pêşgotina berhema “el-Felahetu ’n-Nenetiyye” ya ku ji zimanê Keldanî bi bal ‘Erebî ve wergerandiye, di derheqê “Sexrîs”, “Qusamî” û “Dewanay” de hin agahiyan parve dike. Li gorî îfadeyêñ wî, ev berhem Ji aliye sê zanyarêñ Kesdanî (Nebaşî) bi zimanê Suryanî yên kevn, ango bi zimanê Aramî hatiye nivîsandin. Sexrîs, dest pê kiriye, piştre Yentûşar û Qusamî, temam kirine. (Îbn Wehşîyye, *el-Falahetu ’n-Nebetiyye*, Tehqîq, Tewfiq Fehd, el-Me’hedu’l-Ilmî el-Firensî li’ d-Dirasat el-‘Erabiyye, Dimeşq, rp. 9. Di derbarê “Dewanay” jî dibêje ku ew ji “Balîl”ê ye û besêke ji berhema wî ya di mijara sirêñ felekê, hereketa stêrkan û bandora wan li ser bûyeran bi bal ‘Erebî ve wergerandiye. Îbn Wehşîyye, *el-Falahetu ’n-Nebetiyye*, rp. 8. (Nîşeya wergêr)

di van tiştan de pêşiyên wan in. Ji lewra di navbera wan de hergav neyartiyeye berdewan li dar bûye.”<sup>30</sup>

**Ya çarem:** Zimanê Kurdî, ji zimanênu ku Çanda ‘Erebî ya Îslamî, jê berhem wergerandiye. Û ji ber vê jî, ziman û çanda Kurdî, li ser çanda Îslamê bandor kiriye.

Herwekî ku tê zanîn, medreseyênu ku wergera bi bal zimanê ‘Erebî di wan de dest pê kirin, hema ci bigire li Kurdîstanê yan jî li warênen nêzî wê bûn. Dîroknas bi piranî behsa medreseyênu mîna Ruha -Heran-, Entakya, Nuseybîn û Re’su'l-‘Eynê<sup>31</sup>, dikin.<sup>32</sup> Li ser esasê têkiliya di navbera van medreseyan û vî metnê qedirbilind de, ji iro û pê de li ser dîroknasan pêwîst e ku qîma xwe bi gotina “Werger, ji zimanênu Suryanî, Yewnanî, Farisî û hin caran ji Hindî, dihate kirin” neyînin, li berevajî vê –bo pêbawerî û emaneta zanistî, ne ji bo tiştekî din- divê ku zimanê Kurdî û Keldanî jî li ser zêde bikin.

Di roja me de herçiqas em navê hin berhemên ku ji van zimanen bi bal ‘Erebî ve hatine wergerandin -da ku Çanda ‘Erebî ya Îslamî hîmîn xwe li ser ava bike-, bizanibin jî, ji tuneyî di destpêka bizava Çanda ‘Erebî ya Îslamî de ku bi bal ‘Erebî em navê du pirtûkên ku ji Kurdî hatine wegerandin, dizanin. Heta ji wan zimanênu ku borîn behra hinan jê berhemek bi tenê bû. Hema ci bigire ji Farisî em wergera berhema dîrokî “Şahnamê” bi tenê dizanin. Ji Yewnanî jî bi tenê tiştên li ser zimanê hekîm û bijîşk Eboqrat, hatine gotin, ji zimanê Hindî jî berhema “Kefîle û Dimne” dizanin. Lî em dizanin ku pirtûka “İflahu'l-Kerm we'n-Nexl/Çandina Rez û Darêن Xurma” û pirtûka “Tesbîtu'l-Mîyah/Tesbîta avan û awayê derxistina avê li cihênen nedîyar” ji Kurdî hatiye wegerandin. Herwiha em dizanin ku ji Keldanî jî berhema “el-Felahet=Çandinî” hatiye wegerandin. Bi vî awayî ev herdu ziman jî hin mafênu xwe yên li ser mirovahiyê bi derengî be jî, bidest dixin.

Dibe ku ev, bibe bersiva pirsên min û heta pirsên hinekên din, dema ku min hûr û kûr li bibliyografa Fîlozof Farabî yê ku di dawiya sedsala 3yemê koçê/10emê piştî zaniyê wefat kiriye, mêze dikir, min dît ên ku behsa jiyana wî dikin, digel pir zimanênu ku baş bi wan dizanibû; ji Suryanî, ‘Erebî, Farisî û Tîrkî, hergav dianîn ziman ku wî baş bi Kurdî jî dizanibû. Wê gavê min ji xwe

30 *Şewqu'l-Musteham*, rp. 202-203.

31 Di Kurdî de jê re “Serê Kaniye” tê gotin. Piştre navê wê bi “Ceylanpınar”ê hat guhertin. (Nîşeya wergerê)

32 Fuad Ebdulmutellib, *et-Terceme we'l-Behsu'l-'Ilmî*, Kulliyetu'l-Mu'ellimîn Qismu'l-Luxeti'l-İngilîziyye, Riyad, r. 22. Wî ji çend çavkaniyê cuda ev neqil kirine. Yek jê “Nezretun fi Hereketi't-Tercemeti we Neqli'l-'Ulûm 'inde'l-'Erebî fi'l-Qerneyn el-Ewwel we's-Sanî el-Hicriyeyn”, Mecelltu'l-Me'rifet, jîmar 398, Tişrîn es-Sanî (Mîjdar), 1996, rp. 152-177. Di derbarê rola wergerê di Çanda Îslamî de di serdemâ sîyem û çaremê koçê de bnr. Reşîd Hemîd Hesen el-Cemîlî, *Hereketu't-Tercemeti fi'l-Meşriqi'l-İslâmî fi'l-Qerneyn es-Salis we'r-Rabi' li'l-Hicreti*, Libya 1982; Muhammed Xêr Şêx Mûsa, “Fennu't-Tercemet fi'n-Neqdi'l-'Erebî”, Mecelletû 'Elamat, Recep 1414/1993, Suûdiyye, c. 10/3, rp. 197-225.

dipirsî, Farab, bajarê ku Farabî jê ye û nisbeta wî bi bal ve hatiye kirin, ne li erd-nigariya Kurdîstanê ye, li berevajî vê ew li Turkîstanê ye. Gelo çi bûbû sedem ku Farabî, zimanekî ku ne zimanê zanistê ye (wê demê min qedr û qîmeta zimanê xwe nizanibû) fêr bike. Lê îro ez vê yekê jî, wekî delîleke din li ser ku Kurdî, zimanê ilmê bûye, zêde dikim.

Bi taybetî jî dema em muzikşinasıya Farabî bînin ber çavêن xwe û îcadkirina wî ya amûrê qanûnê, ne dûrî aqilan e ku wî li berhemên di babetê çêkirina amûrên muzikê li Kurdîstanê, nihêrtibe. Bi taybetî, welatê Maneyn Nehreyen (Mezopotamya), welatê pêşî ye bo neya ku yekem amûrê muzîkê ye û dîroknaşen muzîkê hema çi bigire tifaq kirine ku muzîk ji wir dest pê kiriye.

Dibe yek rabe û bibêje ku ji dîroknaşen hemdem tu kesî, behsa girîngiya zimanê Kurdî nekiriye? Di bersivê de em dibêjin ku birastî wan, zimanê Aşûrî û Keldanî jî ihmâl kirine. Digel yekî mîna Colin Wilson dibêje ku Keldan, mirovên herî zana bûn bi zanyariyên felek/kozmolojiyê.

Em di vê gotarê de hewl didin ku hemî pîrsên têن kirin û pêkan e ku werin kirin; vê jî ne ku em mêsê bikin gamîş û li beroşa vala bixin, belbî bo zanyariya ilmî û bi xwespartina li ser delîl û bûyerên zelal ku ji aliyê ilmî ve bêñ pejiran-din, ne ku ji hin xewn û texmînan pêk têن, derxin holê.

Ji ber vê yekê em dibêjin rast e ku rêzên vê berhemê, heleqeyeke mezin a winda peyda kiriye. Lê belê em encamên hêj nehatine îsbatkirin, -li gorî nêrîna me-çawa ku mamosteyê mezin Giw Mukriyanî kiriye, li van rêzan bar nakin. Wî, ji berhema Îbn Wehşîyye ne temamê wan gotinan, belbî hin besen wê neqil kirine. Da ku ji çapa Londonê neqil bike dibe ku wî hindik derfet û îmkan dîtibe. Wekî din digel ku dibêje Îbn Wehşîyye behsa tîp û alfabeya Kurdan kiriye, lê wî di berhema xwe de şeklê wan nîşan nedaye. Ebdurrehman Zebihî di ferhenga xwe ya bi navê “Zebanê Kurdî” de jî hin tiştan jê digire. Mamoste Mukruyanî, ji vê yan jî dibe ku ji hin çavkaniyên din ên ku binav nekirine, dibêje ku zimanê Kurdî, zimanê Dîwanan bû. Heta di dema Emewiyan ya serî de li ser diravan jî -çawa ku meşhûr ne Farisi- belbî zimanê Kurdî hebû. Herwiha -digel ku em nikarin tiştên wî gotine mandele bikin jî- wî, di berhema xwe ya rewnaq de hin tiştên din ên xerîb jî anîne ser ziman.

Heta berî demeke pir nêz, xeberdana ji tîp û alfabeya Kurdan ya berî Îslamê wekî xeyalê dihate dîtin. Li gorî dîtina mamosteyê min ê dibistana navîn ê kal, ew, ya cureyeke ji xeyalê yan jî ji bêbextî ûiftirayan, pêk dihat. Lê niha va ye ev tîp, ji çavkaniyên herî kevn û pêbawer ên ku destnivîsên wê li her sê parzemînan belavbûye, li ber çavêن te ne û herwiha li pêşberî wan, tîpêن ‘Erebî jî hene. Muh-temel e ku yek ji me, di rojekê de pêrgî delîlên gotinên Mamoste Mukriyanî yêñ li jor, were.

Lê di vir de pirsa herî rewa: Eger zimanê Kurdî ewqas dîrokî û kevn e, wê gavê ka berhemên wê çîma nediyar in û çîma bi sedsalan veşarî û kitim mane.

### **Delîlên li ser Kevnariya Zimanê Kurdi**

Bi îtimad û spratina li ser hin nîşan û işaretên ku di berhema “Şewqu'l-Musteham” de derbas bûn, em gihaştibûn encama ku Kurdî, ji zimanên herî kevnar ê ku heta niha dijî. Nivîsandina bi Kurdî ji aliyê demkî ve muhitemel e ku di pêsiya nivîsên Firewniyan ên Misrê û ya Yewnanî de be jî. Bi vî awayî temenê nivîsandin û axaftina bi vî zimanî vedigere bi bal zêdetir ji 45 sedsalan, ango 4500 salan.

Piştre ew ziman, ne sirf bi tenê dihate axaftin an heta dihate nivîsin. Li berevajî vê, ew herî hindik li herêma Rojhilata Navîn di navbera Kurdistan, Bexda û Şamê de heta dawiya sedala 3yemê koçê/10mê piştî zayinê, zimanekî ‘ilmî yê belavbûyî bû. Lewra bi dehan berhem û destnivîsên bi vî zimanî hebûn û da ku zimanê Kurdî piştgirî û alikariyê bide Çanda ‘Erebî ya İslâmî ya ku di pêvajoya Çanda Mirovahiyê ya Cîhanê de roleke wê ya berz hebû, hinek ji wan li ‘Erebî hatibûn wergerandin.

Li ser kevnariya zimanê Kurdî -ji bilî ku em careke din bi tenê serî li Îbn Wehşîyye bidin- em dikarin hin delîlên din jî pêşkêş bikin.

### **Hebûna Bêjeyêن Zanistî**

Bêjeyêن zanistî yên di Kurdî de, mirov matmayî dihêlin. Pêkan e ew, ji bêjeyêن ku ji wê demê mabin. Bêjeyêن zanistî ji mîna; xwendin, sey, jiberkirin, nivîsandin û bêjeyêن mîna aborî û zanist bi koka xwe ya bingehîn hene û ji koka tu bêjeyêن din nehatine çêkirin.

Hal ew e ku digel zimanê ‘Erebî, di pirê zimanên kevnar de bêjeyêن xwe-ser ên ku van wateyan nîşan bidin tunene. Dema tu fêr bibî ku “derese” (درسه) wekî mînak, ji gêrekirina genim tê, ango kesê xwendekar, heta wê wekî genim bihêre/gêre bike li ser xwendinê diçe û tê, dibe ku ji we re surprîz were. Mîna vê, bêjeya “hefize” (حفظ) jî, ji parastinê tê. Eger ne ji ber tırsa dirêjkirinê bûna, min ê ji ‘Erebî û pir zimanên din jî gelek mînak bidana.

### **Alfabeya bi navê Ebcediyetu'l-Eşcar el-Kamile**

Alfabeyeke gelekî kevnar û pir nepenî bi navê Ebcediyetu'l-Eşcar el-Kamile “Alfabeya Darê Tam”, heye. Ev alfabe, ji 22 tîpan pêk tê. Di nivîsandinê de xwe dispêre navê daran û awayê wan. Ev alfabe, bi navê alfabeya “Drudic” jî tê binavkirin. Wekî mînak di vê alfabeyê de tîpa “d” bi awayê “diyuri” tê bilêvkirin. Ev bêje, di zimanê ku alfabe bo wê hatiye danîn, bi wateya darê ye. Herwiha tê mena dara Sendiyan/Dara Mazî-Berûyê jî. Çawa bi wateya derî û dîwar jî tê. Ji ber vê yekê, bo tîpa “d”alê resmê dara Sendiyanê/dara Berûyê hilbijartine.<sup>33</sup>

33 Colin Wilson, *el-Însan we Quwahu'l-Xefîyye*, wergêr. Samî Xeşab, çapa 2., Daru'l-Adab el-'Erebiyye, Beyrût 1978, rp. 63-64,125. Ji çavkaniyêne wî: Konferanseke di derbarê “er-Rebbetu'l-Beyda, Xemsetu Eqlamin fi'l-Yed”, rp. 54.

Niha, ma di Kurdî de “dar”, “derî” û “dîwar” hemî bi “d”yê dest pê nakin. Gelo manendî û nêzîkatiya dirb û dirûvê wateyên di vê alfabetê de derbas dibin, bi yên Kurdî re bala we kişandin?

Min hewl da, da ku di derbarê vê alfabetê de agahiyê zêdetir bidest bixim. Lê, ji çavkanî û ansiklopediyê ku li ber destê min in, ez pêrgî tu zanyariyê zêde nebûm.

### Sûretê/Nigarê Ajalan ên li Şikeftan

Mîna ku tê zanîn sûretê ajalan ên li şikeftan ku dîroka wan vedigere bi bal 20 hezar sal berê, işaretî bi bal sembolên nîgarkêşen wan dike. Eger em nîgara “ga” wekî mînak bidin destê xwe ew, işaretî bi bal zayend, ber û boşuya ganê dike. Bêjeya “ga” ya Kurdî digel ku nav e bo ajalekî, di heman wextê de delaletî li ser kirina “gan/niyan”ê jî dike!

Ma ev mînakêñ han, delaletî ser kok û rehêñ hezar saliya zimanê Kurdî, nañin? Zimanê ku li benda zarokêñ xwe yên bêxêr in, da ku dîrok û razêñ wê derxin holê. Ez xwe jî dixim nav, em zarokêñ bêxêr in. Eger min ev gotar bi zimanê xwe binivîsanda, dê sê-çar qat zêdetir ji zemanê ku min bi ‘Erebî yan jî bi zimanekî din derbas kiriye, lê biçûna. Herwiha mixabin, eger min ev gotar bi Kurdî binivîsanda, ji Kurdan encax dê bigîhaşa deh yeka (100%10) ên ku dê ew bixwendana.

### Îfadeyên Îbn Wehşîyye

Îbn Wehşîyye wiha dibêje: “Pêşiyêñ Kurdan bi tenê di warê hunera çandînî û taybetmendiyêñ gihayan de, li pêş bûn. Ew dîsa angaşt dikin ku ew zaroyêñ Bînoşad in, berhemâ Adem aleyhiselam ya li ser çandîniyê gihaştîye wan ...”<sup>34</sup>,

Evan gotinêñ Îbn Wehşîyye, zilamekî ku çend sal berê bi rêya telefonê bi kanala (m tv) Kurdî re diaxivî, anî bîra min.

Pêşkêşana bernamê dema navê wî pirsî, bersiv da ku “Navê min, Ebraham e.” Pêşkêşvanê keniya û pirsî: Tu ji ku li me digerî ey Îbrahîm? Bersiva wê bi Kurdiyeke zelal, da: “Ez Ebraham im, ne Îbrahîm im. Ez ji Îsrâîlê bi te re diaxivim!” Wê gavê, dest û piyê wê li hev ketin, ji awir û hereketêñ çavêñ wê xuya dibû ku ji derhêner alikarî digit.

Lê belê Ebrahamê Kurdî ji Îsrâîl wiha berdewam kir: “Ez Xaxam im û min Tewrat bi bal Kurdî ve wergerandiye!”

Heta vir, meriv digot qey mesele reklam e. Lê belê di xeberdana xwe de ji xwe bawer bû û bi rêyeke zanistî behsa daketina Adem aleyhiselam ya ser rûyê erdê dikir. Ev jî li ser zêde kir, “Min îsbat kiriye ku zimanê Adem, Kurdî ye. Li min guh bidêre temam bikim.” Lê pêşkêşvanê, -mixabin, dibe ku ji ber aidiyeta kanalê

34 *Şewqu'l-Musteham*, rp. 203-204.

nehişt axaftina xwe temam bike- got: "Eger tu bixwazî ji me re behsa afirandinê bikî, ev meseleyeke dirêj e û heta sibê xelas nabe." Piştre axaftin qut bû.

Hîn jî ez nizanim, ka gelo ev mesele rast bû an na. Lê belê kelacaniya wî ya zêde pêbaweriya di xeberdana wî de, kir ku heta niha ez lê bigerim. Hêviya min ew e ku ez wî nas bikim û jê istifade bikim. Ez bawer im di vê de tu kêmâsi tune. Lewra ev 'ilm e û di 'ilmê de eybdêrandin tuneye.

Ji Misrê Doktor Hasan Zaza (ew jî bi eslê xwe Kurd e), bi zimanê 'Erebî ji nivîskarên herî baş e di derbarê mijarên Cihû, Cihûtî û Siyonîzmê. Ji ber ku wî li Îsraîlê li ber destê gelek Xaxamên Cihû ders girtiye, tu kesekî ew eybdar nekiriye.

Evê bûyera cansoj, qenaeta min a bi bêxêriya zaroyên Kurdan di babetê zimanê wan de hîn zêdetir dike. Nêzîkatîya pir, dibe ku bûbe perde di navbera wan û zimanê wan de.

Ev, di heman wextê de dibe bersiva hin pirsên ku ev gotar wan tîne ziman. Yek ji pirsên herî rewâ: Madem ji zimanê Kurdî re ewqas taybetmendî û kevnarî û heta pêşdeyî jî heye, wê gavê ka ew destnivîs bi ku de çûn?! Çima em di serde-meke wiha de şiyar bûn ku dîtina pirtûkeke Kurdî bo me xewn û xeyal bû.

### **Sedemê Windabûna Berhemên Kurdî**

Di meselê de -ji daxilî û xaricî- pir sedem hene. Lê belê di lawazkirina vî zimanî de faktorên daxilî sedemê herî esasî ye.

### **Sedemê Daxilî**

Me mînaka hevpevvîna bi kanala (m tv) berî niha me anî ziman. Ez ê hin mînakêni din jî bidim.

Tê bîra min li welatê me dema mamosteyê me yê zimanê Kurdî digel ewqas tengasiyêñ aborî, ewlehî, siyasî û dîtina çavkaniyan –çendîn qedexe bûna jî-hewl dida ku zimanê me fêrî me bike. Digel vî qasî jî, me bi 10 xwendekaran dest pê dikir, lê kurs, bi xwendekarekî yan jî bê xwendekar bi dawî dibû.

Ev çend sale li Tirkîyê li bajarê Stenbolê Enstîtuya Kurdî heye û lê dersên zimanê Kurdî û wêjeya wê bi bihayekî remzî/pir hindik tê dayin. Lê mixabin, digel ku li wî bajarî çend milyon Kurd dijîn û pirên wan rewşenbir an jî xwendekar in, lê dîsa jî jimara xwendakarên ku besdarî kursê dibin ji jimara tiliyêñ destan, ne zêdetir in. Rastiyeke ji vê xerabtir û taltir di nav kesên bi zimanê Kurdî re mijûl in derbas dibe; li Tirkîyê nêzî 11 milyon Kurd, zimanê xwe yê Kurdî ji bîr kirine, ji mîlyonekî kêm an zêdetir, li paytextên mîna Iraq, Sûriyê û Îranê, herwiha bi hezaran Kurdêñ ku ne li bajarêñ xwe dijîn û bi temamî zimanê xwe jîbir kirine, hene.

Sedema bingehîn di vê sersarî û îhmalê de, ne siyaseta dewletan bi tenê ye. Lewra li cem Kurdêñ derive/diasporayê jî rewş, wiha ye. Dr. Muhammed Zeyno, li ser vê mijarê hin mînakêni trajedîk tîne ziman. Ew wiha dibêje: "Pir Dewletê Ewrûpa, gelek derfet dan zarokêñ Kurdan. Wekî mînak hikûmeta Elmanyayê,

da ku Kurd bi zimanê xwe perwerdehiyê bibînin gelek derfet û îmkanên madî da wan, mamossteyêndi Kurdi diyar kirin û malbatêndi Kurdan ji berpirsyariya madî riha kirin. Digel îtitrazêndi balyozxaneya Tirkîyê, li hin bajarêndi ku pir Kurdi lê dijîn, wekî zimanêndi biyanî yên din zimanê Kurdi jî ket mufredatê û li dibistanê bû derseke fermî. Lî di dawiyê de, ji hezaran malbatêndi Kurdan, bi tenê çend kesan zarokêndi xwe lê qeyd kirin. Pirêndi wan, dibistanêndi bi Tirkî an jî ‘Erebî perwerdehiyê didin, di ser ya Kurdi re girtin.”<sup>35</sup>

Ji lewre gotina ku pêşiyêndi Kurdan gotine “Kurmê darê, ne ji darê be dar kurmî nabe”, ne belqeh û vala ye. Herçiqas Şerefşanê Bedlîsî berhema xwe “Şerefname” ya di bara dîroka Kurdi de, bi zimanê Farisî nivîsandibe, berî sed sala alimekî Amedê bo waliyê Diyarbekrê ferhenga “el-Hediyyetu'l-Hemîdiyye fi'l-Luxeti'l-Kurdiyye” bi zimanê ‘Erebî amade kiribe, heta Celadet Bedirşanê ku alfabeya Kurdi bi tîpêndi Latînî amade kiriye jî pirtûka xwe ya bi navê “Rêzimana Kurdi” bi Frensi nivîsandibe, dîsa jî zimanê Kurdi nemiriye, sax e û di ber xwe dide.

Madem ku Kurd pişta xwe didin zimanê xwe û gava binivîsin jî bi zimanekî din dinivîsin, ne xerîb e ku di roja me de ferhenga herî mezin bi “Kurdî-Îngilîzî” ji aliyê yekî Cihû, Michael L. Chyet hatibe amadekirin.

Eger em werin ser mijara medreseyêndi kevn û heleqeyêndi dersêndi li mizgefstan, em dikarin bibêjin ku di parastina zimêndi roleke wan hebû. Lewra temamê mufredatê medresê heta dersêndi mîna metamatik, mentiq, felsefe û ‘ilmî felekê/kozmoloji jî bi zimanê Kurdi dihate xwendin. Lî belê digel ku zimanê Farisî di nav mufredatê de bû, wan xwe ji xebatêndi li ser zimanê Kurdi, dûr digirtin. Ji aliyekevî ve wan Kurdi mîna zimanekî zanistê parastin, encax di heman gavê bûn xwedî par di vemirandina wê de.

Pirê cehd û qewate wan di warê hînkirina rêzimana zimanê ‘Erebî de bû. Ji ber ku haya min jê heye, min li hinek ji wan medreseyan xwendiyê û pisporiya min li ser zimanê ‘Erebî ye, eger ez bêjîm -digel ewqas paşdaçûna mezin di medreseyan- di warê rêzimanê ‘Erebî, serf, belaxet û heta helbest û erûzê de di cîhanê de –heta welatê ‘Ereban jî- tu kes tuneye ku bi yên ku li wan deran xwendine re pêşbaziyê bikin. Lî ev hemî, di zimanê ‘Erebî de ye. Heta dibe di Kurdi de nikaribe bi cudahiya di navbera du lêkeran de bizanibe û bi ‘Erebî biaxive.

Gotina me ya dawî di vir de, birastî li min pir xerîb hat û şas mam ku li zanîngeha Kurdistana Iraqê hinek mamossteyêndi dîroka Kurdi, -çawa ku hinek ji xwendekarêndi wan bi min re ketin pêwendiyê- ku di heqê berhama “Îbn Wehşiyîye” de, di şek û gumanê de ne. Gotin ku wî mamossteyî berî çend salan gotareke weşandiye, tê de gumanêndi li ser hebûna rastiya berhemê, aniye ziman.

Min got dibe ku uzrê wî hebe. Lewra wê demê destnivîsa Tehranê hîn nehatibû dîtin, nusxeya çapkırî ya Hammer ya ku li Muzeya Londonê jî –zêdekirina wê li wir bihêle- destûra nêrîna lê jî nedihat dayin. Herwiha nusxeya Parisê jî, lê ev

35 Ji gotara Dr. Muhammed Zeyno, el-‘Ailetu'l-Kurdiyye fi'l-Mehcer, malpera berbang.net

hebû ku destûra nihêrtina lê dihate dayin. Nusxeya li Elmanyayê heta niha jî tu agahiyên min di derbarê wê de tuneye. Min bihist ku destnivîseke pêncâ jî heye.

Lê hevalê min got ku mameste hîn jî ji nêrîna xwe daneketiye (ma ne Kurd e!). Heta ez gotara wî nebînim û ifadeyên wî nexwînim, min nexwest ku bersiva gumanêwî bidim.

Ev di derbarê faktorê hundirîn ên dema çûyî û niha de bûn. Baş e. Lê gelo faktorêner derveyî ci bûn?

### **Sedemê Xaricî**

Di vê meseleyê de faktorêner derveyî jî xwediyê rola xwe ne. Li herêmê, karê weşan û çapê di demeke wisa de dest pê kir ku li gelekê welatan bêjeya Kurdî, heta bi tenê xeberdana bi Kurdî qedexe bû û dihate cezakirin, dest pê kir. Bo belata herî mezin jî ku gelekê destnivîsan li wan welatan (Tirkiye, İran, Sûriye û Iraq) bûn. Nihêrtina li wan destnivîsan heta demeke nêz jî, qedexe bû. Ji ber vê yekê, berhemên Kurdî yên ku li wan deran hene, li ser esasê Farisi yan jî Osmanî ne, tênesnîfîkirin. Heta gelek ji destnivîsên herêmê yên ku li welatê Ewrûpa û Emerîka ne, hîn jî nehatine rêz û tesnîfîkirin.

Gelek ji destnivîsên ku li malan bûn, li pêşberî çavên xwediyêwan hatin şewitandin an telefîkirin. Herçiqas romana Selîm Berekat ya bi navê "Dilşad", behsa vê mijarê bi awayekî ku dişibe xeyalê, bike jî, lê rûsîpiyekî ji eşîra "Goyan" eşîra ku dikeve navbera Cizîr û Wanê, bûyereke rasteqîn ji min re vegot. Ji apanê wî yekî bi navê "Mele Muhemmed Emînê Goyanî" di serdema Osmaniyan ya dawî de li Stenbolê qadî û xetîbê Mizgefta Ayasofyayê bû. Ci gava di dawiya serdema Osmaniyan de bi bal welatê xwe ve tê sirgûnkirin, pirtûkên xwe jî yên ku ji "4000" cildan pirtir bûn û herî zêde destnivîs bûn, bi xwe re dibe.

Piştire di dema Kemaliyan de eger em salê bidin, di sala 1948an de, polîsan biryar dane ku kitabxaneya wî li pêş çavên wî bişewitînin. Heta ew pêşniyar dike ku min bi saxîti bişewitînin, lê dest nedîn kitabxaneyê. Lê polîsan qebûl nekirine. Piştî vê bûyerê felç dikeve û di nava 24 saetan de wefat dike.

De ka bifikire, gelo dibe ku me çend berhemên Kurdî di vê kitabxaneya taybet ya ku di gelekê kitabxaneyan ewqas destnivîs tuneye, bidîta. Bi taybetî, dema em bidin ber çavan ku ew bi sedema ku ketibû nav refîn ên doza mafê Kurdan dikirin, hatîbû sirgûnkirin.

Hevalekî min ê din got ku lêkolînerekî Tirk -bi eslê xwe Çeçen- ku navê wî Ramazan Şeşen e, di salê 8oyî de li ser Sultan Selaheddînê Eyyubî teza xwe ya doktorayê pêşkêşî Zanîngeha Stenbolê dike, lê ji ber ku bi dehan mijar û çavkanî di teza wî de Kurd nîşan didan, licneya zanîngehê gef lê kirin; ci gotina ku Kurdan nîşan dide yan jî işaretî bi bal wan ve dike, eger bi yeka ku Tîrkan nîşan dide yan jî işaret dike, neguherîne, dê li dadgeha ewlehiyê di aleyhê wî de dozê lê vekin. Birastî jî wiha bû. Ev teza bi qesmerî, bû delîla ku Selaheddîn, bi eslê xwe Tirk e.

Heta gelek xwendekar û mameste yê zanîngehê yên ku ez bi wan re ketim

nîqaşê jî, ev raman bi wan re heye. Ma tu nabêjî ka çiqas derewînên bi vî awayî berê û piştre qewimîne!

Herwiha bûyereke ku di navbera Yilmaz Guney an jî Yaşar Kemal û Wezaretâ Çandê ya Tikriyê de derbas dibe, tê bîra min. Dema ku romanekî ji zimanê biyanî bi bal Tirkî werdigerandin, di nav tîpêñ romanê de barhilgirekî Tirk jî derbas dibe, di dawiyê de biryar didin ku wî barhilgirî bikin yekî Kurd!

Min ji hinek welatiyêna başûrê Kurdistanê –ji çiyayê Cûdî heta Rihayê- bihîst ku gelek kevirên mezin ên dîrokî ku li ser wan nivîs û sembolên kevn hebûn, didîtin; ên bi emir mezin di heqê wan keviran de digotin ku ew, Suhufêñ İbrahim pêxember in û bi Kurdî ne. Heta hinekan ji wan dikaribûn bixwendina jî. Lî ev kevir, ka gelo li ku ne? Tê gotin ku hin ji wan birine muzeyê Ewrûpî. Lî pirên wan bi dînamîtan hatine tarûmarkirin!

Em niha tê gihiştin ka çîma Tirk, li ser avakirina bendavan li cihêñ herî kevnî dîrokî de, da ku di bin avê de bimînin, ewqas israr dikan. Eger bajarê Hesenkeyfê, bajarê ku gelek kevn e û roj bi roj di avê de noq dibe, li Efxanîstan an jî li dewleteke din bûya, saziyêni mirovahiyê dê dunya rakirina ser piyan.

Digel vê rewşa ewqas trajedîk, dîsa hêvî û umîd heye. Lewra bizava nivîsandina bi Kurdî ji pêncî salî ne pirtir e. Digel vê jî kitabxaneya Kurdî pêşde birine. Eger em bibêjin ku hema ci bigire rojê berhemeye Kurdî tê çapkîrin, nabe mubalexe. Ev, li herêma Kurdistanâ Iraqê ya xweser, xwezayî be jî, lî li Tirkîye ev ne tebiî ye. Digel ku li gorî qanûna Tirkî ev ziman tune be jî, lî Dewleta Tirkîye kanaleke Kurdî vekiriye û jimara zanîngehênu ku biryara vekirina besen Kurdî didin her diçe pirtir dibe. Li aliyê din, bi dehan weşanxane, kovar û malperêñ Kurdî hene. Tê dîtin û li ber çavan e ku ev zêdebûn ne sirf ji aliyê jimaran e, heta ji aliyê na-verok, bes û şaxêñ wêjeyê û cureyêñ hunerê jî pêş de diçe.

Ji vê bonê hêvî ew e ku gelê Kurd, zimanê xwe bi hêz bikin –nabêjim vejînin-, hin licne bêñ damezirandin da ku muracetî temamê abîde û destnivîsên xwe yêñ dîrokî yêñ kevn bikin û wan bi yêñ çapkîrî û yêñ heyî re bidin ber hev. Wê gavê em ê bibînin ka çawa gelekan gotin ji cihêñ wan guhertine. Di vî warâ de min gelek tişt dîtine û ew tomar kirine. Min di gelek destnivîsan de dîtiye ku “Dewleta Eyyubî”, bi “Dewleta Kurdî” an jî “Dewleta Kurdan” hatiye binavkirin.

Herwiha min di bara gelek dewlet û mîrekîyêñ ku li Kurdistanê di dema Emewî, ’Ebasî û demêñ piştî wan de derketine holê jî dîtiye. Lî di pirtûkên me yêñ dibistanê yan jî yêñ zanîngehê heta yêñ çandî de jî min tu tiştik jê nedîtiye.<sup>36</sup>

Hêvî heye ku ev rastiyêñ han bi rêya hêşaniya ragihandinê di serdema 21em de derkevin meydanê û em bibînin ku zarokêñ me bi spartina li ser metnêñ heyî ku tu şolayî û bêbextî tê de tune bin, van keşfan wekî musellematan qebûl bikin.

36 Bo hin mînakana bnr. Şirkûh Amidî, “Ortaçağ Tarihi Kaynaklarının Tercümlerinden Tahrihat Örneği: Kürdler”, *Kürt Tarihi Dergisi*, Temmuz-Ağustos 2015, jîmar: 10, rp. 24-29. (Nîşeya wergêr)

# SÊ TEZÊN MASTERA KURDÎ YÊN KU LI ZANÎNGEHÊN TIRKIYEYÊ HATINE AMADEKIRIN -1-

**M. Zahir ERTEKİN<sup>1</sup>**

Li Tirkiyeyê xebatên derbarê ziman û edebiyata kurdî yên akademik de bi beşen ziman û çanda kurdî dest pê kirin. Beşa ziman û çanda kurdî cara yekem li Tirkiyeyê di sala 2009an de bi biryara lijneya wezîran a Tirkiyeyê di binê enstituya zimanê zindî yên Tirkiyeyê de tevî beşa ziman û çanda suryanî û erebî li Zanîngeha Mardin Artukluyê vebû û di 2010an de dest bi perwerdehiya lîsansa bitez û bêtez kir. Herwiha enstitûyen heman rengî li çend zanîngehêن din jî vebûn û wan jî bernameya mastera kurdî damezrandin, meşandin û hê jî dimeşînin (Zanîngeha Bîngolê û Zanîngeha Yuzuncu Yıl ya Wanê). Li aliyekî din di hin zanîngehan de jî mastera kurdî di bin sîwana enstitûya zanistê civakî de tête meşandin (Zanîngeha Muş Arparslan û Zanîngeha Dîcleyê ya Diyarbekir).

Tevî masterê li sê zanîngehan lîsansa kurdî jî vebûye û hê jî ev beş bi awayekî aktîf perdewerdehiyê didomînin. Li Artukluyê îsal (2017) dê cara sêyem mezûn derbiçin û di zanîngeha Bîngolê de jî îsal dê yekem qefleyên kurmancî û zazakî (2 bes-2 pol) mezûn bibin. Herwiha îsal beşa kurdî ya Zanîngeha Muş Alparslanê dê yekem xwendekarêن xwe mezûn bike. Di Zanîngeha Dêrsîm de tenê lîsansa Ziman û Edebiyata Zazakî heye. Li Zanîngeha Sêrtê û Batmanê enstituya zimanê zindî vebûye lê çalak nînin.

Piştî van agahiyêن xweş, xweşxeberek jî di warê doktorayê de heye. Lewra di 2015an de zanîngeha Dîcleyê yekem car doktoraya kurdî vekir û 6 xwendekarêن doktorayê wergirtin. Perwerdehiya wan berdewam dike. Piştî vê gava girîng di 2016an de bi hevkarî û şirîkatiya du zanîngehan (Mûş Arparslan û Bîngol) bernameyeke din a doktorayê jî vebû. Di vê bernameyê de heta niha carek

<sup>1</sup> Dr. Zanîngeha Bîngolê, Dersdarê Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî. zahirertekin@hotmail.com

xwendekar hatine wergirtin. Ji bo zazakî 5 ji bo kurmancî jî 7 xwendekar nika xwendina xwe berdewam dîkin. Ji bo doktorayê heta niha mezûn derneçûne, lê hin xwendekar serdemêne dersan kuta kirine û bi nivîsandina tezêna xwe re ‘eleqedar in. Ji bilî van du bernameyên doktorayê, bernameyeke din a doktorayê jî heye. Bi hevpeymaneke di davbera Zanîngeha Mardin Artukluyê û Zanîngeha Zaxoyê de, hin wanebêjên beşa kurdî yê Artukluyê li beşa kurdî ya Zanîngeha Zaxoyê doktorayê dîkin. Hêvî heye 4-5 ji van wanebêjan îsal (2017) dê bi awayekî serkeftî vê bernameyê biqedînin, bawernameyên xwe werbigirin û bibin doktorêne kurdî.

Herwiha YOKê di sala 2015an de yekem car li ser sîstema UAKê di bin navê *Yaşayan Dünya Dilleri* (Zimanê Zindî yê Cîhanê) doçentiya kurdî vekir. Weke ku tête zanîn salê du caran serlîdana doçentiyê vedibe. Li gorî agahiyêne ku em pê dizanin, ji bo doçentiya kurdî cara ‘ewil (Cotmeha 2015an) sê kesan û cara duduyan jî (Nîsana 2016an) kesekî serî li doçentiya kurdî daye. Em hêvîdar in ku ev endamên doçentiya kurdî dê bi ser kevin û gaveke giring a ku bibû asteng li ber akademiya kurdî vebe û pileya akademiya kurdî jî li Tirkîyê berzetir bibe.

Piştî vê kurtepêvajoya akademiya kurdî ya li Tirkîyeyê, em werin ser nivîsa xwe. Di vê nivîsê de meqseda me ev e ku li sê zanîngehêne ku mastera kurdî dimeşînin de bi tevahî sê tezêna kurdî derxin pêş çavêne lêkoleran. Ji her zanîngehekê em dê tezekê bidin nasîn. Ev zanîngeh jî ev in: Mardin Artuklu, Bingol û Muş Alparslan. Armanca me ev e ku tezêna kurdî tenê di pirtûkxaneyê zanîngeh û enstîtûyan de nemînin û xwe radestî ‘eleqedar û xwîner û xebatkarêne vê qadê bikin. Ji ber vê yekê divê yan ev tez bêne çapkiran yan jî bi danasîn û şîroveyen çapkîri (çî çapêne dijîtal çî çapêne kaxezî) qada vekolînê re aşkera bibin. Helbet her kes nikare teza xwe çap bike û bigihîne ber destê raya giştî, nemaze ber destê peywendîdar. Lewra him weşanxaneyê kurdî lawaz in û him jî her amadekarê tezekê, bi karê zehmet re bi tena serê xwe nikare mijûl bibe. Helbet çend ji van tezan hatine çapkiran lê piraniya wan hê jî nehatine çapkiran. Ji bo vê yekê jî me xwest ku em quncikekê di vê kovarê de ji bo danasîna tezêna kurdî vekin.

Li vir divê em vê jî bizanin ku yekem teza masterê ya kurdî li zanîngeha Artukluyê derçûye. Tez di bin serperiştiya Kadri Yıldırım de hatiya amadekirin. Navê tezê *Folklorê Kirmancan* (*Zazayan Kirdan/Dimîlyan*) Ser o *Cigérâyışê* ye û amadekarê tezê Nadire Güntaş Aldatmaz e. Tez di sala 2013an de hatiye amadekirin. Tez li ser folklorâ kirmancan/zazayan hatiye amadekirin. Piştî vê tezê derî li vê qadê vebû û bi dehan tez bi serkeftî derçûn. Ev ‘eleqe û hahîşkarî hê jî berdewam e. **Li gorî tespîtên me ji sala 2013an û heta 2016an li Zanîngeha Mardîn Artukluyê 72, li zanîngeha Bingolê 26, li Zanîngeha Muşê 8, li Zanîngeha Wan Yuzuncu Yılê 12 û li zanîngeha**

**Dîcleyê 4 tezêñ kurdî derçûne.**<sup>2</sup> Bi dehan tez li ber qedandinê ne, gelek xwendekar tezêñ xwe dînivîsin û yên ku serdema dersan de ne jî hene. Hasilê kelam dewlemendiyeye veşartî heye di vê qadê de. Loma me xwest ku em jî keda wan mamoste-muşrif û amadekar-xwendekaran bi bîr bînin û cî bidin tezêñ wan di kovareke muhekkem de.

Îja dixwazim derbasî sê tezêñ cihê bibim ku me ji vê deryaya biçûk bijartine. A 'ewil ji zanîngeha Artukluyê ye. Ji ber ku keda wan zêdetir e û ew qedîmtir in.

### 1. Temaya Sirgûnê Di Çar Romanêñ Kurdi(kurmancî) de

Amadekarê tezê *Davut Yeşilmen* e. Şêwirmendê tezê *Hayrullah Acar* e. Tez di sala 2014an de di bin banê *Enstîtûya Zimanêñ Zindî yên li Tîrkiyeyê* ya zanîngeha Artukluyê de hatiye pejirandin û 163 rûpel e. Temaya sereke ya tezê sirgûnmefî/mefîti wêjeya sirgûnê ye. Mijar bi edebiyata modern a kurdî re têkildar e. Çawa ku tête zanîn di nav xwendekarêñ kurdî de herî zêde romanêñ kurdî têne xwendinê. Lewra him mijar û him ziman û him jî karakter di vê cureyê de bêtir bala xwîneran dikişîne. Loma jî roman di edebiyata kurdî ya nûjen de ciyekî taybet werdigire. *Yeşilmen* jî di nava bi sedan romanêñ kurdî de çar romanêñ balkêş bijartiye û wêjeya sirgûnê ji hundirê wan kişandiye, tehlîlên edebî li ser wan kiriye. Sirgûn ji xwe re kiriye bingeh, roman mal e û edebiyat jî şûr û mortalêñ wî ne, di tezê de. Tez xuya ye ku wê zêde bala xwendevan û lêkoleran bikişîne. Lewra him edebiyat e û him jî sirgûn e û kurd bi vê bêjeyê û bi vê bûyerê re zexim rûbirû mane. Kurd dijwariyêñ sirgûnê baş dizanin. Loma di romanen de jî bûye mijareke sereke. *Yeşilmen* têkiliya sirgûn û bijartina wê ya ji bo teza xwe wiha rave dike: “Di vê maweya ku kurd di serdemêñ nû yên jiyana sirgûnê re derbas dibûn û di jiyana wan a sirgûnê de guherîn diqewimîn, motîfîn sirgûnê di wêjeya wan de çawa cî digire, gelo jiyana sirgûnê li ser nivîskar û berhemêñ wan bandoreke çawa hiştiye û jiyana sirgûnê di berhemêñ wan de bi ci awayî hatine nîşandan, herweha vê jiyana sirgûnê berê pêşveçûna wêjeya kurdî û modernîzma kurdî ber bi ku ve biriye? Bi taybetî di romanêñ ku ji bo tezê hatine hilbijartin de ev yek bi berfirehî hatin analîzkirin. Ji bo vê yekê pênasekirina têgeha sirgûnê û di heman çaxê de di dîroka Kurdistanê de mînakêñ siyasî û wêjeyî yên sirgûnê hatin şîrovekirin.”

*Yeşilmen* di puxteya teza xwe de armanca teza xwe wiha rave kiriye:

“Armanca pêşîn a vê teze, bi çar romanêñ wêjeya kurdî ya modern re raçavkirin û analîzkirina têgeha sirgûnê ye. Herwiha di vê xebatê de fêmkirina jiyana sirgûniya kurdan ya ji salêñ 1980yî heya roja me armanceke din e...”

Pênasekirina têgeha sirgûnê yek ji armanca vê xebatê ye. Ji ber ku hem weke pênasekirina vê têgehê û hem jî sînorêñ vê têgehê di wêjeya kurdî de,


2 Aykaç, Yakup; “Bîbliyografyaya Tezêñ Beşen Kurdolojiyê yên li Tîrkiyeyê (2011-2016)”, *The Journal of Mesopotamian Studies*, C:2/1, Zivistan 2017, r. 2.

riya vekolîna wêjeya kurdî ji hêla xebatêن tematîk ve vedike. Di vê tezê de bi mînakêن wêjeya cîhanê û veçirîna vê têgehê re, em giringiya sirgûnê di wêjeya cîhanê de dibînin. Bi mînakêن ji welatêن sereke re tê dîtin ku nivîskarêن ku mohra xwe li wêjeyê dane, piraniya wan di heman çaxî de nivîskarêن sirgûnê ne jî. Ji destpêka wêjeya kurdî heyâ van demêن dawî, ji bo wêjeya kurdî jî her wisa bûye.”

Romanênu ku bûne mijara vê tezê jî balkêş in. Him ji aliyê mijarê ve wekheviyek heye, di nava wan de. Him jî navênu ku hatine hilbijartin balkêş in. Lewra dudu ji Kurdistana Sûrîyeyê ne, dudu ji Bakur in. Em nizanin bê ka Yeşilmen cîma ji her parçeyekî yek nebijartîye. Yekîtîyeke van nîvîskaran jî ew e ku hemûyan romanênu xwe li Swêdê(Ewropa) nivîsandine û her çar jî bi taya sirgûniyê ketine û ev êş kişandine. Ew romanênu ku bûne mijara vê tezê ev in: *Barê Şevê* ya Fawaz Husêن, *Payîza Dereng a Firat Cewerî*, *Pêlên Bêrîkirinê* ya Mustafa Aydogan û *Tîrsa Bê Diran* a Helîm Yusiv.

*Yeşilmen* rîbaza vekolînê wiha destnîşan dike: “Di warê analîzkirina çend romanênu kurdî de rîbaza me ev bû ku roman bi çîrok û karekterênu xwe ve jiyana sirgûnê rave bikin. Bi vê armancê re di her romanê de pêşî li ser çend hêmayênu naverokî hate rawestan. Ji hêla vebêjer, nêrîn, karekter, tevna çîrokê, dem û mekanê ve, bi awayekî giştî roman hatin analîzkirin. Di beşa duyemîn a analîzkirina romanen de jî em bi hûrgulî li ser hêmayênu sirgûnê weke sedemênu sirgûniyâ karekteran, rîwîtiya ber bi warê sirgûnê ve, ravekirina karekterênu jin, derûniya li sirgûnê, bindestî û bêdewletbûna karekterênu sirgûn û vegera wan a welêt rawestiyân.”

Tez ji 3 bes û encamekê pêk tê. Di beşa yekê de, ji hêla binyadî û civakî ve sirgûn hatiye nasandin. Sirgûnî ci ye, cure û sedemênu sirgûnê ci ne û ci bandor li ser derûniya mirovan hiştiye? Ev pirsên sereke ne ku nivîskar di beşa ‘ewil de li ser wan sekiniye. Di beşa duyem de xebatkarê tezê dîrokçeya jiyana sirgûniyê di wêjeya kurdî de daniye ber xwe. Di vê beşê de destnîşan kiriye ku berê sirgûnêni siyasî sirgûnêni edebî hebûne. Rewşenbirî û edebiyatnasiya ku bi saya serê sirgûnê ve pêşketiye, rewşa edeba kurdî ya li sirgunê, xasma ya li Ewropayê û Kafkasyayê û romana kurdî û sirgûnî deqênu sereke yên vê beşê ne. Di beşa sêyem de ku kakila tezê bixwe ye,



amadekarê tezê çar romanên çar romanûsan li gorî hêma, vebêjer, nêrîn, tevna çîrokê, dem, mekan, karakter û gelek hêmâyên sirgûniyê xistiye binê destarê vekoleriya xwe û hêraye. Bi seredorî wî ewil romana Fawaz Husen, paşê ya Fırat Cewerî paşê ya Mustafa Aydogan û herî dawî jî ya Helîm Yusiv nirxandiye. Di vê besê de bindestî û vegera welat jî ji her çar romanan hatiye derêxistin. Derûniya sirgûniyê bi ci awayî di zêhna nivîskarê romanan de kelîyaye û bi ci rengî herikiye ser rûpelên romanê, bi analîzên kûr û fireh hatiye rave kirin.

Çend encamên ku *Yeşilmen* bi vê xabatê xwe gihadiyê ev in:

Romana kurdî ya sirgûnê kevneprest e, depresîf e û dest nade hêlên nazik yên civakê an kesayetiyê. Pirsgirêkên wan, ew pirsgirêk in ku ji civakên kevneprest ve maqlû têne dîtin. Di dawiya romanan de tenê dilê xwendevanan bi wan dişewite. Di vî halî de jî, bi romanên sirgûnê dirûvekî nû li romana kurdî dikeve. Hem di warê teknîkê de hem jî di warê rabêja romanê de, riyêñ nû li ber romana kurdî vedibin. Bi awayekî zelal, dîroknûsiya serdemên nû û trajediyên kurdan vedibêjin. Di romana *Tırsa bê Diran* de hem şertên Rojavayê Kurdistanê yên salên nêzîk têne vegotin hem jî bi riya karekterên romanê, hesabê sedsalekê yê Kurdistanê tê pirsîn. Di romana *Barê Şevê* de jî bi riya çar karekterên ji çar perçeyên Kurdistanê, rewşa kurdan a ku dişibe hev, tê vegotin. Ev vegotin weke yekqederiya kurdan dikare bê xwendin.

Dema ku em berê xwe didin çavkaniyêñ tezê em dibînin ku çavkaniyeye dewlemend hatiye amadekirin. Xasma ji hêla teoriyê ve gelek çavkaniyêñ sereke yên biyanî bûne bingeh ji tezê re. 6 rûpelên têr û tije ji bo çavkaniyêñ tezeke masterê şanazî û serkeftinek e.

## **2. Eqîdenameyo Zazakî Yê Mela Mehemedê Hezanîyî(Metno Transkrîbekerde, Wekenitiş û Açarnayış)**

Amadekarê tezê *Metin Çiftçi* ye. Şêwirmendê tezê *Nusrettin Bolelli* ye. Tez di sala 2015an de di bin banê Enstitûya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Bîngolê de hatiye pejirandin û 75 rûpel e. Tez zazakî hatiye amadekirin. Mijara tezê eqîdenameya menzûm a zazakî ya Mela Mihemedê Hezanî ye. *Çiftçi* di vê xebatê de metnê destnûs ê tezê veguheztiye ser alfabeşa latînî, lêkolîneke ‘ilmî li ser wê kiriye û wergera wê ya tirkî jî lê zêde kiriye. Bawername ji 144 malikan pêk tê û di heman rûpelê de dîsa li gorî wezn û kêşeya helbestê, tirkiya wê jî hatiye bicihkirin. *Çitçî* di kilmvateya teza xwe de armanca xebata xwe wiha şirove dike: “Ina xebat, esero menzûm yê Mela Mehemedê Hezanî ke serra 1980 de bi nameyê ‘Eqîdetu'l-Îmanî nusîyayo ser o hadre bîya. In tez destpêkêk, hîrê qisimî, metno transkrîbekerde û açarnayışê eqîdenameyî bi tirkî ra yeno meydan...” di dawiyê vê puxteyê de *Çiftçi* daxwaziya xwe ya xebatanê di vî warî de wiha berdewam dike: “Ma wazenî bi ina xebata ke xebatanê tewr verînan yê tewirê eqîde yê edebiyatê zazakî ser o benî ra yew a, hem inî eserî bidin şinasnayış û hem zî ma hêvî kenî ke seba averşîyayışê zazakî yew havila ma

bibo.”


Tez ji destpêkekê, sê bes, werger û transkrîpsiyona bawernameyê pêk tê. Weke ku Çiftçi jî amaje pê dike di destpêkê de li ser edebiyata klasîk a zazakî û cureyê bawernameyan hatiye rawestîn. Di beşa yekê de jiyana Mela Mihemed, berhemên wî, kesayetiya wî ya edebî hatiye vekolîn. Beşa duyem de bawername ji layê şiklî ve hatiye tehlîlkirin û di beşa sêyem de jî naveroka bawernameyê, zimanê wê, teşe û rîbaza nûsîna wê hatiye kolandin. Piştî beşa sêyem latînkirina bawernameyê tevî wergera wê ya tirkî hatiye amadekirin. Li ser dabeşkirina tezê, Çiftçi wiha qise dike: “Qismê detspêkî de mewzû, armanc û ûsulê xebat ïzah bîy. Qismê yewin de; cuye, eserî, seksiyeto edebî yê nuştoxî û derheqê zazakî(kirdkî) de fikranê ey ra behs bîyo. Qismê diyîn de, menzûme hetê şeklî ra, qismê hîrîyin de zî hetê muhtewa ra ameya wekenîtiş. In qisim de, teberê muhtewa de eynî wext de ziwan û ûslubê eqîdeyî ser o zî ameyo vindertiş. Peynî de zî eqîdenameyo zazakî bi tirkî ameyo açarnayîş û metno transkrîbekerde zî ilawe bîyo.” Di pêveka tezê de jî Çiftçi bi nivîskarê bawernameyê re(Mela Mihemed Hezanî) hevpeyvîneke dirêj diweşîne. Di vê hevpeyvînê de ji gelek aliyêن kesayetî û ‘ilmî yêni Mela Mihemed pirs û bersiv cih digirin. Sernavê vê ilaweyê ev e: “Roportaj, Derheqê eqîdeyan, zazayan û edebîyatê zazakî de fîkrê Hezanîyî”

Ev xebat ji bo qada xwe xebateke sereke ye. Yekem xebata akademîk a li ser bawernameyeke zazakî ye. Herwiha bi saya vê xebatê em pê dihesin ku heta niha çar bawernameyêن zazakî hene. Bî gotîna Çiftçi:

Edebîyatê zazakî de kiştê tewirê mewlidî de yew tewiro bîn zî eqîdename yo. Her çiqas edebîyatê zazakî de edetê eqîdenuştişî esto zî zey edebîyatê kurmancî xurt nîyo û tena çar hebî eqîdeyî estî. Eqîdeyê Hunijî in tewir de nimûneyo verîn o. Hezanîyî zî serra 1979 de dest pê eqîdeya xu kerdo û 1980 de kerdo temam. Eqîdeyê ke bi zazakî nusîyayî in ê:

1. 1. Mela Mehmed Elî Hunij, *'Eqîdeyî İman-'Eqîdeyî İslâm*, 1970, 66 beytî.
2. 2. Mela Mehmedê Hezanî, *'Eqîdetu'l-İmanî*, 1980, 144 beytî.
3. 3. Mela Mehmed DemîrtAŞ, *Qasîdeya diyîn*, Dîwan, 2006, 52 beytî.
4. 4. Mela Mehmed Muradânî, *'Eqîda Zazakî*, 2005, nesr o, 36 rîpelî.

Çiftçi du xalêن girîng ên encama teza xwe wiha rave dike:



Her çiqas zî eqîdeyê Hezanîyî de çekuyê xeribî bibî reyna zî merdim eşkêno vajo ke in eqîde hetê ziwano edebî ra xurt o. Hezanîyî in eqîde qey ewamî nuşto inay ra ziwanêko sade şuxulnayo. Heto bîn ra in eqîdename de xususiyetê eqîdenameyanê kurmancî estî. Bitaybetî in eqîdename, hetê vatiş û muhtewayî ra maneno eqîdenameyê Mela Xelîlê Sêrtî yî û hetê vatişî ra zî maneno eqîdeyê Ehmedê Xanîyî. Zey Xanîyî, Hezanî zî eqîdeyê xu bi çarçewaya ruknê îslam û iman ardo pê. Tena Hezanî mewzûyanê bi îxtîflaf ra dûrî vinderto.

Heme eqîdenameyê zazakî hetê ê şexsan ke perwerdeyê medresa gureto ra nusîyayî. Çunke inî melayan hem medresa de eqîdeyê erebkî û kurmancî wendî hem zî wayîrê qebîlîyetê nuştişî yî. Hetê muhtewayî ra hema-hema heme eqîdenamyê zazakî zeypê yê. Tena eqîdenameyê Mela Mehmed Demîrtaşî bi tewirê awan binêk cîya keweno. Zey eqîdeyanê bînan in eqîdename zî qey şîret û nesîhetî nusîyayo in semed ra çekuya “bizan” zaf şuxulîyaya. Ma bi ina xebat edebîyatê zazakî de hem eqîdeyê Hezanîyî dayo şinasnayîş hem zî warêko newe de yanî tewirê eqîdenameyî de ci eserî estî nê dîyar kerdî û xususiyetê nê eseran ardî ziwan.

### **3. Jiyan û Kilamên Dengbêj Ahmed Alîksan**

Li zanîngeha Muş Alpaslanê di binê rêveberiya *Abdülcelil Bilgin* de ji aliyê *Fehmi Yeşilçınar* ve hatiye amadekirin. Di sala 2016an de qediyaye û hatiye pejirandin, tez tevî pêvekan ji 254 rûpelan pêk tê.

Tez ji du beşan pêk tê. Beşa yekê jiyan û kesayetiya dengbêj *Ahmed Alîksan* bi hûrikî hatiye vekolîn. Beşa duyem derbarê berhemên dengbêj *Ahmed Alîksan* yên ku hatine kom kirin û analîza wan e. Di vê beşê de 19 klamên şer, kuştin û mîrxasiyê, 15 klamên evînê hatine bicihkirin. Klam ji aliyê mijar, leheng, naverok, teşeyê ve yek bi yek hatine nirxandin. Yeşilçınar xebata xwe li qadê kiriye. Bi gelek kesan re rûniştiye û dengê wan qeyd kirine. Herwiha li gundê *Alîksan* bi gelek nas, dost û xizmên wî re têkilî danîne û ji wan istifade kiriye. Hevalên Alîksan ên dengbêj ên li heyatê jî çavkaniyênen sereke yên vê xebatê ne. Xebatkarê tezê di pêveka tezê de bi wêneyên kedkarên tezê, teza xwe dewlemend kiriye. Yeşilçınar hevpeyvînên ku bi hevrê, dost û eqrebatê *Ahmed Alîksan* re di derbarê kesayet, dengbêjî, ziman û şêwaza wî re kirine, hemû di pêveka tezê de bicih kiriye.

Li ser deng û hunera dengbêj *Ahmed Alîksan* ev encam gihiştiye ber destê *Yeşilçınar*:

- *Alîksan* karê dengbêjiyê her tim pêwist dîtiye. Xwestiye ku dengbêjî her berdewam be. Ji ber vê yekê dengbêjiyê weke karekî pîroz dibîne. Hem şagirt perwerde kiriye him jî xwestiye ku zarên wî jî vî karê pîroz pêk bînin.
- Bi dengekî cuda karê ku bi xwe pîroz girtî dike. Xwedî dengekî akûstîk e. Dengê wî bi hunera wî derdikeve asteke bilind. Bêguman dengbêjekî şareza

ye. Hemû taybetiyên dengbêjan nîşanî me dide. Kilam derxistiye û bi terza xwe vegotiye. Wî jî her wekî dengbêjên qedirbilind şahidiya dewra xwe kiriye. Bûyerêñ qewimî wek kilama Taşlıçay, Werdê û hwd., li bîra dîrokê neqîş kiriye. Alîksan, dengbêjekî gelek bi xîret bûye. Di her fersendê de hunera xwe nîşan daye. Ji bo nîşen pêş me gelekî girîng e.

Di encamê de em dikarin bêjin ku gelek tez di warê dengbêjiyê de hatine amadekirin. Lê mixabin zimanê vê tezê hineki lawaz maye. Xwezî hinekî din jî bi zimanekî dewlemend hatiba nivîsîn. Herwiha ji aliyê teoriyê ve jî qels maye. Herwiha çavkaniyên biyanî jî pir kêm in di tezê de. Dîsa jî hêjayî pesinandinê ye, ku ji devera Sehedê xortekî Serhedî li ser dengbêjekî veşartî yê Serhedî sekiniye û ew ji tarîtiyê rizgar kiriye.

### **Wekî dawî;**

Em di vê nivîsarê de li ser sê tezan rawestiyan ku li sê zanîngehêñ cihê hatine amadekirin. Yek li ser edebiyata modern e, yek li ser edebiyata klasîk e yek jî li ser edebiyata gelêriye. Dudu ji wan bi kurmancî yek bi zazakî hatiye amadekirin. Me xwest ku lêkolîner ji van tezan haydar bibin û ji wan sûdê werbigirin. Helbet dê kêmasiyên wan hebin. Lê aliyê wan ê serkeftî zêdetir e. Lewra van hevalên hêja bêyî xwendineke seretayî û lisansa kurdî rasterarst dest bi masterê kirine û di encamê de jî tezêñ xwe bi kurdî nivîsandine. Herwiha materyalêñ li ber destan jî kêm in û hin momosteyêñ ku wan perwerde kirin jî bi gelemerî ne xwedî zanîneke kûr in di warê kurdî de. Loma divê piştgirî jî bo van xebatan/ xebatkaran bête kirin, tezêñ wan baş bêne rêvebirin, şêwirmendêñ wan divê baş bêne bijartin û ji kesên xwedan erk û ehlan bête neqandin. Lewra ev destpêk e û divê destpêk xurt bin. Master çiqas qewî be doktora dê ew qas baş be. Herwiha divê momosteyêñ tezan jî bêtir berê xwendevanan bidin xebatêñ qadî. Li ser devokên deveran xebat divê bêtir bêne kirin. Folklorâ kurdan roj bi roj dimire. Lewra edebiyata gelerî li ber dem û zeman û teknolojiyê êdî nikare xwe ragire. Me çi berhev kir, me çi tomar kir kar e û zutirîn wext divê em berê xwendekar û xebatkaran bidin vê qadê. Me niyet kiriye ku di her hêjmarekê de em dê 3 yan 4 tezêñ kurdî yêñ pirlehçeyî û piralfabeyî di vê kovarê de binirxînin û bidin naskirin. Hêvîdar im ku xwendevan jê sûdê werbigirin û valahîyeke biçûk were dagirtin.

K.T.  
ZANÎNGEHA MÜŞ ALPARSLAN  
ENSTİTUYA ZANİSTİYÊN CİYAKI  
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDI

Fehmi YEŞİLÇINAR

JİYAN Ú KİLAMËN DENGBEJ AHMED ALİKSAN

TEZA MASTİRË

RÊVEBIRÊ TEZE  
Doç. Dr. Abdülcelil BİLGİN

MÜŞ-2016

## LI SER PIRTÜKA “TEORIYÊN FOLKLORÊ”

**Hayreddin KIZIL<sup>1</sup>**

Çi zanistî ci edebî, dema bi Kurdî pirtûkeke nuh derkeve wekî xwînerek Kurd kîfxweş dibim. Lewra ziman bi nivîsêne curbecur pêşde diçe.

Lê ji ber pîşeya min heke zanistî be ez gelek kîfxweş dibim. Çi kîmasî û xeletiyênen wan jî hebin ne xem e. Lewra mirovê xebatkar bi xeletiyan re heval e. Mirovê bêxelet ew kes e ku naxebite, lê bêhay e ku xeletiya herî mezin teraliya wî ye.

Van salêن dawî di gelek qadan de pirtûkên zanistî dertêن. Mijara vê nivîsê jî pirtûkeke zanistî ya li ser folklorê ye. Ji alî Bedran Hîkmet ve hatiye amadekirin, ji 120 rûpelan pêk tê û di sala 2016an de ji nav weşanêن Lîsê derketiye. Min xwest ez vê pirtûkê ji bo xwîner û lêkolîneran bidim nasîn.

Beriya danasînê divê bê gotin ku li ser berhevkirinê materyalên folklorê ci pirtûk ci kovar gelek nivîsêne Kurdî hatine weşandin. Lê li ser mijar û teoriyêne folkorê heya niha li Turkiyeyê du pirtûk derketine:

Yek ji van ji alî Zanîngeha Artukluyê ve hatiye amadekirin. *Ji Destpêkê Heta Niha Folklora Kurdi*, Kadri Yıldırım, Ramazan Pertev, Mustafa Aslan, İstanbul 2013.

Li dû vê pirtûkê du sal şûn de ji ali weşanxaneya Avestayê ve pirtûkek bi edîtoriya Ramazan Pertev derket, *Edebiyata Kurdi Ya Gelêri (Dîrok-Teori-Rêbaz-Lîteratur-Berawirdî)-I*, İstanbul 2015.

Piştî vê pirtûkê jî pirtûka Bedran Hîkmet derket. Lê ev pirtûka Bedran Hîkmet, wekî beşek ji pirtûka *Edebiyata Kurdi Ya Gelêri* derketibû. Di çapa xwe ya nuh a wekî pirtûkekê de, derxistin an jî lêzêdekîrin di çend rûpelan de heye. Em dikarin mijarê pirtûka Teoriyêne Folklorê wisa rêz bikin:

1- Folklor, Di Nava Keftûleftêن Civakî û Îdeolojîk De

1 Alîkar Doçent Doktor, Zanîngeha Dîcleyê.

## 2- Folklor û Gel

### 3- Teoriyên Folklorê (Di bin vê serenavê de gelek teori hatine rîzkirin)

Di besa yekem de nivîskar, agahî di derheqê cihê folklorê di jiyana mirovan de dide. Li heman beşê nêrînên lêkolîneran jî li ser mijarê nivisîne. Li gorî vê beşê hêmanên foklorê di jiyana mirovan de xwedî cihekî girîng e. Ji bo motîvasyonê, ji bo pêkanîna hîs û nirxên hevbes, di parastin û berdewamkirina civakê de stran, govend, çîrok, efsane...hwd xwedî roleke girîng in. Lê iro:

“.....ji wê kevneşopa dêrîn bi tene hin hêmanên manewî ku ji konteksta xwe ya sirûştî qutbûyî mane; em iro pirî wan îcrayên çandî, folklorî, ji wê wateya wan a resen, sirûştî dûr, bi nêrînên xwe ve girêdayî yanê bi hizrên dînî, neteweyî an jî cureyên dî yên îdeolojîk dinirxînin. (r.8)

Ji vê şûn de nivîskar cihê folklorê di jiyanê de dide ber çavan, dînamîkbûn û xwe organîzekirina folklorê digel nêrînên zanyaran vedibêje:

Li gorî Propp, Folklor aристokrasiyê nîn e. Folklor aîdê çînên bindest, gundî, karker û navîn e... Folklor fenomeneke enternasional e. (r.11-14). Dîsa li gorî Propp, dema ku civakek, dewletek yanê organîzmayek dadimezirîne di helbestên epîk ên wê civakê de guherînan çedike û ji bo îdeolojî û nêrîna xwe ya nû, destan, epîk û efsaneyan şirove dike. Yanî li gorî wî folklor dîsîplîneke îdeolojîk e jî. Li Elmanyayê lêkolînên folklorê bêtirî ji bo armanca îspatkirina (Nijada Bilind) ya Germanan hat kirin. Li Rusyayê di sedsala XXan de bi nêrînên Marksîst xebatêni ser folklorê hat kirin (r.13). Heman tişt li welatêni mîna Fransa, Îngîlistan û Emerikayê jî berbelav e (r.14).

Nivîskar ji ber ku li ser bikaranîna îdeolojîk ya folklorê sekiniye divê em li vir bibêjin di amadekirina vê beşê de heke agahiyêni pirtûka *Türkiye'de Folklor ve Milliyetçilik* de lêbihata zêdekirin dê çêtir bibûya. (Arzu Öztürkmen, *Türkiye'de Folklor ve Milliyetçilik*, Weşanên İletişimî, İstanbul 2009)


Di besa duyem de li ser hin têgihan radiweste. Naveroka xebatêni folklorê, têgîhîn mîna *kevn*, *kevnar*, *kevneşop*, *fosilên zindî* divê beşê de tê nîqaşkirin. Li ser pênasîna wan jî radiweste. Dîsa li vir nêrînên zanyaran jî hatine nivîsin. Di heman beşê de nîqaşen li ser “gel” jî rawestiyaye, (r.21-25) nivîskar li vir nêrîna Kurdan li ser “gel” jî dide (r.24-25).

Beşa sêyem, beşa herî fireh û beşa herî girîng a pirtûkê ye. Dibe ku ji ber vê be ev beş ji beşen dî, çêtir hatiye amadekirin. Mîna ku her du beşen pêşin zû hatine amadekirin an jî li ser wan xwe pir neêşandiye.

Nivîskar di vê beşa dawî de teoriyên li ser folklorê dide nasîn. Ev beş bi sê binbeşan dabeş kirine. Di bin van binbeşan de jî teorî rîzkirine:

a) Teoriyên Metin Navendî (r.26-64)

b) Teoriyên Avahîsazî/Strukturel (r.64-86) -di naveroka pirtûkê de



“Avahîsaz” nivisiye-

c) Teoriyên Kontekstî (r.87-105)

Nivîskar di bin her besan de hin serenav rêzkirine. Lê heke di naveroka pirtûkê de ji bo wan yanê ji bo her teoriyekê, rûpela wan binîviya dê çêtir biba.

Di bin her serenavekê de jî taybetî û agahî bo mijara wê nivîsine. Wek mînak di besa Teoriyên Metin Navendî de gelek teorî rêzkirine. Taybetiya van teoriyan jî ev e ku ev teorî di lêkolînên xwe de metna vegotina gelêrî ji bo xwe dikin bingeh û şîrove û analîza xwe li ser wê ava dikin. Wekî; Teoriya Dîrok-Erdnîgarî (r.26-43), Teoriya Vesazkirina Dîrokê (r.43-46), Teoriya Tekamulê (r.46-47), Teoriya Mît-Rituel (r.47-50), Teoriya Psîkanalîtîk (r.50-60), Teoriya Biyolojîk (r.60), Teoriya Çandî-Girseyî (r.60-62), Teoriya Dîrokî-Çandî (r.62-63), Teoriya Nîvglobalî (r.63-64).

Di bin du serenavê din de jî binbeşen din nivîsîne:

Teoriyên Avahîsazî/Strukturel, Modela Lord Raglan (r.66-69), Modela Strauss (69-72), Modela Vladimir (r.72-86)

Teoriyên Kontekstî (r.87-105), Teoriya Karîgeriyê (r.87-91), Teoriya kompozîsyona gotyarî, (r.91-98) -li cikî teoriya **formula gotyarî** (r.87), li cikî jî Teoriya Kompozîsyona Gotyarî hatiye nivîsin (r.91)-, û Teoriya Performansê (r.98-105)

Em dikarin bibêjin ku ev pirtûk ji bo destpêkek bo teoriyên folklorê ye. Nivîskar di her beşekê de li ser teoriyan radiweste, car caran hin mînak ji folklorên kurdan jî dide. Ev jî taybetiyeye baş e bo pirtûkê. Lê ji ber ku çapa duyem e çi ji alî rêzkirina mijarên xwe çi ji alî çavkaniyan ve heke kîmasiyêñ çapa berê di vê çapê de tunebuya dê baştır bibûya.

Em ê wekî pêşniyazek di çend xalan de ji bo çapêñ dî nêrînên xwe rêz bikin. Beriya wê divê em cudahiyêñ her du çapan ji hev binivîsin. Di vê çapa nû de nivîskar, besa “Destpêk”ê ji çapa yekem derxistiye. Çend rûpelan jî lê zêdekiriye: (r.36-37) û (r.41-42) lê çavkanî nedane, bi taybetî (r.41-42).

Heke em werin ser pêşniyazên xwe, em dikarin bi çend xalan wiha rêz bikin:

1- Mijar bi gelempêrî ji berhemên li ser folklorê hatine wergerandin lê bêhna wergerê jê hinda nebûye. Dibe ku ji ber vê be problem di derbasbûna nava mijaran de heye, çend cihan de qutbûn heye. Hê mijarek xelas nebûye derbasî mijarekî dine bûye. (her wekî mînaka kawa, r.12 û bnr r.45)

An jî rasterast derbasî mijarê bûye. Her wekî mijara beşa dawî, di vê beşe de -beşa li ser teoriyên folklorê- divê sedema derketina teoriyanbihata nivîsin. Li ser pirsên çîma teorî derketine, kengî, kîja teorî derketiye, çend teorî hene, avakarêvan teoriyan kî ne? Bi kurtahî bihata nivîsin dê baştıribibûya.

Kêmasiya din jî dîsa werger e. Pirtûk mîna wergerek e ku ev werger ji berhemêner werger hatiye honandin yanê ne ji berhemêner resen. Dema em li çavkaniyêni nivîskar binêrin em ê bibînin ku gelek çavkanî bi taybetî li ser teoriyan ji Îngîlîzî bo Tirkî hatine wergerandin. Nivîskar jî ji wergeren Tirkî, wergerandine bo Kurdî. Ev jî xetereyan derdixîne. Wekî mînak dema rasterast ji berhemêner resen bênen wergerandin dibe ku navê teoriyan biguhere an jî dibe ku xeteyênen wergeren Tirkî derbasî Kurdî jî bibin. Ji ber vê ji çavkaniyêni eslî bê wergerandindê çêtir be. Bi vê awê iştimala xeletiyan jî kêmter dibe.

2- Kêmasiyek din jî di pirtûkê de lawazbûna çavkaniyêni wê ne. Yek ji gengeşiyêni di berhemêner ser kurdan de ev e ku kêmasiya çavkaniyan e. Belê heke em li berhemêner bi taybetî ne akademik binêrin em ê gelek iddiayêne mezîn bibînin lê bê çavkanî. Pirtûka me jî xweyê mijareke girîng e lê ji alî çavkaniyêni xwe ve lawaz e.

Em dikarin kêmasiyêni pirtûkê ji alî çavkaniyan ve wiha rêz bikin

### **Kêmasiyêni jêrenotan:**

Dema berhemek zanistî bê nivîsin, ji bo xwîner û lêkolîneran divê navê çavkaniyan neyê jibîr kirin. Ev hem ji bo nivîskar hem jî ji bo xwîneran gelek girîng e. Ev tişt gelek pêwîst e ji bo piştarstkirina agahiyêni di nava pirtûkê de. Dibe ku xwîner bixwaze di zanistê de pêş de here, ev çavkanî ji bo rêsanîdanê, wê alîkar bin ji xwîneran re. Dîsa ev jêrenot dê alîkar bin ji bo iddia yan jî agahiyêni nivîskar jî. Divê li vir em tiştek din jî binivîsin heke berhem pirtûkek zanistî be iddiaya intihalê jî ji ser xwe radike.

Dema em li pirtûkê binêrin di gelek cihan de tê dîtin ku jêrenot tune ye. Di gelek rûpelan de jêrenot nehatine nivîsin. An jî jêrenot kêm hatiye nivîsin. Hin mînak ji pirtûkê:

Di rûpela 9an de, di jêrenota 1em de navê berhemê heye lê kîja rûpel e ne-hatiye nivîsin.

(r.32) jêrenota 3oyan pirtûk Tirkî ye nav Kurdî ye heman xeletî di rûpelan din de jî heye navê çavkaniyêni Tirkî bi kurdî hatine nivîsin

Li gelek cihan jî tu çavkanî nade:

(r.9-10) Benda ku bi “Objik jî wekî Malînowskî dibêje ku....” dest pê dike.

(r.10) Benda bi “Walter Anderson, di şûna ....” dest pê dike jêrenot tune

(r.14) Benda dawî ya rûpelê jêrenot tuneye

(r.36-37) ji bo kataloga cureyêni çîrokan ya Anti Aarne çavkanî nade

(r.40-42) ji bo senifandina motîfên çirokan ya Stith Thompson nav dide. Di rupela 41ê de “Thompson bi giştî motîfan di binê van bîst û sisê sernavan de û bi van herfan qeyd kiriye” dibêje lê di jêrenotê de nade. Di “Çavkani”yê de jî navê pirtûkê tuneye.

(r.55) jêrenota 59an, çavkanî tam nîne rûpel nedaye.

(r.58) jêrenota 66an, “Dêmariya ku di çiroka Zîzanê de derdikeve pêş me arketîpa diya xerab e.” dibêje agahî derheqê vê çirokê de nade tenê jêrenotek heye. Nayê fêmkirin gelo çirok bi Kurdî ye an Tirkî ye. Wekî pêşniyazek em di-karin viya bibêjin ku ji bo arketîpa dêmariya xedar û nebaş çiroka Pepûk, çiroka Eyşik û Fatik û çiroka Çeleka Zérîn mînakêna baş in di folklorâ Kurdan de.

(r.95) Jêrenot nedaye, “Albert Lord, di pirtûka xwe ya....” dibêje di rûpela 93yan de navê veguhezê dibêje.

Di rûpela 98an de agahiyeke gelek girîng heye lê tu çavkanî nedaye:

“Lord û Parry di îcrakirin destanekê de ji bo ispata karîgeriya formul û temayê, mînaka Dengbêj Evdo û Dengbêj Mumîn didin. Ew li îcrayekê dîbin şahid ku Dengbêj Mumîn dibêje; ez ê destanekê bistrêm ku Evdo hîc nebihîstiye. Ew li wê derê li pêş Evdo û civatê destanê îcra dike û bi rastî jî Evdo beriya wî ev destan nebihîstiye. Lê piştî îcra Mumîn, Dengbêj Evdo dibêje ku ew versiyoneke dî ya vê destanê dizane û wê kîliyê de destanê ji Mumin pir xweştir û dirêjtir îcra dike. Û bi vî awayî wê destanê dike aîdê xwe. Di vê mînakê de, digel ku Dengbêj Evdo, ev destan berê hîc nebihîstiye jî di wê kîliyê de bi rîya tema û formulên ku di hafizaya wî de hene, ji nû ve kompoze dike. Lewra Parry û Lord dibêjin ku her îcrakirin destaneke nû ye. (r. 98)

Heman pirsgirêk di çavkaniyê-bibliyografyayê- de jî heye. Dema mirov li çavkaniyê binêre rîbaza navêne di wê de, mîna nivîsîna rîbaza pirtûkan fêm dike. Lê navêne li çavkaniyê hemû ne pirtûk in, gelek ji wan ji gotaran pêk têne. Ev gotarêne ku di çavkaniyê de, li ser rîbaza pirtûkan hatine nivîsin cara yekem di kovara Milli Folklorê de derketine. Dû re hin gotarêne di vê kovarê de hatine berhevkirin û wekî pirtûk hatine weşandin.

Hin mînak ji gotarêne çavkaniya Teoriyên Folklorê:

Alan Dundes, “Halk Kimdir”, Wergêr: Metin Ekici, r.11-26

Alan Dundes, “Doku, Metin ve Konteks,” Wergêr: Metin Ekici, r.40-52

Ben Amos, “Şartlar ve Çevre İçinde Folklorun Bir Tanımına Doğru”, Wergêr: Metin Ekici, r.27-39

William R. Bascom, “Halk Bilimi (Folklor) ve Antropoloji”, r.53-62

Lord Raglan, “Geleneksel Kahraman”, Wergêr: Metin Ekici, r.75-91

Ev gotarêne li jor hatine rîzkirin hemû di pirtûka *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımalar I*, Geleneksel yayincılık, Ankara 2006’de derketine:

Hin gotarêni di pirtûkê de hene, di cilda diduyan de, *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımalar II*, Geleneksel yayincılık, hatine weşandin. Çapa vê pirtûkê ya di destê me de çapa sisêyan e Ankara 2014, çapa yekem 2005an de û çapa duyem 2010ande dîsa ji alî heman weşanxaneyê ve li Ankarayê hatiye çapkırın. Gotarêni divê pirtûkê de derketine ev in:

Alan Dundes, “Folklor Nedir?”, Wergêr: Gülay Aydin, Amadekara Çapê: Sezgin Karagül, r.16-18

Roger D. Abrahams, “Halk Bilimini Etnolojik ve Sosyolojik Yönüyle Açıklamak”, Wergêr: Ayça Yavuz, r.49-54

Carl Wilhelm von Sydow, “Coğrafya ve Masal Ekotipleri”, Wergêr: Tuğçe Işıkhan, r.61-70

William R. Bascom, “Folklorun Dört İşlevi”, Wergêr: Ferya Çalış, Redaksiyon: Selcan Gürçayır, r.71-86

Lord Raglan, “Tarih ve Mit”, Wergêr: Levent Soysal, r.181-188

Lord Raglan, “Mit ve Ritüel”, Wergêr: Evrim Ölcer Özünel, r.189-197

Ji bil van her du gotaran du gotar jî ji pirtûka *Folklorun Sahtesi: Fakelore*, Geleneksel Yayincılık, Ankara 2007, hatine wergirtin. Du gotarêni ku ji van pirtûkan hatine wergirtin ev in:

Willam S.Fox, “Folklor Ve Fakelore”, Wergêr: Tolga Tanyel, r.35-50

Alan Dundes, “Fakelore Fabrikasyonu”, Wergêr: Selcan Gürçayır-Aşlı Uçar, r.71-86

Ji bil van mînakan jî xeletî hene lê ez bawer im ev mînak bes in. Lê dîsa jî divê em bibêjin ku nivîskar di beşa sêyem de bi ser ketiye lê ji alî çavkaniyan ve ev beşbihata dewlemendkirin û tekûzkirin dê gelek baş bibûya. Divê çavkaniyên xwe jî yan ji kovara Milli Folklorê yan jî ji pirtûkên wan bida ji bo xwîneran. Ji bil van bi taybetî çavkaniyên xwedî teorîyan yên resen hebûna û ne ji wergerên wan ên Tirkî ji berhemên orjînal bihata wergerandin bo Kurdî dê gelek baş bibûya.

Ji bil van di pirtûkê de li hin cihan hem ji alî bikaranîna rêzimanê ve xeletî hene hem jî bandora Tirkî li ser hevokan heye. Lê ji bo mijara me dirêj nebe. Em ê bi tenê çend mînakan bidin.

“Lewra wan folklora ku li derveyî sînorê vê armancê dima, li derveyî xebatên xwe hiştin an jî tune hesibandin (r.13)” Divê di vê hevokê de “hiştin”û “hesibandin” yekjimar wekî “hişt” û “hesiband” bên nîvîsin ne pirjimar.

“Wan gel wekî koma gundiyan didîtin.” Di vê hevokê de “didîtin” divê yekjimar bê nîvîsin ne pirjimar.

# DANASINA DÎWANA MEHWÎ

Hemin OMAR AHMAD<sup>1</sup>

## Kurtejîyana Mehwî

Navê wî Mela Muhemmed kurê Mela ‘Usmanê Balixî ye. Nasnavê wî Mehwî ye. Di helbesteke wî de nasnavê wî Meşwî<sup>2</sup> bûye. Paşê hingê wî bi xwe kiriye Mehwî. Wateya wê nemabûn, mehûbûn e. Balix gundek e, li devera Mawetê, li derdora bajarê Silêmanîyê ye. Li ser dîroka jidayîkbûna Mehwî boçûnên ji hev cuda hene. Gelek lêkolîneran li ser vê babetê raman û şiroveyên xwe weşandine. Bi gelemerî dîyar e ku Mehwî di sala 1831’ê mîladî li gundê Balixê hatiye dinyayê. Bavê wî xelîfeyê Şêx ‘Usmanê Sîraceddinê Tewèle<sup>3</sup> bûye. Di heftsalîya xwe de li cem bavê xwe dest bi xwendina xwe a seretayî a ‘ilmê kiriye. Piştî hingê ji bo ku xwendina xwe berdewam bike çûye bajarê Sineyê û Sabraxê (Mehabad)<sup>4</sup> li cem Mela ‘Ebdullahê Pîrebab xwendîye. Piştî hingê vegeşiyaye Silêmanîyê û li cem hin melayên navdar ên wê demê xwendina xwe domandiye. Piştî vê, çûye Bexdayê û bûye feqîyê zanayê navdar ê Kurd Muftî Zehawî. Îcazeya melatîya xwe sala 1859’an ji Muftî Zehawî wergirtiye û li Bexdayê, di mizgefta Îmamê ‘Ezem (Ebû Henîfe) de dest bi melatîyê dike û vê xizmeta xwe heta 1862’yan berdewam dike. Piştî hingî dizivire Silêmanîyê û li vê derê dibe endamê dadgeha Silêmanîyê.

Di sala 1868’an de ji ber sedema wefata bavê xwe dest ji kar û barêne dewletê kêtayî. Dîsa dest bi melatîyê kiriye û dest bi dersdana feqîyan kiriye ango di cîyê bavê xwe de dest bi muderistîyê kiriye. Di vê serdemê de çend melayên navdar di medreseyâ Mehwî de perwerde bûne. Navêne hin ji wan melayan ev in: Mela Hesenê Qizilcî, Mela Mehmûdê Meznaweyî, Mela Se’id Efendîoğlî Kerkûkî, Mela ‘Ezîzê Miftîyê Silêmanî...

1 Alk. Doç. Dr., Zanîngeha Bînglê, Beşa Ziman û Edeba Kurdî

2 Birajîfî.

3 Tewèle: Niha gundekî ku bi ser bajarê Helepçeyê ve girêdayî ye

4 Sine û Sabrax: Du bajarêne Rojhilatê Kurdistanê ne.

Mehwî wekî bavê xwe di rêya terîqetê de meşiyaye û bûye xelîfeyê Şêx Behaeddînê kurê Şêx ‘Usmanê Tewêle. Şêx Muhammedê Xal dibêje Mehwî di gel çend melayên din li Silêmanîyê di sala 1874'an de nefiyî Bexdayê bûye. Lê heta niha kes nizane ku ji ber çi ev nefî pêk hatiye. Pişti hingê dîsa dizîvire Silêmanîyê.

Li gorî boçûna ‘Elaeddîn Seccadî, Mehwî di sala 1883'yan de çûye hecê. Pişti pêkanîna erka hecê çûye Stenbolê. Li Stenbolê bi navgînîya maqûl û mezinên Kurdan ve wî Sultan ‘Ebdulhemîdê Duyem ê ‘Usmanî dîtiye. Sultan rêzeke zor lê girtiye û ferman daye ku li Silêmanîyê ji bo wî dergahek bê avakirin. Ew dergaha ku di wê serdemê de ji bo Mehwî hatibû çekirin, hê jî heye. Mehwî di sala 1906'an de li Silêmanîyê wefat kiriye û di odayeke dergaha xwe de hatiye definkirin.

### Berhemên Wî

#### Dîwan

Dîwanekê mezin a Mehwî heye. Ji bilî dîwana wî tu berhemên wî nehatiye peydakirin. Dîwana wî bi sê zimanen e; Kurdî, Farisî û ‘Erebî. Helbestenê dîwanenê piranî bi Kurdiya Soranî ne. Hejmara helbestan li gorî zimanen wiha ye:

Kurdî: 201

Farisî: 105

‘Erebî: 1

### Naveroka Dîwana Wî

Ji helbestenê Kurdî; 132 xezel, 48 çarîn, 16 takebeyt û 5 jî queside ne. Helbesta ‘Erebî li ser helbesteke Zehawî texmîsek e. Ên Farisî; 75 xezel, 2 texmîs, 20 qî'e û 7 jî takebeyt in. Helbestenê Mehwî yên Kurdî piranî dînî ne. Ji ber ku Mehwî kesayeteke tesewîfî bûye, piranîya helbestenê wî li ser vê babetê kom bûne.

**Beşa xezelan:** Mezintirin beşa dîwanenê ye. Xezelên wî piranî li ser huba Îlahî, xoşewistî û evînî ne.

**Qesîdeya yekem:** Navê quesîdeyê ‘Eqdul ‘Eqâide (*Gerdenbendêna Bawerîyê*) ji 136 malikan pêk hatiye. Ji alîyê qafiyeyê ve bûye çar beş. Du besen wê li ser qafiyeya (an) û (in) hatiye ristin. Duduyê din jî li ser qafiyeya (ûn) hatiye ristin. Ji bo têgihiştin û çêjjêwergirtina vê helbestê divê paşxaneyeke dînî-‘eqidewî hebe. Ji ber ku termenê ku hatine bikaranîn piranî felsefi-dînî ne.

**Qesîdeya duyem:** Navê quesîdeyê “Subhan e Ew Xweda ye” ye. Ji 23 malikan pêk tê. Naveroka quesîdeyê munacat e.

**Qesîdeya sêyem:** Ev queside jî munacat e. Bi “Xedaya Îradey Munacatime” hatiye destpêkirin. quesîdeya herî kurt ev e. Mehwî vê quesîdeya xwe ji yên dîtir cuda dike, di vê de sistema cotqafiyeyê bi kar anîye.



# دیوانی مەھوی

«لە ۲۴ مەھەمەد دى كورپى ۲۴ لە عوسمانى باڭخى»

لېكىدانووه و لېتكۈزۈننەوەسى:  
لە ۲۴ بىدوڭىھەرىيەم مۇھەممەد پېرىس و مەھەمەد دى كەرىم

## Qesîdeya çarem:

Qesîdeya Behrî Nûr e. Ev qesideji helbestêñ navdar ên Mehwî ye. Li ser vê qesîdeyê çend helbestvanêñ piştî Mehwî nazîre nivîsandine. Zêdetir li ser xoşewîstîya pêxember û jîyana wî rawestîyaye. Ji 124 malikan pêk tê.

**Qesîdeya pêncem:** Li ser medh û stayışêñ Mewlana Xalidê Neqişbendî hatiye nivîsin. Ji 24 malikan pêk tê.

## Çarîn:

Hemî çarîn li ser kêseke ‘erûzê nehatine nivîsin. Ji alîyê qafiyeyê jî tenê qafiyeyêñ rewaçdar wekî (aabâ) û (aaaa) bi kar neanîye. Hin qafiyeyêñ din jî bi kar anîye, wekî (abab), (abcb)...

Her wiha behrên arûzê yên ku di çarînan de hatine bikaranîn ev in: Hezec, remel, xeffîf, muctes, muteqarib, muzari’ û besît.

**Takebeyt/yeckmalik:** Di dîwana Mehwî de 16 yekmalikêñ serbixwe hene. Ev ji alîyê kêseyê ve li ser behrên hezec, remel muzari’, besît û recezê hatine amadekirin. Ji alîyê qafiyeyê jî du cure ne; (aa) û (ab).

## Çapêن Dîwana Mehwî

- Yekem car li Silêmanîyê di sala 1922'an de ji alîyê 'Elî Kemal Bapîr ve di Çapxaneya Hikûmetê de hatiye çapkiran.
- Cara duyem di sala 1977'an de li Bexdayê, ji alîyê Mela 'Ebdulkerîm Muderrî û kurê wî Mela Muhammed Kerîm hatiye çapkiran. Di vê çapê de him tehqîqa dîwanê heye û him jî şerha dîwanê hatiye kirin. Heta niha ev xebat gelek caran hatiye çapkiran. Her wiha di vê derbarê de wekî girîngötürîn xebata dîwana Mehwî tê qebûlkiran. Me jî di xebata xwe a ferhengê de ji vê berhemê gelekî sûd wergirt.
- Dîwanî Mehwî, (edt. Arif Zêrevan) Sererastkirin: Newzad Hirorî, Weşanê Nefel, Stockholm 2007. Yekem car bi vê xebatê dîwana Mehwî hatiye latînîkirin. Lê tenê li ser internetê hatiye çapkiran. Di vê xebatê de tenê metnê dîwanê hatiye waşandin. Jîyana helbestvan, ferhengoka dîwanê, tehqîq û şerha dîwanê û h.w.d. di vê xebatê de tune ne.

## ‘Arûz, Qafîye û Rewanbêjî di Helbestên Mehwî de

### ‘Arûz

Wekî piranîya şâ’irên klasîk tenê kêşa ‘arûzê bi kar anîye. Heşt behrên ‘arûza ‘Erebî (hezec, remel, xefif, muctes, muteqarib, muzari’, besît, recez) bi kar anîye. Di asta yekê de kêşa *hezec* gelekî bi kar anîye. Herî hindik jî *recez* bi kar anîye.

### Qafîye

Ji alîyê qafîyeyê ve Mehwî her 28 tîpêن ‘Erebî ji bo qafîyeyê bi kar anîye. Ji bili 28 tîpêن ‘Erebî çar tîpêن Kurdî jî (ç, j, g, ê) kiriye qafîye. Bi vî awayî Mehwî bi 32 tîpan qafîye çê kiriye û dîwaneke muretteeb anîye holê.

### Rewanbêjî/belaxet

Mehwî muderisekî mezin bûye. Ji bili zimanê dayikê bi ‘Erebi, Farisî, Tirkî baş zanîbûye. Helbesten wî yên bi ‘Erebî û Farisî jî hene. Lî di helbestên Kurdî de jî gelek term û bêje û motîfên ‘Erebî, Farisî û Tirkî bi kar anîye. Xuya ye ku bêtir bandora ‘Erebî li ser zimanê helbestên wî ên Kurdî heye. Di ferhengoka ku me ji bo dîwana wî amade kir de bandora ‘Erebî bi awayekî vekirî eşkere bûye. Mehwî termên tesewif, felsefe, mítolojî, ‘eqîde, tarîx û ‘erdnîgariyê bi awayekî zor û serkeftî bi kar anîye.

Mehwî tesewif û rewânbehjî bi hev re bi kar anîye. Ji ber vê yekê têgihiştina helbestên wî ne hêsan e. Li gorî ritma helbestê jî kêşen qurs bi kar anîye, mûsîqaya wan jî ji xwîneran re ne hêsan e. Ji alîyê peyvîn ku hunera wan xurt e, Mehwî gelekî serkeftî ye. Hemû hunerên rewânbehjîye bi kar anîye û çêjekê ruhî/me’newî tevî helbestên xwe kiriye.

Wekî rîberekî terîqetê Mehwî, di helbestên xwe de xwestiye ku terîqet bikeve xizmeta şeri’etê. Her wiha sûdeke zor ji bizava sofîgeriyê wergirtiye. Di binê bandora soffîyen mezin de maye. Wekî Ibn ‘Erebî, Hellac, Celaleddinê Romî û w.d.

Hin mijar û îmajên sereke yên helbestên wî ev in; Şev, ‘esqa îlahî, wucûd, ‘edem, ‘edalet, heq, çaksaziyê civakî, pesnê zimanê Kurdî, jîyana ruhî, mirin, exlaq û w.d.

### Xebatêن Li Ser Dîwanê

Bi dehan xebat li ser Dîwana Mehwî hatine kîrin. Xebatêن ku li ser Mehwî hatine kîrin piramî li Başûrê Kurdistanê û dîyasporayê hatine kîrin. Ji dehan bêtir tez (master-doktora) li ser helbest û dîwana wî hatine amadekirin. Hin tezêن di derbarê Mehwî de ev in:

- İbrahim Ehmed Şîwan, *Şî'rê ayînî û sofîgerî Li Şî're Kurdiyekanî Mehwî da*, Teza Doktorayê, Zanîngeha Selaheddîn, Hewlîr 1996.
- Ehmedî Mela, *Mehwî Le Nêwan Zahîriyet û Batinîyyet û Serçavekanî İşq*

û Wêney Maşûq De, Teza Doktorayê, Zanîngeha Sorbonê, Fransa ??

- Sebbûr ‘Ebdulkérîm, *Rengdanewey Kesêtî û Duyabînî Hellac Le Şî’rî Klasîkî Kurdi û Farisî De, Be Taybet Lay Mehwî û Hafizî Şîrazî*, Teza Masterê, Bexda 2006.
- Sîrwan Cebbar Emîn, *Eş’arîyet Le Şî’rekanî Mehwî De*, Teza Masterê, Zanîngeha Selaheddîn, Hewlêr 2007.
- ..... *Me’rîfe û Heqîqet Le Nêwan Felsefe û Îrfan Le Şî’rekanî Mehwî De*, Teza Doktorayê, Zanîngeha Selaheddîn, Hewlêr 2010.
- Mihemmed Tatanî, *Bûn Le Şî’rî Mehwî*, Teza Doktora, Zanîngeha Koye, Koye 2008.
- Talîb Ebûbekir Tahîr, *Felsefey Jîyan Le Şî’rê Mehwî*, Teza Masterê, Zanîngeha Silêmanîyê, Silêmanî 2011.
- Hêmin Omar Xoşnaw, *Hermonotîkay Şî’rî Sofyaney Mehwî*, Teza Doktorayê, Zanîngeha Silêmanîyê, Silêmanî 2014.

### Xebatê Din

- Di derbarê Mehwî di salên 80’yi de sempozyûmek hatiye lidarxistin. Paşê gotarêv vê sempozyomê bi navê “Le Barêy Mehwî Lûtkeve” wekî pirtûk hatiye çapkiran.
- Di sala 1999’an de li Hewlêrê sempozyûmeke din li ser Mehwî li dar ketiye. Meqaleyên vê sempozyomê jî bi navê “Fîstîfalî Mehwî” hatiye çapkiran.
- İbrahim Ehmed Şîwan, *Mehwîname*, Weşanxaneya Minare, Hewlêr 2010.
- ..... *Ferhengî Sofyaney Dîwanê Cizîrî û Mehwî*, Weşanê Akademîya Kurdî, Hewlêr 2002.
- ‘Umer Mehwî, *Çarînekanî Mehwî*, Silêmanî 2014.
- Tehsîn Heme Xerîb, *Nûrî Hîkmet û Rohî Irfanî Mehwî*, Silêmanî ?
- Abdullah Qeredaxî, *Deyrî ’Işıq*, 2014 Silêmanî.
- ‘Umer ‘Ezîz Mehwî, *Mîştê Le Bêjey ‘Arîfi û Kirdey Irfanî Mewlana Mehwî*, (4 Cild), Silêmanî 2014.
- Hîmdad Şahîn, *Mehwînasî*, Kerkûk ?
- ..... *Gulxaneyê ‘Arîfan*, ?-?

Jî bilî van pirtûk û xebatê akademîk çendîn têzê din û gelek gotar jî di vê derbareyê de çap bûne.